

Pelîn

Kovara edebî - hejmar: 2 - bihar 1999
Buha : 1.500.000,- Tl.

Ibrahim Seydo

Kamûran Bedirxan

Lal Laleş

Celadet Bedirxan

Arjen Arî

Mustafa Aydogan

Melayê Cizîrî

Mehmed Uzun

Mehmet Sanrı

Ahmet Erhan

Rênas Jiyan

Emîn Bozan

Maykil Çayıt

Rojîn Tibyatî

E. Mîran Janbar

Ş. Bekirê Soreklî

Barana Beravî

Charles Baudelaire

Zerdeş Nînowa

Suut Kılıç

Ciwanê Abdal

Ahmet Tellî

Remezan Alan

Serkeft Botan

Yaqûp Tilermenî



PELIN

Pelîn
Kovara edebî
Hejmar: 2
Bihar 1999

Buha (Fiyat):
1.500.000 Lîra

Li ser navê weşanxaneya
Dozê, xwedî û berpirsiyâ-
rê nîvîsaran:
Ahmet Zeki Okçuoğlu

Yên editor:
İbrahim Seydo
Selahattin Bulut
Mehmet Sanrı

Tîprenî û Mîzanpaj:
Pelîn

Navmîşan (Adres):
İstiklal Cad. Orhan Adli
Apaydın Sk. No: 11-13/4
80050 Beyoğlu/İstanbul

Tel./Fax: (0212) 292 56 05
E-mail: doz@turk.net.tr

Şertîn Abonetiya Salekê:
Li Ewropayê: 40. \$
Li Amerika û
Awîstralyayê: 60.\$

İş Bankası. Beyoğlu
Hesap No:
T.L.: 1011 304210 1420794
Dwz: 1011 301033 176704
Çeka Posteyê: 105 10 90

Çapxane:
Ceylan Matbaacılık
Tel: 0212/ 284 37 21

Pêwîstiya lêbixwedîderketinê/İbrahîm Seydo Aydogan	2
Edebiyata Welatî/Kamûran Alî Bedirxan	10
Maxolan/Lal Laleş	12
Zilamek û Zimanek/Celadet Alî Bedirxan	14
Du Helbest ji Arjen Arî	17
Elyêzerê Kurd/Mustafa Aydogan	18
Dîsa got şanê wî pîroz be/Melayê Cizîrî	26
Hawara Dîcleyê-(roman. beş.1)/Mehmed Uzun	34
Şîrîn Hawarê/Kamûran Alî Bedirxan	51
Pangîn/Mehmet Sanrı	53
Rêzikên Dawiyê ên Helbesteke dirêj/Ahmet Erhan	56
Semîramîs/Rînas Jiyan	57
Roja/Emîn Bozan	64
Hevpeyvîn/Maykil Çayit-Mustafa Aydogan	66
Qirdên Zarê/Rojîn Tibyatî	84
Tu kî yî...?/İbrahîm Seydo Aydogan	85
Reqsoreqso/E. Mîran Janbar	90
Do Êvarê/Şahînê Bekirê Soreklî	91
Guldesteyeke helbestan ji Barana Beravî	93
Sînor/Behram Dara	94
Xengîniya Heyvê/Charles Baudelaire	95
Navê Mirinê Tune/Zerdeş Nînowa	96
Demêni Bihurî/Suut Kılıç	98
Bajar/Kostantînos Kawafis/Rînas Jiyan	102
Cîhê Zarokêni Cinna/Ciwanê Abdal	104
Di Berfê De Şop/Ahmet Tellî	110
Bextewariya Îdeolojîk/Remezan Alan	111
Kemîn/Serkeft Botan	119
Pel/Yaqûp Tilermenî	120
Apê Reşo/ Pêkenok/ Berhevkar: Selahattin Bulut	123
Pirtûkxaneya Pelînê	124
Qutîka Posteyê	126

Pêwîstiya

lêbixwedîderketinê

İbrahîm Seydo

Pêwîstiya kurdî her tim bi lêbixwedîderketinê hebûye. Di vî warî de, di dîrokê de ji ber tesîrên cuda, fikir û helwestên cuda xuya bûne. Hemûyan jî li gora tesîra xwe ya li ser civatê, tesîr li rewşa zimên jî kiriye. Ji ber helwesta cuda, hinan qîmet bêtir daye nivîsandina bi zimanê- ci ji aliyê dînî û ci jî ji aliyê desthilatdariyê- serdest û zimanê xwe daxistîye dereceya duyem. Hinan jî li hember tu zimanî kurdî piçûk nedîtiye û ji bo pêşdebirina kurdî her hewil daye û bi vê hêla xwe her pesiniye.

Rewşa zimanê kurdî, bi tesîra zimanên serdest diyar bûye. Dîsa bi tesîra îslamîyetê û Qur'anê, li medreseyan bi giştî zimanê perwerdehiyê erebî bûye. Kurdî bi tenê ji bo şîrovekirinê hatiye bikaranîn. Ev heta qonaxa dîroka me ya nêz jî dom kiriye. Lê hin kesên din hebûn ku di vî warî de jî statuya kurdî parastiye. Bo nimûne; Mele Mahmûdê Beyazidî ku bi zimanê kurdî ders dida şagirtên xwe û digot "şagirtên kurd bi zimanê kurdî hîn xweştir fêr dîbin." Ev yek jî ji bo bikaranîna kurdî xusûsiyeteke baş ya medreseyan e. Di warê lêbixwedîderketina kurdî de, ev hêjâyî û mîrasa ku ji medreseyan ji me re mane, divê baş bêne nirxandin û iro jî ji bo parastin û pêşdebirina zimên fêde ji tecrubeyên wan bêne wergirtin.

Gava em di warê zimên de bala xwe baş didin dîrokê, wek li jorê jî hate diyarkirin, em dibînin ku eyn wek iro helwestên cuda derketine hemberî hevdu. Wê gavê jî gelek kesan bi zimanê tirkî an jî erebî dinivîsand; lê dîsa jî kesên mína Elî Herîrî, Ahmedê Xanî, Melayê Cizîrî û hwd derketin û bi kurdî nivîsand. Tevî ku di berhemên navdarênu ku li jorê behsa wan hate kirin, gotinên erebî û farisî cîhekî gelekkî mezîn digirin û ev xusûsiyet ji bo têgihîştinê iro hin astengan bi xwe re tîne jî, dîsa ji bo bikaranîn, parastin û pêşdebirina kurdî, kelehen me yên xurt in. Di nav wan de, kesên ku zimanê wan hîn jî pir bi hêsanî tê xwendin û fahmkirin hebûn. Feqiyê Teyran di vî warî de, nimûneya herî baş e. Kurdiya ku di berhemên wî de hatiye bikaranîn,

îro jî bêyî astengên pir mezin tê fahmkirin. Zimanê berhemên wî ji bo misteweya paqijiya kurdiya wê demê jî nimûneyeke balkêş e.

Di warê lêbixwedîderketinê û têgihîştina girîngiya zimên de, bo nimûne, divê mirov behsa Ahmedê Xanî bike. Xanî, di “Mem û Zîn”ê de li ser sebeba nivîsandina xwe ya bi zimanê kurdî weha dibêje: (Ji ber ku şîroveya van beyitan dê nivîsê dirêjtir bike, ez ê bi tenê beyitan li jêrê binivîsim.)

Hasil: Ji ìnad, eger ji bêdad
Ev bid’ete xîlafê mu’tad
Safî şemirand, vexwarî durdî
manendê durî lîsanê kurdî
înayê nîzam û întîzamê
Kêşaye cefa jiboyê amê



Fîlcimle ne cahil û nezan in
Belkî di sefil û bê Xwedan in
Ger dê hebûya me jî Xwedanek
Alîkeremek, letîfedanek
Îlm û huner û kemal û iz’an
Şê’r û xezel û kîtab û dîwan
Ev cins bibûya li ba wî mamûl
Ev neqd-i biba li nik meqbûl
Min dê elema kelamê mewzûn
Alî bikira li banê gerdûn...

Ji van beyitan mirov dikare tê bigihêje, bê Ahmedê Xanî di warê kurdewariyê de mirovekî ci qas hêja ye. Weke ku ew jî diyar dike, gelek kesan wê demê, weke iro, berhemên xwe bi zimanin din dinîvîsandin. Di herdu beytên serî de dibêje, ji ìnadê an jî ji neçariyê dest bi vî karî kiriye û ji dêleva karê hêsan ku her kes dike, karê dijwar û bizehmet

Da xelq-i nebêjitin ku: “Ekrad
Bê ma’rifet in, bê esl û binyad
Enwaê mîlet xwedan kitêb in
Kurmanc-i tenê di bê hesêb in”
Hem ehlê nezer nebênu ku: “Kurmanc
işqê nekirin ji bo xwe armanc
Têk da ne ditalib in, ne metlûb
Vêk ra ne mihib in, ne mehbûb
Bê behre ne ew ji işqebazî
Farix ji heqîqî-yû mecazî”
Kurmanc-i ne pir di bê kemal in
Emma di yetîm û bê mecal in

hildibijêre û bi zimanê kurdî dînîvîsîne. Dû re, dê bi tesîra Ahmedê Xanî gelek kesên din dest bi nîvîsandina kurdî bikin. Lê, rewşa ku kurd tê de ne riyê nade ku zimanê wan jî bi pêş ve bikeve.

Şerê ziman û edebiyatê

Du dem hene ku tesîrêng bingehîn hem bi giştî li civata kurdan û hem jî bi taybetî li zimanê wan kiriye. Yek jê bi darê zorê misliman-kirina kurdan bû û ya din jî talana ku bi 1071ê re dest pê kir û bobelatêni ji wê zan. Tesîra herdu deman û desthilatdariyêni biyanî di navbera kurdan û dînyayê de sînorêni mayinkirî ava kîrin. Wek her civatêni Rojhilata Navîn, civata kurdan jî di esasê xwe de ji ber van, para xwe ji guhertinêni li dînyayê dibûn wernedigirt.

Ronesansa ku li Ewrûpayê teqîya, huner û edebiyatâku li wê derê bi pêş ket, rengê xwe guhert, şax berda û dînya di bin tesîra xwe de hişt, heta sedsala 19an jî nehat Rojhilata Navîn û Mezopotamya-yê. Kurd jî ancax di dawiya vê sedsalê de digel hemû zordariya li ser ziman û hebûna wan, bi saya weşandina rojnameya Kurdistanê tev li vê heyama nû dibin.

Di serê sedsala bîstan de rewşa kurdan hebekî din tê guhertin. Şerê dînyayê yê yekem xelas bûye. Welatê ku nêzî sêsed sal berê bûbû du perçê, êdî bûye çar perçê. Kurd ji hev belav bûne. Pismam, dost, cîran û heval li aliyê din mane. Êdî sînor ketine orta wan. Kurdêni ku beşdarî serîhildanan bûne, yan hatine kuştin yan jî xwe bi zorê gîhan-diye deverên sitarê. Li welêt agir bi erdê ketiye, tirseke mezin civat hêşîr stendiye. Di bin vê atmosferê de, bêdengiyeke mezin çêbûye. Dînyaya kurdan ker û lal bûye.

Lê eynî pêvajo li perçeyêni din, ji bakur guhertitir dimeşe. Wê demê, di nav kurdêni rojhilat (Kurdistana İranê) û başûr (Kurdistana Iraqê) de li gora bakur û başûrê piçûk (Kurdistana Sûriyeyê) rewşeyeke baştir xuya dibe. Kovar û rojnameyêni ku li herdu perçeyan dest bi weşanê kiriye, dikarin rewşa wê demê bi me bidin fahmkirin. Di edebiyatâ me de, pexşanê jî berê li wira serê xwe rakirîye. Li gora perçeyêni din, kurdêni başûr di rewşeyeke hebekî baştir de ne. Bi alîkariya Ingilîzan ziman û edebiyatâ kurdî bi awayekî baş bi pêş dikeve. Kovarêni Pêşkewtin(1920-22), Jîyanewe (1923-36), Diyarî Kurdistan (1925), Zarî Kurdistan (1926-32), Ronak (1925- 35), Jîn (1934-36) û hwd.

Li başûr weşangeriya edebiyatâ kurdî bi derketina Gelawêjê (1939-49) diğihîje qada xwe ya herî bilind. Li rojhilat jî kovar û rojnameyêni mîna Niştiman, Halala û Hawar ji bo ku mirov rewşa wê derê fahm bike, balkêş in. Dû re, mirov dikare behsa kurdêni komarêni Sovyeta kevn bike ku li cem wan xebatêni giranbuha hatine kîrin

û xebat û berhemên kesên mîna Ereb şemo, Qanatê Kurdo, Casimê Celîl, Eliyê Evdirehman û hwd tesîra xwe li hemû besên welêt kiriye.

Ji bo kurdên bakur, wê gavê cîhê revê bin xetê bû. Kurd hê ew qasî hînî rîya Ewrûpayê nêbûbûn. Piştî avakirina Komara Tirkiyeyê, piştî serîhildana Şêx Seîd û ya Agiriyê, xezebeke nedîtî welat dabû ber xwe. Hilweşandin, qetlîam û talankirin wek xusûsiyetên wê demê derdikevin pêş. Kurdên di warê têkoşîna siyasi de têk çûbûn, di warekî din de dest bi şer kir: Şerê ziman û edebiyatê.

Di wê demê de çi kurdê ku dizanîbû bi kurdî binivîsanda dest bi xebatê kir. Helbet berî wê jî di nav kurdên bakur de wesanên bi zimanê kurdî mîna Kurdistan, Rojî Kurd, Hetawî Kurd û Jîn hebûn; lê di warê geskirina edebiyat û zimanê kurdî de derketina Hawarê bû qada herî bilind. Celadet Bedirxan û hevalên wî çi berhemên edebiyata devkî ku xwe gîhandê, berhev kirin û gîhandin heta iro. Weke ku tê zanîn Celadetê ku dê li hember rewşa zimanê kurdî dilê wî biêşıya, bigota “Kurdino, malxirabino, an bi kurdi bixwînin, an jî mebêjin em kurd in,” û bêtir bi hêrs bixebitiya.



Şoreşa herî mezin a ziman û edebiyata kurdî wê gavê dest pê kir. Carra pêşîn em dikarin di vê demê de tesîra edebiyata Ewrûpayî nemaze jî ya fransizî baştıri bibînin. Wê gavê esasê edebiyata nûjen hate danîn. Bi vî awayî di dîroka edebiyata me de, demeke nû des pê kir. Mirov dikare bi bêje ku di dîroka edebiyata me de dema herî biserkefî jî ev dem e.

Piştî Hawarê, di nav kurdên başûr de, edebiyata kurdî bi serê xwe meşîya û bi pêş ket. Pexşan bêtir hate bikaranîn. Di nav kurdên Sovyeta kevn de jî eynî rewş hebû. Di warê çîrok û romanê de gavên hêja hatin avêtin.

Edebiyata Sirgûnê

Di nav kurdên jihevbelavbûyî de, kurdên ku herî dereng dest bi edebiyatê kir dîsa yên bakur bûn. Komara ku nû hatibû avakirin, ji bo ku kurdîtiyê bi kurdan bide jibîkirin, zimanê kurdî jî qedexe kîribû. Ji ber ku nivîsandina bi kurdî qedexe bû, kurdên bakur tevî ku di salêن 60î de hin gavên mitewazî û di salêن hefteyî de bi saya atmosfera wê pêvajoyê û bi mîrxasiyeke siyasi gavên berbiçav hatin

avêtin jî heta piştî salên heyştêyi jî bi awayekî bi rêk û pêk ne bi kurdî xwend û ne jî nivîsand. Lê tevî vê yekê jî gava ji aliyê lêbixwedî derketina zimên ve salên hefteyî bêne nirxandin, ligel kovar û rojnameyên nîvtirkî û nîvkurdî, ku hîn jî gelek ji me di wê qonaxê de dijîn, divê bête behskirin ku Tîrêj bi xwerû kurdibûna xwe ve, xwediya cîhekî taybetî ye. Awayê Tîrêjê yê parastina zimên û xeta wê û mîrxasiya wê ya bi kurdî nivîsandinê, tesîreke erînî li nifşen piştî salên heyştêyi jî kir.

Piştî ku di 12ê Îlonê de artêşê bi temamî dest danî ser iqtîdarê, kurdên ku careke din têk çûn, vê carê ji vir û wir xwe gihand wela-têن Ewrûpayê. Gelek ji van kesan gava xwe da alî, dîsa weke pêşiyên xwe, daketin bin xetê. Ev kesên ku ji şerê siyâsî derketibûn, li wê derê li şopa Hawarê rast hatin û ji nû ve li xwe vege riyan, xwe nas kir. Vê rewşa ha, kurdên ku ji serihildanê serê sedsala bîstan derketibûn û piştî xwe gîhandibû bin xetê dest bi edebiyatê kiribû tîne bîra mirov. Kurdên ku ji nû ve li xwe vege riyan û dest bi nivîsandinê kir, li Ewrûpayê ekoleke nû anî pê; edebiyata sirgûnê.

Kurdên Ewrûpayê li wê derê, nemaze jî li Swêdê, weşanxane ava kirin û dest bi weşangeriyê kir. Roman û çîrok û şîira nûjen jî li wi-ra pêşketina xwe domand. Hejmara nivîskaran û berhemên edebiyata kurdî zêdetir bû.

Gava ku li Ewrûpayê ev xebat têne kirin û li Tîrkiyeyê jî piştî salên nodî zordestiya li ser zimanê kurdî hebekî kêmtiler dibe, heyecana edebiyata kurdî ji nû ve serî hildide. (Ez dibêjim qey hewce nîn e ku mirov bibêje ev guhertin jî bi tesîra tevgerên siyâsî ye.) Stembol piştî heyştê salî, ji nû ve dibe navenda berhemên kurdî. Lê dîsa jî nivîskarêن kurdî yên Ewrûpayê û yên Tîrkiyeyê di serî de nikarin têkiliyê di navbêra xwe de deynin. Heta ku weşanxane li Stembolê jî ava dibin, kovar û rojname bêtir belav dibin û saziyên kurdan têne avakirin jî ev rewş weha didome.

Girîngiya zimên

Rewşa ku îro kurd tê de ne û tiştê ku hatiye serê wan nehatiye se-re tu neteweyî. Him welatê wan perçe perçe di bin destên biyaniyan de ye, him zimanê wan tê qedexekirin û him jî hebûna wan tê înkarkirin. Kurdên ku bi zimanê osmanî nivîsandiye ne bes e, êdî kurd bi gelek zimanên din jî dinivîsin. Tevî ku di van salên dawiyê de, hê-dî hêdî hin berhemên bi zimanên ewrûpayî yên cuda xuya dibin jî nemaze yên bi zimanê tîrkî û erebî hîn giraniya xwe didomîne. Gelek kurd di edebiyatê de, bi van zimanan gelekî nav jî didin. Ji ber wê, hin kes edebiyata me ya îro di du beşan de dihesibînin: Edebiyata bi kurdî hatiye kirin û edebiyata bi zimanin din hatiye kirin. Lê hin jî

dibêjin, edebiyata ku zimanê wê ne kurdî ye, ne edebiyata kurdî ye. Ev minaqeşe dê demekê dewam bike û bi xwe re fikirên cuda derxîne holê. Lê her çi dibe bila bibe, ger em dixwazin li hebûna xwe bi xwedî derkevin, divê beriya her tiştî em li zimanê xwe bi xwedî derkevin. Ger me ziman da aliyekî, an jî me ew teslîmî zemên kir, wê ga-vê me tirba xwe bi destê xwe kola! Ji nav şertên hebûna neteweyan yên herî girîng, ev in: Ziman, ol (dîn) û kultur. Gava em lê dinerin, em dibînin ku kultura gelek neteweyen dora me (bi çi awayî be jî) dişibe ya me; dînê wan û me (bi çi awayî be jî) yek e. Her tiştê me hatiye guhertin û tiştek tenê maye di destê me de ku em dikarin di warê hebûna xwe de lê bi xwedî derkevin. Ew jî, zimanê me ye.

Ji bo hewildanê kurdan vala dernekevin, tahba wan bi erdê neteqe, divê kurd têkiliya ku di navbera hebûn, parastina hêjahiyyê nete-veyî û lêbixwedîderketina zimên de heye, baş tesbît bikin û di bin ro-nahiya vê tesbîtê de di jiyanâ xwe de cîhekî girîng bidin kurdî. Ev jî weha dibe; divê her kurd bi kurdî bixwîne, binivîse, bide û bistîne, li malê bi zarokên xwe re ji derveyî kurdî bi tu zimanê din nepeyive; gava bi kurdî peyivî bipesine, gava bi kurdî nizanibe û ji bo fêrbûnê he-wil nede fedî bike û baweriyê bêtir bi pêşeroja xwe bîne. Ger em we-ha nekin, ger em guhê xwe nedin vî warî, ger em şerekî giran li hem-berî xusûsiyetên ku bi pêvajoya mêtîngehkariyê re bi me re peyda bû-ne, li dar nexin, em ê nikaribin hebûna xwe biparêzin

Tevî hemû dijwariyan û vê rewşa xerab, îro çirûskên ku pêşiyê li reşbîniya (pesimîzm-karamsarlık) me digirin û dîbin sedemên xweş-bîniyeke (optimîzm-iyimserlik) xurt, hêviya me ya bi pêşerojê xurttir û zimanê me bi me şêrîntir dîkin.

Pêşniyariyek: Ji bo her pirtûkekê gulek

Di hejmara me ya yekem de nivîsek Mustafa Aydogan hebû ku behsa Roja Pirtûkan dikir û digot pirtûka kurdî ji vê rojê bê par dimîne. Nivîskarê me pêşniyarek kiribû û gotibû “pêwistiya kurdan ji hér kesî bêtir bi rojeke weha heye.”

Xwendevanê delal, weke ku tê zanîn, 22ê Nîsanê wek Roja Rojnamegeriya Kurdî tê pîrozkirin; 23ê Nîsanê jî li gelek deverên dînyayê wek Roja Pirtûkan tê pîrozkirin. Ji bo ku ev herdu roj bi dû hev re têن û em dixwazin pirtûka kurdî jî ji Roja Pirtûkan bê par nemîne, ew jî bikaribe xwe bixemîline û derkeve ber xwendevanê xwe, me got heke (teví Roja Rojnamegeriya Kurdî) ev herdu roj wek Cejna Pirtûka Kurdî were pîrozkirin dê ji bo pêşerojê karekî baş hatibe kirin.

Di Cejna Pirtûka Kurdî de mirov dikare pîrozbahîyan, semîneran, civînan, rojên îmzeyan amade bike. Pirtûkfiroşen kurdî dikarin ji bo her pirtûkekê gulekê bidin bikirên pirtûkên kurdî û hwd.

Em ê vê pêşniyara xwe bibin ji hemû weşanxanê, kovar, rojname, pirtûkfiroş, nivîskar û saziyên kurdî re. Bi rêya Pelînê em ji vir bangî wan dîkin. Em ê carê li ser reaksiyonên li hember vê pêşniyarê, xwendevanêن xwe agahdar bikin. Em bawer in ku herkes ê tev li vê pêşniyara me bibe û ji bo ku ev cejn ji sala 2000î û pê ve were pîrozkirin, alîkariyê bike.

Li ser hejmara Pelînê ya yekem nivîseke piçûk û spasî

Zimanê qedexekirî, yanê zimanê kurdî, tev li hemû birînên xwe, xwe digihîne van rojan û li ber me disekine. Erê, îro hejmara xwendevanêن kurdî ne bi qasî ku em dixwazin zêde ye, lê belê divê ev yek nebe sedema ku em bê hevî bibin. Ji ber ku li gora rewşa îro, êdî kurdê ku nikare bi kurdî bixwîne ji ber xwe fedî dike û hewl dide ku bîkaribe bixwîne.

Kurd êdî xwe bêtir li zimanê xwe digirin û dixwazin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Gava ji bo Pelînê ez çûm Diyarbekir û Mêrdînê jî min ev dît. Gelek kesên ku demekê guh nedida kurdî, êdî bi kurdî mijûl dibûn, li kar û barê me dipirsîn, li kovarê bi xwedî derdiketin û ji bô belavkirina wê piştgirî dida. Wê gavê ez bêtir bi hêvî bûm û baweriya min xurttir bû.

Kovara me bi hejmara xwe ya duyem jî digihêje destê we. Belê, hejmara Pelînê ya yekem di 10ê Sibatê de derket û me eynî rojê dest bi belavkirina wê kir. Hê hefteyeke wê neqediyabû, me nêviyê wê ji destê xwe derxistibû jî. Pelîn li her derê ku kurd lê hene tê xwendin. Li gora ku em dibihîsin, herkes bi kefxweşîyeke mezin Pelînê distîne û dixwîne, lê bi xwedî derdikeve. Em jî ji ber vêya gelekî kefxweş bûn. Em spasî elaqe û piştgiriya xwendevanan dîkin.

Li gora reaksiyonên di warê hejmara yekem de gîhaştin me, kesên ku Pelîn dît û xwend, ew bi giştî eciband. Yênu ku di hin waran de ji bo baştirkirina Pelînê rexneyên xwe yên biheq û dostane gîhandin me jî kêfa me bêtir anî û em li karê Pelînê bêtir sor kirin. Em girîngiyeke mezin didin reaksiyonên xwendevanêن xwe. Hêviya me ew e ku xwendevanê me dê di warê rexneyên xwe de texsîriyê nekin û ji bo Pelîneke hîn pêşdetir û kurdiyeke hîn bi rêk û pêktir, piştgiriyê bikin.

Armanca me ew e ku her hejmareke nû ji ya berê bêtir were ecibandin. Kêmasî dê her hebin; lê heta ku ji me were, em ê bikin ku di her hejmareke nû de, kêmasî hindiktir bibin û kovar ber bi xweşik-tirbûn û baştirbûnê ve here.

Di vê hejmarê de çar nivîs hene ku ez dixwazim behsa wan bikim. Yek jê Hawara Dîcleyê ku romana dawîn ya Mehmed Uzun e. Ev

roman berî ku derkeve, beşên wê yên din jî dê di Pelînê de bêne weşandin. Bi vî awayî, roman, berî ku wek pirtûk çap bibe, bi rêya kovarê digihêje xwendevanên xwe. Romana ku ji devê dengbêjekî zimanşerîn hatiye vegotin, ez bawer im, di pêşketina edebiyata kurdî de, nemaze di ya romana kurdî de, dê cîhê xwe yê giranbuha bigire. Roman, ji aliyê şewaz û bikaranîna zimên hebekî dişibe romanên Mehmed Uzunî yên berê, lê belê bi mijar û hûnandina xwe ji romanên wî yên dîrokî û ya dawiyê (Ronî mîna evînê Tarî mîna mirinê) hebekî bi dûr dikeve. Di romanê de carna dengbêj dibe Mehmed Uzun, carna jî Mehmed Uzun dibe dengbêj, destê xwe dide ber guhê xwe û dengê xwe berdide. Ez bawer im, hûn ê jî bi kêfxwesi bixwînin. Ji ber ku dengbêjê Mehmed Uzun, ne yekî weha ye ku hemâ li civatekê bixwîne û here, bi dû re jî tavilê were jibirkirin.

Nivîsa me ya din jî hevpeyvînek e ku Mustafa Aydogan ji bo kovara me bi Maykil Çayit re kiriye. Weke ku xwendevanên me dizanîn, di her hejmarê de dê hevpeyvîneke li ser mijarên balkêş hebe. Di vê hevpeyvînê de li ser gelek pirsgirêkên rastnivîsandina kurdî hatiye nîqaşkirin û bi mînakan, awayê wan î rast hatine pêşkêşkirin. Bi hêviya ku tiştên di vê nivîsê de hatine gotin bala kesên ku bi kurdî mijûl dîbin bikişîne û di hin waran de pirsgirêkan ji holê rake.

Nivîsa Rênas Jiyan ku navê wê Semîramîs e, ci qas bişibe şanoyekê jî, ji her aliyî, teknîk û hûnandineke nû bi xwe re tîne. Hin rastiyên civata me bi zimanekî herikbar û helbestkî, tevî malzemeyên folklorîk, bi tarza şanoyekê û hin formên postmodern hatine hûnandin. Ez bawer im ku xwendevanên me dê ji vê berhema ku bi zanîn û hesiyariyeke kûr hatiye nivîsin, pir hez bikin.

Nivîseke din jî, ku dê balê bikişîne, rexneya Remezan Alan ku li ser du romanên Ereb Şemo kiriye. Heta niha li ser rexnegirêne me bi xwe jî rexne dihate kirin; lê bi xebatên mîna vêya, ez bawer im, êdî rexneya kurdî jî dê bi awayekî objektîv û zanistî were kirin.

Bi hêviya ku Pelîn bi kurdî xweşiktir û kurdiya me ya şêrîn jî bi Pelînê şêrîntir bibe...

Heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de...

Edebiyata Welatî^(*)

Dr. Kamûran Alî Bedirxan

Edebiyata welatî, ew edebiyat e ko ji jîna miletî, ji hiş û dilê wî, ji dîrok û çîrçîrokên wî, ji stran û lajeyên wî hiltêt.

Kaniya wî, dilê milet, hiş û heyata wî ye.

Tinê ev edebiyat e, ko germ, rengîn, bibîn û xwedan rubnahî ye.

Ji vê edebiyatê, dengê bilûr û dîlanê, stranê çiyê, zîziya hêvîn û hejkirinê bi teptepa dilan ve têñ bihîstin.

Piraniya miletan pirîcar vê rastiyê seh ne dikirin, ber ne diketin.

Li ewropayê, miletin hebûn ko hej zmanêñ xwe ne dekirin. Zimanêñ xwe kiçik, teng, nespehî û nehêja didîtin.

Ev hal di welatêñ rohelatî de jî dihat ditin.

Herwekî di nav kurdan de, heçî mirovîn zana radibûn kitêbêñ xwe ne bi zimanê kurdî lê bi zimanê biyaniyan dinivîsandin.

Piştî xebata sedan salan di welatêñ ewropa û rohelat de hate seh kirin ko ev rê dernakeve û ev awa naçe serî.

Çi ko milet ji wan kitêban re guh ne dida û xebata wan mîrovan berxudar ne dibûn. Ber vê yekê ev mirovîn ha vegeriyan ser zimanêñ xwe. Vêca xebata wan zûka berêñ xwe dan û milet pey edebiyata wan çû.

Bi vî awayî di nav wan miletan de edebiyateke geş û zendî çar bû.

Êdin her kes zana nezana, bajarî gundî ko xwendinê zanî be, zimanê wan seh dikirin û kitêbêñ wan dixwendar.

Ji xwe welê jî diviya bû.

Ji ber ko ji nivîsandin û belavkirina kitêban quesd ew e ko hiş û fik-rêñ qenc bikevin nav xelkê, di dil û serê wan de cîh bigirin.

Ji mesela zimanî pê ve meseleke din jî heye.

Herwekî nas e, fikr û hîs di dora zimanî de xwe digehînin hev û her ziman fikr û hîsên xwe û awayê gotina xwe bi xwe re hildigire û ew pê re diguhêzin, û pey zimanêñ xwe dikevin.

Bi vî awayî digel zimanî fikr û hîsên biyaniyan jî têñ dikevin nav me, di dil û hişê me de cîh digirin û rû û gonê me ên manewî diguhê-rînin, diheşifînin.

Paşî vê gotinê, quesda me, awayê edebiyata me ji xwe têt seh kirin, û ew rêya ko em tê re dixwazin herin bi xwe vedibe û dikeve pêsiya me.

Vêca, divêt ko em bi zimanê dê û bavêñ xwe, bi zimanê şîrîn û delal, bi zimanê kurdî, bi kurdiya xwerû binivîsînin û fikr û hîsên xwe ji çîrok û stranêñ kurdî bigirin.

Ji xwe Ehmedê Xanî berî sêsed salî vê rîyê ji me re vekiri bû. Lê heyî paşiyêñ wî pê ve ne çûn.

Xanî kitêba xwe bi kurdmancî nivîsandi bû û fikr û hîsên wê ji çîr-çirokeke kurdî, ji Memê-Alanê girti bû.

Xanî xurtiya zimanê xwe hêj wê gavê hesiya bû û ji wan re ko pê ne dinîvisandin bi beyta jêrin dixwest bide zanîn.

“Safî şemirand vexwar durdî.

Mavendî-derî lisanî-kurdî”

Êdin çax e, ko em bidin pey Xanî. 

*) Xwendevanêñ delal, Kamûran Alî Bedirxan di vê nivîsê de ‘q’ û ‘k’ di şûna hev de bi kar anîbûn. Weke ku tê zanîn, nivîskarêñ dema Hawarê nivîsînen xwe bi wî awayî dinivîsandin; lê dû re wan ji dev ji wî awayî berdabû. Ji ber wê, me ji di vê nivîsê de cîhêñ wan bi hev re guhertin.

Lal Laleş

Maxolan

Berî zayinê 7000-8000

dîwanê reqasan dibû cîhê lomê ulûmvanan
tewşo-mewşo diherikîn ristên maxolanan
her ku dicû kûr dibû reqs

li ber lingên piçûk porê reş
şehwetê dahf vedabû...

lêv gihîstibû lêvê sor bûbû cîhan
peyvên tirsonek wek dilê xezalan
verşiyabû bi ser pêşîrên serîbilind
esmercan, hemû zaferane...

ulûm; esmercan, eşq, cîhê we bihişt be
ji nuha û bi şûn de
di rojiya mirinan de bin
heta ku...

Piştî zayinê ... / ...
rojiya xwe ya mirinê
bi navê te î reşgirêdayî dişikînim...

Her dem
esmercan,
hew!
keçen nû bi xwînê derbûyî
dizanin bi navnîşana şoreşan
navnîşana evînên bêdawî
hemû keç pişta diya min a dişibe çiyê nîşan didin...

Berî zayînê 7000-8000

ez ê lêvên te bixwim,
devê te, hinarêñ bexçeyê temenê te
bila tu bes min bibîñî.
ez ê çavêñ te bixwim, ertûşa esmer
li ser pêlêñ ava bakûrê sor
ava zelal a dil û zimêñ
ava gewimî xezeba dil; ez ji te hez dikim

ava şolî xezeb mir
nuha bêtir ji te hez dikim...

umrê min
di bêrika xwe de
deryayeke cer bi car dixeliya
şerekî sêlûbêl (anarşist)
herseke serê xwe dişuşt
hezkirineke diyalektîk
kenekî arkaîk diparêze binhişê min...

ji bo te min kêrên nêçîrê avêtin
çîrokêñ xwe li sükêñ şewitî bi çavêñ xezalan diguhertin
hîn û hîn! xelk ji min re dibêjin
“ero...! ma ne tu yî yê ku çîrokêñ xwe difiroşe!”

keçêñ evîndarêñ birînan
şûr û mertalêñ evînê li ser serê min dibin û tînin
dibin û tînin...

Piştî zayînê

rojiya xwe ya mirinê
bi navê te î reşgirêdayî dişikînim
lêêê...

Zilamek û Zimanek

Celadet Alî Bedirxan

Belê heke ew zilamê xurt û bi vêney peyda bû zilamek dikare zimanekî jihevdeketî saz bike û carina zimanekî mirî vejîne. Herwekî em ê niha bibêjin ew zilam peyda bûye û zimanekî mirî vejandiye û ew xistiye nav zimanêñ zindî, nav wan zimanêñ ko mirov pê daxêvin û mexsedên xwe pê eßkere dikin.

Me got zimanêñ mirî û zimanêñ zindî. Bêdiro, ji awirê jiyînbariyê ve ziman jî wek mirovan û wek her heybera rihber dizên, dijîn û dimirin.

Ji zimanêñ mirî hin hene warkor û kordûnde diçin, di pey xwe re tu tişti nahêlin; ne kîl ne kitêb. Hinêñ din di pey xwe re eserine mezin, kitêbine hêja dihêlin û ew kitêb hetanî iro jî tenê xwendin. Lê ew ziman bi xwe mirî ne, ji ber ko êdî ew ne zimanê devkî ne û tu kes bi wan naþeyive.

Li Ewropayê latinî, li rohelatê nîzing îbranî zimanine mîrî bûn. Latinî iro jî zimanekî mirî ye. Lê herçî ibranî êdî ne zmanekî mirî, lêbelê zimaneki zindî ye.

Belê ew mirovê bivêñ di nav cihûyan de derket û zimanê ibranî vejand. Îbranî zimanekî samî, zimanekî kevnare, hevalê erebiyê ye. Tewrat yek ji çar kitêbên mezin pê hatiye gotin û nivîsandin. Bi tenê zanayan pê dizanîn û di kiniştan de tewrat bi vî zimanî dihate xwendin.

Herçî cihû bi zimaninê din, bi zimanêñ welatêñ ko tê de rûdiniştin xeber didan. Yanî cihûyan zimanekî milî, zimanekî xweser nîn bû û ji lewre wan bi zimanêñ xelkê xeber didan.

Di sala 1877an di şerê ûris û tirkî de zora tirkan çû bû û herçî mîletêñ Belqanê hene ji bindestiya tirkan xelas bû bûn. Xelaskirina dewletêñ Belqanê nemaze bi destê çarê ûris çû bû serî û mîletê ûris bi xwe bi vî işî bendewar dibû û rojnameyêñ rûsî gelek qala dewletêñ Belqanê ên nû dikir.

Di welatê ûris de xortekî cihû bi navê Elyêzer bin Yehûda hebû. Kurê Yehûda wek herkesî bi vî şerî bendewar dibû û didît ko miletên bindest wek Sirbistan û Birxaristanê û ên mayîn ji nîrê zorkerên xwe xelas dibûn û digihaştin istiqalalên xwe. Yehûda bi van bûyeran li miliyeta xwe hişyar dibû û li ber halê miletê xwe diket. Yehûda didît ko halê miletê wî ji halê her miletê din xirabtir e. Cihû ne bi tenê bê welat û bê hikûmet in; lê zimanê wan ji nîn e û bi zimanên xelkê xeber didin.

Xortê cihû qerara xwe da û di dilê xwe de got: divêt cihû vegerin welatê pêşiyên xwe, welatê kurên Israil, û dîsan divêt ko cihûyan jî weke xelkê zimanek hebe û têk de pê baxêvin. Ew ziman jî zimanê pêşiyân, zimanê ibranî ye.

Yehûda hinî zimanê xwe bû û di sala 1878an de qesta Parisê, qesta wî bajarê mêvanheîn kir.

Li Parisê, Elyêzer bin Yehûda têkilî cihûyên Parisê bû. Elyêzer ji alîkî zimanê xwe pêş ve dibir û ji aliyê din fîkrên xwe ên mîlî belav dikirin. Lê welatiyên wî bi xwe lê radibûn û heye ko digotin ev mirov dîn e. Lê Yehûda guh ne dida wan û ji esera xwe a mezin re bi vîneke xurt û mezin û bi serê xwe dixebeitî. Yehûda kiribû serê xwe ji miletê xwe ê bêziman miletekî biziman bîne pê.

Yehûda bi xwe hinî zimanê xwe, hinî îbraniyê bû bû. Niha diviya bû îbraniyê di nav civata miletê xwe de belav bike. Ji bo çandina tovê xwe jê re zeviyek diviya bû. Di sala 1881ê de Elyêzer keça mamos-teyê xwe ji xwe re anî û berê xwe da Felestînê. Bi vî awayî jinikek, himê xanimanekê, keti bû destê wî. Zaro wê bidana pey. Yehûda, bi rî ve, di vaporê de dersa jina xwe got û hetanî ko gihaştine erdê Felestînê jina wi hînî çend pirsên ibranî bû bû.

Gava pê li erdê pêşiyân kirin Yehûda gote jina xwe, ji niha û pê de em ê bi tenê bi îbranî xeber bidin. İbraniya jinikê gelek hindik bû. Jinikê kir ne kir lê mîrê wê ji qerara we ne geriya. Ne hewceyî gotinê ye ko zaroyêن Yehûda hetanî ko bûne xort ji îbraniyê pê ve bi tu zimanî ne dizanîn û ji lewre di nav xelkê de lal dihatine hesêb. Lê bi vê laliyê miletê cihû wek miletine din bû xwedîyê zimanekî, xwedi-yê zimanekî xweser.

Yehûda û xelkê mala wî di zivariyê de dijîn. Lê ci xem. Ji fikirine mezin re fedakarine mezin divêtin. Ji ber ko xelk bi derbekê bîra fîkira mezin nabe. Yehûda nanê tisî dixwar lê gava didît ko xelkê mala wî bi îbranî xeber dida, bawer bikin, xwe bextiyartirê mirovên dinyayê dihesiband.

Dawiyê Yehûda rojnameke bi îbranî belav kir û ji xwe re xwendevan jî peyda kirin. Bi rê va û di hin dibistanên cihû de dest bi xwendina îbraniyê jî kirin.

Ji milê din Yehûda ferhenga miletê xwe çêdikir û bêjeyên ko di zimanekî mirî de nînin ew jî pêk ve tanîn. Zimanê îbrani jî di nav cihûyan de belav dibû. Di sala 1922an de gava Elyêzer bin Yehûda mir, zimanê îbranî yê ko berî 30-40 salî zimanekî mirî bû, bû bû zimanê mileteki. Ev ziman îro di Felestinê û di rex erekî û ingilîziyê de zimanekî resmî, zimanê dewlet û hikûmetê ye jî.

Kurdino, eve zilamek û zimanek û tiştê ko bi vêna zilamekî tête pê. Di kar û biserhatiya vî zilamî de end û derseke mezin heye. Herçî miletêne bindest û bêziman an bê zimanê niviskî divêt jê ibretê bigirin. Herçî em kurd, me ziman, me zimanekî delal heye û em pê daxêvin û piraniya me ji vî zimanî pê ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivisandina zimanê xwe bibin.

Îro hînbûna xwendin û nivisandina zimanê mader ji bo her miletî êdi ne bi tenê wezîfeke şexsî lê wezîfeke milî ye jî. Herçî bi vê wezifê ranebûne wezifa xwe a milî pêk ve ne anîne û bi kêrî miletê xwe ne hatine. Ji bona ko mirov bikare xwe ji mileteki bihesîbine divêt bi kêrî wî bêt.

Piştî ko em kurd jî wek miletêne din bûne xwediyê elfabeke xwesser, xwendin û nivisandina zimanê me gelek hêsanî bûye. Tecrîbê şanî daye ko li gora jîriya mirov kurd ji heftekê heta çar heftan de dikarin hînî xwendin û nivisandina zimanê xwe bibin.

Belê piraniya kurdan bi tenê bi zimanê xwe ê mader dizanin û ji lewre li mal be ji derive be bi tenê bi kurdî dipeyivin. Lê di nav kurdan de hindikahîke kiçik heye û xelkê vê hindikahiyê an di welatê xerîbiyê de bûne an îro tê de dijîn. Tiştê ko ji vê hindikahiyê re divêt, heke bi zimanê xwe nizanin berî ewili hînî wî bibin û pişt re di nav mala xwe û bi zar û zêçen xwe re her weki Elyêyer dikir bi tenê bi kurdî xeber bidin.

Belê ji van kurdan re divêt, gava ji derive têne mal, herwekî cilên xwe ji xwe dikin û wan bi cilên malê diguhêrînin, zimanê xwe jî we'lê biguhêrînin û bi zimanê kûçê di nav malê de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tiştekî miqedes hilînin.

Arjen Arî du helbest

Wey Gidî...!

Min dil daye mewîška çavêن te,
ka guneh e?
Mijgulin te hene mijgulin te
reş... û bi ser de kilkiri?
Hewce ye bibêjîm burhêن rakirî?
Porê vekirî... pêsîrêن berdî berdî...
wey gidî,
bûme hêsiрê te!

Çileyê Dawî.99

gazina gazî, ji generalekî

çavêن min bide, generalê min
tu çavêن min bide ji kerema xwe.
te du çav hene, generalê min
min ew wenda kirin û destêن xwe.
ez Memedê te me, generalê min
te ez şandim şer, û qet te negot min.
şerê ku tu diçiyê çavan jî dixwe!

Adar.99

Elyêzerê Kurd

Mustafa Aydogan

Sirgûn ewrekî reş û tarî... Sirgûn reşbîniya ku bûye kurkê qetiya-yî... Sirgûn êrîşen bêhêvîtiyê yên ku berê wan li bihara dilê me... Sirgûn reşqedera ziman û edebiyata kurmancî. Hem ziman û hem jî edebiyata me di gelek demên dîrokê de bi êrîşen pirhêl rû be rû bûne. Nuha jî bi îmkanê teknîka nuh ve hawîrdora wan hatiye girtin. Dinya hem li serê kurdan û hem jî li ser serê ziman û edebiyata wan bûye tara bêjingê.

Sirgûn bitênbûn, sirgûn êş û elem, sirgûn hesret û kesereke bêdawî. Sirgûn li deveke bakûrê dinyayê ya xalî sermayeke dijwar û nedîtî. Sirgûn labîrentên wendabûn û bêhêvîtiyê... Malmîratê bîreke weha kûr û bêbinî ye ku mirov di wê de hertim bi hesreta bi rûkala dinyayê ketinê ve dişewite. Sirgûn zindana hêviyê ye; serî li kevirê gorê ketin e.

Di sedsala bîstî de her ji demekê carekê mecbûrî sirgûnê bûne û ji ber xezeba ku bi awayekî nedîtî bi ser wan de hatiye, xwe li gelîyen kûr û bêbinî yên ku ji bo dabelihandinê amade bûn girtiye. Kurdan ji sirgûna bêbext bext xwestiye. Sirgûn jî bi nan û perçakî li ber digere ku hinek xwe lê bigire û ew jî bikaribe fonksiyona xwe bi cîh bîne.

Lê kurdan di dîroka xwe de nîşan daye ku sirgûn di eynî wextê de, di nav toz û dûmana ku ezmanê şîn bi tebeqeyeke reş nixumandiye de, çirûsk bi çirûsk hêvi ye jî. Ji ber ku ji bo ev qedera xerab bête guhertin hewildanêñ herî berbiçav dîsa her li sirgûnê, li vê devera bêçare peyda bûne. Kurdan bi vî awayî ji bêçaretiye çare afirandine.

Ev li gel xebatêñ din di warê weşan, ziman û edebiyatê de jî her weha ye. Rojnameya "Kurdistan"ê ya ku em îsal sedsaliya wê pîroz dikin û me roja weşandina wê (22ê Nisanê) wek roja rojnamegeriya kurdî qebûl kirîye - wek piraniya rojname û kovarêñ piştî xwe - jî li sirgûnê derketiye. Îro jî gelek kovar û rojname li sirgûnê derdikevin.

Îro jî ziman û edebiyat li sîrgûnê bêtir di ber xwe de didin û îmkanên pêşveçûnê bêtir peyda dîkin.

Hawarê jî wek gelek kovar û rojnameyên din ji ber xezeba tarîtiyê, ji ber agirê ku li kurdan bariyabû, 66 Sal berê li sîrgûnê dest bi ji-yana xwe ya weşanî kir. Ew gava piştî serîhildanên kurdan ên ji bo bidestxistina maf û azadiyên neteweyî têk çûn û co û cobarên welêt sor herikîn, gava kurd bûbûn noka li kevir, wek bendeke kurdan a ji bo xwe li hember êrîşen tunekirinê bikaribin bigirin derket ortê. Di pêvajoya ku pêlên bêhêvîtiyê bi xurtbûn û heybeta xwe ya herî mezin herkes dabû ber xwe de, ew li sîrgûnê, li devera kana bêçaretiyê, wek kaneke hêvî û çareyê derdikeve ortê. Banga Hawarê di şertên ku êdî çô di şikeftê de hilnedihat de, halana ji bo desthilanîna kurdan e. Parêzgeha me ya weha xurt e ku li hember êrîşen asîmîlasyonê em dikarin bi ewleyî tê de bisitirin.

Hawar di jiyana kurdan de qonaxeke pir girîng e. Ev girîngiya wê, ne bi tenê ji ber kurmancıbûne wê an wan wan xusûsiyetên wê yên ku min li jorê behsa wan kir, tê. Beriya her tiştî, fikira ku di 1919an

Ji alîyekî dîn ve, rûpelên Hawarê belgeyên dewlemendîya folklorâ me ye. Wê jî bo berhevki-rin û ya herî girîng jî bi awayekî bî nîvîskî pêşkêşkirina hêjayiyin di vî warî de xebateke weha mezin kiriye ku mîrov lî hember şiyana dûrbîniya xwedî û xebatkarên wê ecêbmayî dimîne.

de bi tesîra Mêcer Nowelê Îngîlîz bi Celadet Bedirxan re peyda bûbû, bi saya wê têkîlî bi jiyanê re danî. Bi wî awayî Celadet Bedirxan bi perspektîva xwe ya ku yekîtiya zimên bi yekîtiya herfan pêk tê, bingeha alfabeşa me ya latînî danî û di rûpelên Hawarê de pêşkêşî gelê me kir. Wî bi cîddiyeta alimekî her herf bi hûrbijarî hilbijart û sedemên

vê hilbijartinê ji bo her herfê bi detay şîrove kir. Bi wê re bingehêن gramer û rastnivîsandina kurmancî hat amadekirin. û piştî van gavê Hawar û xwedîyê Hawarê, êdî tu kesî nema dikarîbû bigota zimanê me bi tenê zimanê axaftinê ye. Ji ber ku bi van gavan re hîmê zimanekî nivîsandî hatibû danîn. Gelo beriya Hawarê bi vî zimanî nehatibû nivîsandin? Celadet Bedirxan di hejmara bîstî de di vî warî de weha dibêje:

"Herê, hatibû nivîsandin û di zemanê gelek kevn de. Berî çend babelîskan hin camêran bi zimanê me kitêbînen mezin jî çêkirine. Lê wan nivîsaran ji me re zimanek nedianîn pê." Lê Celadet Bedirxan xebatêن wan camêran încar nake; wek hinekan dîrokê ji xwe nade

destpêkirin û dibêje: "Heke Hawarê hîme zimanê me daniye Xanî giyanê wê afirandibû. Ji xwe kurdaniya bîrewer bi Xanî re dest pê dike."

Xusûsiyeteke din a Hawarê ev e; wê tesbît kiriye ku di navbêra edebiyata devkî û nivîskî de ferqeke mezin heye. Di vê niqteyê de tiştekî nuh tune ye, ji ber ku ev beriya wê jî tête zanîn. Lê tiştekî ku xusûsiyeteke taybetî dike para wê ev e ku wê bi vê tesbîta xwe bi tenê qîma xwe neaniye û rewşa edebiyata nivîskî ya ku hema hema bi helbestan ve sînorkirî mabû qebûl nekiriye û ji bo zimanê me di her qada jiyanê de bête bikaranîn, bi perspektîveke zelal û çalakiyên berbiçav hewil daye. Ji aliyekî din ve, rûpelên Hawarê belgeyên dewle-mendiya folklorâ me ye. Wê ji bo berhevkirin û ya herî girîng jî bi awayekî bi nivîskî pêşkêskirina hêjayiyin di vî warî de xebateke weha mezin kiriye ku mirov li hember şiyana dûrbîniya xwedî û xebatkarê wê ecêbmâyî dimîne.

Hawarê di xebata xwe ya ji bo pêşdebirina zimên de, girîngiyeke mezin daye wergeran jî. Wê di di pêşdebirina zimên de rola wergeran baş dizanîbû û ji ber vê yekê rûpelên xwe bi wergerên cur be cur jî xemilandine.

Mirov ji kîjan aliyî li Hawarê binihêre, mirov ê şoreşke xurt tê de bibîne. Ew li gel xusûsiyetên xwe yên ku li jor behsa wan hate kirin, hem mamoste bû, hem dibistan û hem jî propagandîsta çand û zimanê kurdî bû. Ew di vê niqteyê de stûna me ya herî xurt e ku divê iro jî em xwe bispêrinê. Vê rola wê ya dîrokî nebûye qismetê tu kovarên din. Divê em li ser îmkanên ku bi saya wê hatin afirandin û fikir û kirinên xwedîyê wê yên ku ji bo bingehkirin û pêşdebirina çand û zimanê me ku di pêvajoya jiyana wê ya weşanî de derketin ortê, bi awayekî pirhêl bifikirin, minaqaşe bikin û di vî warî de baweriya li ser esasê zanebûnê hatiye avakirin xurttir bikin. Bi şertê ku em di çarçoveya lêbixwedîderketina hêjayiyên xwe de bimînin, em dikarin di hin waran de bi awayekî cuda bifikirin û bi misteweya xwe ya nuha reforman minaqaşe bikin. Ev tiştekî xwezayî ye û divê tu kes li hember bikaranîna vî mafê xwezayî raneweste. Celadet û Hawar bê şik bingeh in. Perspektîven Hawarê çarçoveya me ye. Lê divê em hişkiya olperestî ji derveyî vê çarçoveyê bihêlin. Bi awayekî zanîstî û bi perspektîva ku hertiştê kêm divê bête temamkirin û her tiştekî şas divê bête rastkirin, minaqaşeyên xwe yên ji bo zelalkirin, pêşdebirin û lêbixwedîderketinê bidomînin.

Fonksiyoneke Derengmayî

Xusûsiyetên Hawarê û mîrasa ku wê ji me re hişt, wê ji hemû kovar û rojnameyên din vediqetîne. Ev taybetmendiya wê, îmkanên bitesîrbûna wê jî zêdetir dike. Lê mixabin wê gavê tesîra wê ji bo hemû besên welêt bi eynî dereceyê xuya nebû. Ev tesîr bi taybetî li bakurê welêt, ji ber şertên wê demê bi sînor ma. Ancax gava sirgûna bi 12ê Îlonê re dest pê kir, îmkanên ku Hawar bikaribe fonksiyona xwe ya derengmayî ji bo vî perçeyê welêt jî bileyize bêtir bûn. Bi binxetbûna xortên ku xwe ji ber xezeba tarîtiyê didan alî, şertên bicîhanîna fonksiyona derengmayî jî hêdî hêdî dihatin amadekirin. Di vê mahneyê de mirov dikare bibêje, Hawar "diyeriyeke" ji wan diyariyan e ku di pêvajoya xezeba 12ê Îlonê de hatiye bidestxistin.

**Xusûsiyetên Hawarê û mîrasa
ku wê jî me re hişt, wê jî hemû
kovar û rojnameyên din vediqetî-
ne. Ev taybetmendiya wê, îmka-
nên bitesîrbûna wê jî zêdetir di-
ke. Lê mixabin wê gavê tesîra wê
jî bo hemû besên welêt bi eynî
dereceyê xuya nebû. Ev tesîr bi
taybetî li bakurê welêt, ji ber şer-
ten wê demê bi sînor ma.**

Hawarê bê par hate jiyîn. Ger Hawarê bikarîbûya tîna xwe bida tevgerên wê demê, di warê bi kurdî jiyîn û lixwevegerînê de, gavêن pir mezin dikarîbûn bihatana avêtin. Lê mixabin nifşen heftêyî ji vê dewlemendiyê bê par, hilma xwe ancax li binya xetê vekir.

Min bi xwe Hawar cara yekem di havîna 1981ê de li bajarê evînê, li Qamişloka rengîn dît. Hevdunaskirina min û wê berê li taxa Qudûrbegê dest pê kir, lê gava me ji wira bar kir û em çûn xaniyê rahmetiyê Xelîlê Bêzo - ku gelek mexdûrên 12ê Îlonê wî baş nas di-kin- êdî di orta min û wê de - wek ku di orta wê û gelek kesan de hebû- dostaniyeke ku gotin têrê nakin hatibû peydakirin. Ew bi temamî bû heval û hogira min a sirgûnê, dibistana min a xwe baştir násîn û bi xurtî lixwevegerînê. Min her wê salê, ew çend caran xwend, bi gotineke din, min ew berê xitim kir û dû re jî carî kir.

Her ku min rûpelên wê di ser hevdu re qulipandin, deriyê dinya-yeke rengîn û dewlemend li ber min vebû. Her rûpelek mîna kulîlke-ke nûbişkivî... Ez ji bêhna ku ji wan difûriya sermest bûm û min bi

Ger Hawar di salên heftêyî de li bakurê welêt hatibûya weşan- din, ger perspektîven wê û xwe- diyê wê ji aliyê girseyan ve hati- bûya zanîn û fahmkirin, bê şik rengê minaçeşeyen me yên wê demê û helwesta me ya di warê lêbixwedîderketin û pêşdebirina hêjayiyê neteweyî de, dê bi awayekî din bûya. Lê mixabin

ew pêvajo ji mîras û tesîra Ha-

warê bê par hate jiyîn. Ger Hawarê bikarîbûya tîna xwe bida tevger-

ên wê demê, di warê bi kurdî jiyîn û lixwevegerînê de, gavêن pir me-

zin dikarîbûn bihatana avêtin. Lê mixabin nifşen heftêyî ji vê dewle-

mendiyê bê par, hilma xwe ancax li binya xetê vekir.

Min bi xwe Hawar cara yekem di havîna 1981ê de li bajarê evî-

nê, li Qamişloka rengîn dît. Hevdunaskirina min û wê berê li taxa

Qudûrbegê dest pê kir, lê gava me ji wira bar kir û em çûn xaniyê

rahmetiyê Xelîlê Bêzo - ku gelek mexdûrên 12ê Îlonê wî baş nas di-

kin- êdî di orta min û wê de - wek ku di orta wê û gelek kesan de

hebû- dostaniyeke ku gotin têrê nakin hatibû peydakirin. Ew bi

temamî bû heval û hogira min a sirgûnê, dibistana min a xwe baştir násîn

û bi xurtî lixwevegerînê. Min her wê salê, ew çend caran xwend, bi

gotineke din, min ew berê xitim kir û dû re jî carî kir.

Her ku min rûpelên wê di ser hevdu re qulipandin, deriyê dinya-

yeke rengîn û dewlemend li ber min vebû. Her rûpelek mîna kulîlke-

ke nûbişkivî... Ez ji bêhna ku ji wan difûriya sermest bûm û min bi

vê sermestbûnê xwe li baxê îrem girt. Min xwe di pêlikên ber derî re bera xwarê da, ez daketim dinyaya wê. Ez li mala Mîr bûm mîvan. Ez li mîvanperwerî û comerdiya kurdan bûm şahîd. Gava min li "Xwe binas" a wî guhdarî kir ne tu rûyên ciyayêن asê û ne jî tu ba û bahozan dikarîbû ez rawestandama. Min şîretên wî yên di warê xwenaskirin û lixwevegerînê xistin serê xwe û min soz dayê ku ez ê eynî şîretan li biçûkên xwe jî bikim. Min li Ehmedê Fermanê Kîkî guhdarî kir. Min di "Ez û Dîlberê" de rewşa Cegerxwîn û li hember "yar" ê dît. Ez li N.Zazayê ku evîn û hesreta dilê wî di dilê wî de hilnediha-tin û zor dida qafesa sîngê rast hatim. Ez û ew, em di "Derketî" de bi gotina wî ya ku derketî li her derê bi tenê ye, bi hevdu re kelogirî bûn. Ez çûm şevbihêrka Dêrikiyan. Min ji Êlas Efendî tecrubeya 1925an wergirt, dijwariya şertên sîrgûnbûnê bi çavên serê xwe dît. Ez dû re bi xemgînî ketin bin darbesta wî û tevî hesreta wî min ew li Ebû Ceradê veşart. Min ji devê Qedîcan li "Dêrik" ê guhdarî kir. Bi wê re di wê kelkela germa havînê de bi bayekî hênik ji Tûrcelê hat û xwe li min girt. Ez bi Osman Sebrî re bi minasebeta "Tevdîra müş-kan" li ser bêtevdîriya kurdan fikirîm. "Dil ji min bir" a Melayê Ci-zîrî dil ji min bir. Min di bin tesîra Çarînê Xeyam ên bi kurdiya Kamûran A. Bedirxan hatibûn wergerandin de piyaleyeke şeraba sor ji destê meygerekî girt û bi ser xwe de dakir. Ez bi Mem re ji temâşaya xweşikbûna Zînê têr nebûm, lê dû re em bi hevdu re di nav dixana fesadiyê ya ku Beko bi erdê xistibû de wenda bûn.

Ez li Elyêzerê cihû rast hatim. Min dît ku zilamek dibêje ziman bingeh e, bê ziman netewe nabe. Mirovek zimanekî vedijîne û pêşkê-şî neteweyekî dike. Min di vî warî de li Celadet Bedirxan guhdarî kir û ji serpêhatiya vî zilamî ibret girt. Min şertên Elyêzer û yên Celadet Bedirxan dan ber hevdu. Min dît ku herdu jî li welatên xwe mezin nebûbûn. Lê herdulan jî bi fikirên mezin ji bo welatên xwe hereket kiribûn. Di vê rûyê de fedakariyên pir mezin nîşan dabûn. Herdulan jî ji bo yekîtiya neteweyî û yekîtiya zimên pêşevanî kiribû û dîsa herdulan ev pêşevanî di bin ronahiya perspektîvên xwe yên mezin û neteweyî de bi bawerî û bi israr meşandibû. Herdulan jî bawer dikir ku ger ziman tune be, netewe jî tune. Dîsa herdulan ji bo yekîtiya nete-weyî jî ziman wek bingeh dizanîbû.

Min serê xwe ji Hawarê rakir û ez li rewşa nifşê xwe, ya rastî bêtir li rewşa xwe fikirîm. Salêñ hefteyî wek xewnekê hatibû jiyîn. Di nav hêjayiyan de wan hêjayiyêñ neteweyî ku ji ber paraztina wan min xwe bi derbekê re di Kolana Evînê de dîtibû, ancax piştî hevdûdîtina min û Hawarê rohnîtir û zelaltir bûbûn. Nifşê me heta wê gavê ji bo

bidestxistina wan hêjayîyan fedakariyên pir mezin kiribûn, lê piraniya wan bi hêjayîyan nejiyabûn, zimanê wan ï esasî yê minaqaşe û nivîsandinê ne zimanê kurdî bû. Lê ji ber ku ew kurd bûn û wan maf û azadiyên kurdan parastibûn felek li serê wan geriyabû û wan jî xwe li hêlinâ sîrgûnan girtibû. Di vê hêlinê de Hawar hat gaziya vî nifşî û ew hêdî hêdî bi hêjayîyan eslî techîz kirin. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku di warê lixwevegerîna vî nifşî de Hawarê bi derengî be jî roleke esasî listiye. Ji xwe, yê ku di navbera bakurê welêt û Hawarê de dû re rola pireyekê list û hîn jî dilîze jî her ev nifş e ku têkiliyên wan bi Hawarê re çêbûne.

Kurd di Hawarê de bilind in

Di her rêzeke Hawarê de, di her rûpeleke wê de û di her hejmareke wê de hewildanê ji bo kurdan hîn bilindtir bikin xuya dibin. Gava ew ji bo ku kurd bi xwe bihesin hewil dide, ji bo paraztin û pêş-debirina maf û azadiyên wan dixebite, wek hinekî din ku di dema de dîkin, kurdan qet biçûk nabîne, Nefretê ji kurdan nake. Tam tersê wê, ew ji kurdan pir hez dike û ji bo vê hezkirinê tiştê ku nikaribe feda bike tune ye. Ew ne ji xwe, ne ji dîroka xwe û ne jî ji hêjayîyen xwe fedî dike. Ew bi awayekî serbilind pesnê dewlemendî û hêjayîyen kurdan dide. Mirov dikare pir bi hêsanî bibêje ku bi Hawarê re rijikên kurdan jîr bûn. Ji bo ku kurd bikaribin bi xwe bihesin û xwe nas bikin, da ku bikaribin bi awayekî hîn xurttir û zanetir li van dewlemendî hêjayîyan bi xwedî derkevin, Hawar û Celadet Bedirxan xebatên xwe yên di warê şiyarkirin û fêrkirinê de bi hemû awayên fedakariyê û bê rawestan domandine.

Çeka me ya bi tenê: Ziman

Celadet Bedirxan di hejmara bîstî de, li ser çeka ku em ê bikaribin xwe pê biparêzin radiweste:

"Ji ber ku milletên bindest heyina xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzînin: Ol yek, Zman dudo. Lê heke ola milletê serdest û bindest yak bibe, hingî çek yek bitenê ye, û bend te-nê zman e."

Gotinê xwêdiyê Hawarê pir eskere ne; di vî warî de xeteke esasî pêşkêş dike; bingeh û rêya biserketinê nîşan dike. Piştî van gotinan, piştî xeta ku Elyêzerê kurd daniye, êdî hûn liberal bin, sosyalîst bin, mihafezekar bin bibin;çi dinivîsînin, çi minaqaşe dike bikin. Lê ger we di van nivîsandin û minaqaşeyen xwe de miameleya sinifa duyem bi zimanê kurdî re kir, ew tê wê mahneyê ku we ji destpêkê de wen-

da kirkiye. Di vê qonaxa îro de hebûna çand û zimanê kurdî bi qasî ku bi dema Hawarê re nikare bê miqayesekirin tê tehdîtkirin. Îro mala ku lê bi kurdî neyê peyivîn, komela ku zimanê wê yê resmî ne kurdî bepartiya ku ji bo ji zimanê kurdî bireve li mazeretan bigere, nika-re doza kurdan jî pêş de bibe. Ev her weha ji bo kovar û rojnameyên ji aliyê kurdan ve derdikevin û ne bi kurdî, lê bi zimanekî din xîtabî kurdan dîkin jî derbas dibe. Ji ber ku ger kurdî bê jibîrkirin û di gi-raniyê de zimanekî din bibe zimanê me, wê gavê tu mahneya hewil-danê me yên ji bo paraztin û pêşdebirina hêjayiyê neteweyî dê tu-ne be. Ger em girîngiye ھikaranîna zimên fahm nekin, em ê her tim ji xelkê re herin êş.

Yên li xerîbiyê dijîn jî divê guhêne xwe baş bidin Elyêzerê kurd. Ew di hejmara 40î de berê xwe dide kurdêni li xerîbiyê dijîn û weha di-bêje:

"Belê ji wan kurdan re divêt, gava ji derve têne mal, her wekî ci-lêni xwe ji xwe dîkin û wan bi cilêni malê diguherînin, zimanê xwe jî welê biguherînin û zimanê kuçê di nav malê de naxêvin û zimanê, zi-manê mader wek tiştekî miqedes hilînin."

Ci li welêt û ci li xerîbiyê, di gelek civînêni kurdan de dengê yên ku dibêjin ziman ne girîng e, tiştê girîng ew e ku em bikaribin mesaja xwe bigihînin gel, pir tê bihîstin. گ gelek hene ku hîn jî bi vê perspek-tîvî heréket dîkin û bi çavekî biçûk li wan kesen ji bo jiyandina kurdî hewil didin dînihîrin û wan wek mirovîn ku xusûsiyeta vê pêva-joyê fahm nekiriye dibînin. Ger em girîngiyê nedîn vê minaşeşeyê û di xebata paraztin û bikaranîna zimanê xwe de sist bin, xwedîyê perspektîvîn ku li jor hatin zimên, dê me bikin dizê sola me. Ji bo vê yekê di vî warî de hewildanêni xurt û pîrhêl pêwîst in.

Divê herkes û di serî de xwedîyêni perspektîvîn weha, xwe di vir de û wê de nebin û di vê pêvajoyê de baş tê bigihêjin ku yên bi kurdî nepeyivîn û nenivîsînin, dara bin xwe dibirin. Di warê çand, ziman û edebiyatê de û ya girîng di warê hebûna xwe de, şertêni ku kund li dewsâ warêni wan bixwînin bi destê xwe amade dîkin. Yên ku ji bo kurdî wek zimanê xwe yê esasî bi kar neynin li mazeretêni bêbingeh biggerin û ji bo paraztina rewşa xwe, her ku mirov sîngekî bikuteû ew jî tûrekî pê dakin, dê di warê midaxaleya vê pêvajoyê û lêbixwedîder-keftina hêjayiyêni xwe yên neteweyî de hertim wek agirê li heriyê di-çe, bê tesîr bin. Dewla wan dê tu carî bi avê nekeve.

Xelateke sedsaliya rojnamegeriya kurdî

Hawar ci ye ne ci ye, tevî fonksiyonên xwe herî baş di hejmara ye-kê de bi gotinên xwediye xwe hatiye zimên:

"Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwenasîn e. Xwenasîn ji me re rê-ya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike, dikare xwe bi-de naskirin. Lewma ko ziman şerta heyînê a pêşîn e."

Hawar di nav toz û dûmana reşbîniyek e dijwar û xerab de xweş-bîniyek kurdan e. Her rûpeleke wê kulîlkek û her hejmareke wê demsalek e...

Hawara ku li sirgûnê di 15ê Gulana 1932an de dest bi weşanê kir, berê di 1975an de û dû re di 1987an de dîsa li sirgûnê, li welatên Ew-rûpayê yên cuda wek rojeke kurd ji nû ve hilat û berê tîrêjên xwe beş bi beş ber bi welêt ve kir. Lê îsal li Swêdê, yanî vê carê jî li sirgûnê ev tîrêj hemû li hevdu civiyan û di roja rojnamegeriya kurdî de, bi şew-qeke mîna ku li ser serê çiyayê Nemrûd ji nişka ve xuya bibe û hemû şopên çand û dîroka me di ronahiya xwe de bihêle, berê xwe da gelê kurd. Di bin vê şewqê de mezopotamya rengîntir, Firat û Dîcle bi heybettir herikîn.

Nûdemê bi weşangeriya xwe ya bi rêk û pêk, bi estetîka xwe ya taybetî û bi xebata xwe ya hûrbijar em bi xelateke sedsaliya rojnamegeriya kurdî; bi hemû hejmara Hawara me şad kîrin. Divê êdî kurd tevî hêz û îlhama ku ji Hawarê tê wergirtin, di hawara xwe de, di hawara çand û zimanê xwe de, di hawara hebûna xwe de werin û "rêya felat û xweşiyê" vekin. 

Melayê Cizîrî

Dîsa got şanê wî pîroz be

1. Şebçiraxê şebê Kurdistan im (ji beşa vegera li bendê ye)

Me bi dil nêrgizên xasse divên
Semen û yasemînê taze divên
Nazik û neyşekerên tu'hfe divên
Sosinên nazik û terwende divên
Dilberên dêmdur û durdane divên
Kewkebên şewq û şefeq zuhare divên
Nazê perwerde û şehzade divên
Sayeperwerde me bêperde divên
Serwîqed, dêmgul û lebxunçe divên
Ayetullahê şerîfnusxê divên
Lê bi û'rab, xet û cezme divên
Dilrubayan ne tinê xemze divên
Bi Mesîha sîfetê 'îşwe divên
Samîrî sihrisîfet şêwe divên
Senemên sur ji semed her me divên
Ji me eswedheceran secde divên
Bi ziyaret me ji wan bûse divên
Turreya şeng-i dilaşufte divên
Mihrîdarêñ xwe di pijmurde divên
Pêşkişa te me du sed nafe divên
Sedhezar etles û hem xare divên
Her li bo zînet û xemla te divên
Textebend û sîfetên Qeyseriyê
Dînberê horî mîsalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

Pur ji dîna te xerîb im xanim
Ji te ser ta bi qedem heyran im
Her bi can teşnelebê le'lân im
Dil di benda giriha zulfan im
Yûsîfê cer'ekêş ê hicran im
Nuqteê daire ê zindan im
Lew şubê daire sergerdan im
Badenoşê qedehê 'hurman im
Bi dil ateş ji ceger buryan im
Lew perişan im we purêşan im
Aşıqê nazik û me'hbûban im
Tu mebîn bêser û bêsamân im
Gulê baxê îremê Buhtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im
Çi tebî'etbeşer û însan im
Lillahî el-'hemd çi 'alîşan im
Di riya yar li rêza san im
Lew di îqlîmê suxên xaqan im
Sibehê 'îd e û ez pê zanim
• Ku bi kêra te seher qurban im
Xwoş birîndarekî bêderman im
Carekê şefqe ke rûh im can im
Ji Xwudê ra veke benda beriyê
Dînberê horîmîsalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

Sosinê taze û mişkîn walan
Bes perîşan ke li ser sermalan
Veke carek tu ji dora xalan
Ji dil em dayine ber çingalan
Xencer û şîr û rimên qettalan
Nezerê wer bide sahibhalan
Ku çi êsîr in di dest 'heyyalan
Lew elîf têñ me di herfêñ falan
Ku li şeklê reqemê sersalan
Tu yî murada me ji 'er'ebalan
Zimzim û deng û zimihna lalan
Cezbe da me bi hezar e'hwalan
Lew dinalin ji neseq 'ebdalân
Ku bi mestî didirin yek palan
'Enberînxemrî û sosinalan
Suhr û zer şitîrî û çîçekalan
Misriyêñ wan dil ji me kir kalan
Te ji qews û qeze'hêñ xilxalan
Ku bûyin daîre şubhet halan
Xemriyêñ xemzede nisbet dalan
Ku çevandîne ji reng kopalan
Misriyan wer bide ber sîqalan
Zuhrerengê we şefeqmuşteriyê
Dînberê horîmîsalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

Sunbulan taze musenna nekirê
Turreya şeng-î muterra nekirê
Xemriyan şîfite tuxra nekirê
'Er'erê xare û dîba nekirê
Dil û dîn xaret û yexma nekirê
Serê sewdazede sewda nekirê
Guhriyê nirgisî şehla nekirê
Kuştîyê xencerî birra nekirê
Sa'etê vê seetê ranekirê
Me ji qeyda xwe tesella nekirê
Lê xeramê li me mestane kirê
Ji me dil Ke'be û putxane kirê
De'weyî dilberiyê dane kirê
Celweyek mîrî û şahane kirê
Pêşî şem'a xwe me perwane kirê
Dilê xemdîdeyê ma şanekirê
Li me bêperde tecella nekirê
Wehe carek me tewêlla nekirê
Xencekê qenc-î li Mella nekirê
Cegerê rişî mudawa nekirê
Bikujê aşiq û perwa nekirê
Li şehîdê xwe temaşa nekirê
Ma we dilber dikirin dilberiyê
Dînberê horîmîsalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

Herdu qewsên te ji qudret ne ji Yeng
Jê bi mîzan bireşînin me xedeng
Biderin sîne bi ser pence peleng
Rûmî puşt dit Ecemî bête Fireng
Lê ne wek waqî'eya Gêwo w Peşeng
Hilbîtin qenc ji nîv ateşê ceng
Têr suwaşê Hebeş û Nobî û Zeng
Tu dizanî çi neheng in çi neheng
Veke le'lan tu ji ser şekkerê teng
Ku j'murada te bûyin pêt û pereng
Mestê cewra te me bê bade û beng
Bête cana, li me alem bûye teng
Ji cefaya te nema qet li me reng
Tu dizanî çi dibêjît ney û çeng
Ji çi peyweste dinalin seradeng
Me dixwunin qed û bejna te yî şeng
Nêrgizên mestî bi naz û neyireng
Lê tu tuba we ez ê xesteyê leng
Çi bikim feyde ku êvar e dereng
Mutriban da nekevin çengê ji çeng
Da nedit perdeyê ayîneyê zeng
Ku ji çenga me binalit xerçeng
Wek Melayî bi hezar reng û aheng
Bi fîxan bêt û ji bêr sed ferseng
Çi xeberdim ji dilê te y wekî seng
Dikujî aşiqê miskîn bi tefeng
Nekirî terkî tu vê kafiriyyê
Dînberê horîmîsalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

Bi qedê nêrgiza Buhtan î
Nazikek şeng û şubê reyhan î
Çi xet işkestê şîrîn reyhanî
Ku te pê nesxî kirî dîwanî
Ellah Ellah ji ci reng însan î
Yûsufê lebşekerê 'Ebranî
Bes e ger wek te bidêrit sanî
Horiyên rûhîsîfet rûhanî
Wek te ser ta bi qedem nûranî
Wek te haşa hebitin şîranî
E'hseinellah ji sira subhanî
Ku cemalek weh munezzeh anî
Di mîsalek beşerî da danî
Me bi îlhamî İlähî zanî
Bi nîşanî qudret bê nîşan î
Çi nîşan, zulmeti nûrefşan î
Li cemala semedî burhan î
Tu li derheq me çira erzan î
Ku sehergeh bimeşî seyranî
Te Melayê xwe qe carek nanî
Bi serefrazî yû 'alîşanî
Secde bit ber qedema sultani
Ne tinê rûh î tu rûh û can î
Zînetâ husn û sura xûban î
Taciferqê serê me'hbûban î
Tu bi şîranî yû lebşekkeriyê
Dînberê horîmîsalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

- 'alîşan:** qedirbilind, payebilind.
'er'er: dara hêvrîstê, ji bo bejna spehî û narîn tê gotin.
'er'erbâl: bejnhêvrîst, bejna ku weke dara hêvrîstê ye.
'heyyal: hîlebaz, hîlekar, fetbaz.
'hurman: jê dûrmayî, mehrûmî, bêbeşî, bêparî.
'Îswe: naz, cilwe.
aheng: naxme, nikla stranê, awa û qaîdeyê gotina stranan, terane.
ates: agir.
aşufte: fettan, dilrevîn, xortxapên.
Ayetullah: nîşanêن Xwedê.
ayîneyê: neynika.
bade: araq, mey.
badenoş: araqvexwir, şerabvexwir.
bal: bejin
bend: qeyd û lele, girêdan
beng: haşhaşa bejî, heşîşa bejî, babûng, babûne.
berî: sîng, bersîng.
beşerî: mirovî, mirovanî
bêsamân: bêserwet, nedewletî
bide ber sîqalan: sîqal bike, cîla bike, paqîj bike, zengê jê bibe.
biderin: diçin, diherin, derdikevin.
bidêrit: biggerîne, bike.
bi Mesîha sîfet: bi rengê Îsa, weke Îsa
bi mîzan: li pey hev, rasterast.
birra: xweşbirr, tûj.
burhan: delîl.
buryan: parêv, goştê biraştî.
bûse: ramûsan, maç.
cefa: êş, eziyet.
celwe: naz, cilwe.
cemal: rîndî, spehîtî.
cer'ekêş: yê ku di vexwarina qul-pêñ/qurtêñ avê de zorê dikşîne.
çevandin: tewandin, xwarkirin.
cezme: nişana rawestinê "o"di zi-manê Erebî de; mebest jê, çav û dev in.
çîçekal: kulîlik sor.
dal: herfa "d" ya Erebî.
dane: zana.
da'we: doz.
dêmdur: rûdur, rûmirarî.
dêmgul: rûgul.
didirin yek palan: pal didin ser hevdu.
dilaşufte: dilkêş, dilberxwekêş.
dîruba: dilkêş, dilberkêş, cazîbekar.
dîba: cilê hevrîşimkirî.
dîwanî: xetên dîwanî, destnivîsa dîwanî.
dur: mirarî, dur.
durdane: weke libêñ duran.
ebdal: evdal, derwêş, rêzeke welîtiyê ye.
e'hşenellah: Xwedê ew ci delal dê-raye.
elîf: herfa pêşî ji alfabeşa Erebî.
enberîn: bi enber, bîhnxweşiyek e.
eswedhecer: kevirê reş; mebest jê, şanikêñ rû yên reş in.
falan: hêvî, oxir, siûd, hêviya hogiriyê.
ferq: nîv, nîvê serî, rastik.
ferseng: fersex (fersexek bi qandî 12, 4 km ye.)
Gêwo û Peşeng: navêñ du serdarêñ çîrokêñ ïranî ne.
girih: girêk, xelek.
hal: ew helqeya (hawîra:daîreya) dora hevv û rojê ye.
heyran: heyirî, şaşmayî.
hîcran: bi tenêmayî, terkîser.
horîmîsal: renghorî, weke horiyan.
îqlîm: li vir welat.
i'râb: zêr û ziber, ser û ber; mebest jê, şanikêñ rû ne.
Îrem: xazbaxçeyê yan jî bihuşa Şeddad e ku behsa wê di Quranê de tê kirin.

- Ke'be:** Kabeya Mekkê.
- kewkeb:** stêr, stêra geroke.
- la'l:** lêvên sor weke lal.
- lebxunçe:** lêvxunçe, lêvbijkoj, lêvên ku mîna bişkojên dara nûbişkuví, piçük in.
- leng:** kulek, qop.
- Lîllahî el-'hemd:** pesn û spasî ji Xwedê re.
- ma:** me.
- Mesîh:** Îsa.
- mîhrîdar:** evîndar, dildar.
- mîsal:** nimûne, nimûç.
- misrî:** şûrêni Misrê mebest jê çav-niqên in
- mişkîn:** miskdayî, bi misk, misk-kirî.
- mudawa:** derman, tedawî.
- munezzeh:** berî, ji xerabiyân bêrî, bêguneh, paristî, pak î paqij.
- musenna:** honayî, tewandî, dualî, du heb, dugulikirî, dulibkirî.
- muşterî:** stêra gerok ya bercîs e.
- muterra:** badayî, lefandî.
- nafe:** derdana miskê, qutiya miskê.
- neheng:** hespê bêhrî, tîmsah.
- nekirê:** li xwe nekirê.
- neseq:** weke, bi cayê, bi awayê.
- nesxkirî:** nivîsî, nivîsandî.
- neyireng:** sérbaz, sihirbaz.
- neyşeker:** qamîsê şekir.
- ney û çeng:** du alavêni muzîkê ne
- nezer:** nihêrtin, lénêrîn.
- nisbet:** li vir mîna, weke.
- nûrefşan:** nûrrêj, nûrreşîn, nûr-weşîn.
- peleng:** piling.
- pereng:** tirafa êgir, xiroma êgir.
- peyweste:** hertim, li pey hev.
- pêt:** pêtêni êgir, germ û şewata alava êgir.
- pijmurde:** lewaz î sewsî/gêj.
- qed:** bejin.
- qedem:** nig, ling, pê.
- qettal:** mîrkuj, kujek, kujdar.
- qews:** kevan; mebest jê, birû ne.
- qews û qezeh:** keskesor, kesk û sor û zer.
- qeyd:** qeyd û bend, girê.
- reyhanî:** yanî xetêni reyhanî ku cureyekî din yê destnivîsê ye.
- rûhîsîfet:** bi rengê rûh, weke rûh delal û narîn.
- saet:** qiyamet.
- sahibhal:** xwedîhal yanî evîndar.
- Samîrî sihrîsîfet şêwe:** sihra bi rengê ya Samiriyê cihû ku made-nî kire golikeke bideng.
- sanî:** duyemîn, ya diduyan.
- sayeperwerde:** perwerdekarêni ku ji siyê naçin ber tavê.
- Semed:** xesyetnavê Xwedê ye yanî ne muhtacê kesî ye.
- semen:** kulîlkên yasemînê, çîce-kên yasemînê.
- seng:** kevir, ber.
- sera deng:** dengê stranbêj.
- sergerdan:** şâşmayî, heyirîmayî.
- sermal:** sermil e lê "a"ya wê ji bo lihevanîna qafiyeyê ye, serpûş.
- serwîqed:** bejna wê weke ya dara serwiyê ye.
- sewda:** sergêjî, serîlihevxitin, le-wazê ji tihna, xelelî.
- sewdazede:** sewsiyê ji ber evînê, yê ku xeyalan li serî daye, xeleldayî.
- sîne:** sîng.
- sosinalan:** sosinêni ku rengêni wan tevîhev in, sosinêni rengtêkel.
- sub'hanî:** ya xwedayî î paristî.
- suhr û zer-sitri:** serkezîkên sor û zer.
- sur:** delalî, cazibiyet, dilkêşî.
- surperî:** şanperî, cazîbeya wê weke ya periyê ye.

- suwaş:** ceng, şer.
- suxen:** gotin, xeberdan, hevok (cumle).
- şeb:** şev.
- şebçirax:** ciraya şevê.
- şefeq:** rohnî.
- şehla:** çavmêşinî .
- şekkerê teng:** mebest jê, devê piçük î şekirîn e.
- şem':** şewq, rohnî.
- şeng:** narîn, delal, lihevhatî.
- şerîfnusxe:** nimûneyên pîroz, nusxeyên pîroz, nimûçen pîroz.
- şewq û şefeq zuhre:** rohnî û tîrêjên wê mîna ne yên stêra gelawêj.
- şîfite/şifte:** dîn, belawela, belabûyî, lihevketî.
- şubê:** weke, mîna.
- şubhet:** weke, mîna, fena.
- tecella:** derketin, diyarbûn, xuyakirin.
- tefeng:** tifing.
- terwende:** nûgihiştî, nûgihayî.
- tesella:** berdan, terkkirin..
- teşneleb:** lêvtî, lêvtîhn, lêvziwayê ji ber tîna evînê.
- tewella:** pêverabûn, pêrabûn, bi karê yekî ve rabûn.
- textebend:** benda (perdeya) ji text ku ji bo nexşandinê li ber derî, dîwar û odehyan tê danîn.
- Tûba:** dara Tûbayê.
- tu'hfe:** tiştên giranbiha ji bo diyarîyan.
- turreya şeng:** tuncika nazik, kakkula narîn.
- tuxra:** mor/muhra şahîtiyê; mebest jê, bisk û zulf in.
- walan:** bilind, bala, berz.
- waqî'e:** buyer, ceng.
- weh:** weha, wisa.
- xaqan:** şahê Tirkan.
- xare:** caw û qumaşê leylandayî
- xaret:** talan.
- xasse:** tayebetî, xas î spehî.
- xedeng:** tîr mebest jê çavniqên û çavşikên in.
- xemdîde:** xemgîn, xemkêş.
- xemrî:** gulangên sor, xumrî, sorê xumrî.
- xemze:** niqêna çav û biruyan.
- xenc:** naz, nazî, delalî.
- xeram:** kubar, nazik.
- xerçeng:** burca kêvjale.
- xeste:** nexweş, nesax.
- xet işkeste:** cureyekî destnivîsa Erebî ye ku tîpêñ wan tewandîne.
- xûb:** spehî, delalî.
- Yeng:** navê wenatekî ye.
- yexma:** tajan, talan, axme.
- zimihî:** gurrîn, xurrîn, zimîn.
- zimzim:** zimezim.
- zînet:** xemil, delalî, xişir.
- zuhre:** stêra gerok ya gelawêj e.
- zulmet:** tarîti.

2. Dîsa got şanê wî pîroz be

Dîsa li bedrê Katibî
Kêşa ji nû jengarî xet
Nûr e reşandî Wahîbî
Der girdîşî pergarî xet

Herfên ji qudret nuqte pur
Madarê hewŞa le'l û dur
Ev rengî kê dî weh bi sur
Qudret nimûn zengarî xet

Ew çîçekên şetrî şibiht
Ef'asîfet qelbê me miht
Selwa ji balayî we riht
Ev perdeya gulnarî xet

Neqş û nîgarên dilberan
Dercêñ ji remzêñ esmeran
Her têñ ji dest neysekeran
Me j' gulşeni ferxarî xet

Me j' destxeta terhêñ şelal
Xal û xetêñ nûra zelal
Danî di sendoqan li bal
Malê me sed qentarî xet

Bergêñ gula reyhaniyê
Katib nimûçek daniyê
Kes dî bi vê şîraniyê
Der sen'etê Cebbarî xet

Reyhan û sunbul tê hene
Sed çîçek û gul tê hene
Zerbav û bulbul tê hene
Ew bexçeya gulzarî xet

Gulçîçek û neqşen xerîb
Nesrîn û reyhanê ecîb
Lê rast û çep bûyin selîb
Cedwelkeşen zunnarî xet

Îro seher tuxra nîşan
Î'rab û herfên zerfişan
Hatin digel bayê siban
Me j' canibê dildarî xet

Îro berata Ehmedî
Tuxranîşan zerkeş me dî
Xettê humayûn kê we dî
Şîrîn û ma'nadarî xet

Ellah di ber "qal û belê"
Da yexme kit qelbê Melê
Avêhte çerxi cedwelê
Ev reng e enberbarî xet

- bala:** jor, bilind, bejn..
- bedr:** heyv, heyva çardeşevî.
- berat:** kaxizê berîbûnê, belgeya bêrîtiyê, nameya bexşînê, xelat.
- berg:** pel.
- derc:** tiştên ku tê de tê nivîsîn, tomar, ketina nav.
- destxet:** nameya ku bi dest tê nivîsîn, ji tiştên bi destçekirî re jî tê gotin.
- dildar:** evîndar, dilketî.
- durc:** qutiya mirariyan, qutîka duran.
- ef'asifet:** rengmar, mîna mar.
- enberbarî:** enberreşîn, enberbarîn.
- ferxar:** delal î xemilandî, pûtxane, dêr.
- girdiş:** ger û dewran.
- gulnarî:** weke gula hinarê.
- gulşen:** baxçetê gulan.
- hewd:** hewz, birk.
- humayûn:** şahanî, bextewarî.
- jengar:** zeng, zengar.
- madar:** hawîrdor, dormedar.
- nimûç:** nimûne, mestere, nimûneyekî piçûk.
- nimûn:** eşekere, diyarkirin, diyarkir, nîşander, diyarkir.
- pergar:** alavê ku pê daire tê çeki-rin, amûretê ku dorxêz pê tê kişandin, pergel.
- qal û belê:** Wan got erê, ev bersiva ruhan e ku dema Xwedê ew afirandine ji wan pirsiye: "Ma ez ne Xwedayê we me?"; hingê yê ku ruhê wî ev bersiv daye û gotiye: "Belê tu Xwedayê me yî" ew ketiye yan jî wê dawiyê bê ser riya rast û yê ku gotiye: "Na tu Xwedayê me nîn î" jî ketiye yan jî dê têkeve ser riya çewt.
- qentar:** qenter, qapana pir mezin.
- quđretnimûn:** hêzdiyar, birîdiyar, hêzdiyarkirî.
- remz:** nîşan, işaret.
- selîb:** ceprast, mîna xaç.
- sen'et:** destkir.
- şelal:** şaxên rast î bilind, şaxîn.
- şetrî:** serkezik, sergulik serê keziyan.
- şibiht:** mîna, weke.
- Wahîb:** Xwedê, yê ku hibe dike, yê ku dibexşîne, bexşende.
- zerbav:** cila ku bi qamîşê zer hattiye xemilandin, navê civîkeke rengzer e jî.
- zerfişan:** zêrreşîn.
- zerkeş:** zerkirî, zerkêşayî.
- zunnar:** pişta xaçparêzan, kembereke ku ji bo cudabûna ji musilmanan wan ji mecbûrî ew dida pişta xwe.
-
- * Ev herdu helbestên Melayê Ci-zîrî digel beşike mezin ji ferhengoka binê wan, ji raveya (şerha) Dîwanê ya bi navê "el-'Iqd el-Cewherî fî Şer'hi Dîwani el-Şeyx el-Cezerî" ku li ser navê miftiyê Qamişli Ehmedê kurê Mele Mihemedê Zivingî ye, hatine girtin.

Emîn Narozi

Mehmed Uzun

Hawara Dîcleyê

Sonus est, qui vivit in illa...

Dengek, tiştê ku li pey maye, aha ev e, dengek...



Rêza yekemîn a vê romanê 28ê Adara 1985an, li Sûriyê, bajarê biçûk û şérîn ê Derya Spî, Baniyasê hate nivîsîn. Ez li mala neviyên Mîr Bedîrzan, Celadet Alî Bedirzan û xanîma wî (herweha dotmma wî) Rûşen Xanimê bûm. C.A. Bedirzan, ji mêj ve, 1951, wefat kiribû. Lê li her aliyê malê şopêñ wî yên jîndar dixuyan. Rûşen Xanim ku hingî umrê wê nêzî heyştêyî bû, li malê, bi xatire, bîr û siya Bedirxaniyan dijiya. Ez li wir bûm, - ji ber ku min dil hebû jiyana Mîr Bedirzan bîqulibînim ser romanê. Ma ji bo vê yekê, ji wê mala kevnare ku di nav pêlêñ tarîxa do de bû, çêtir cîh hebû?

Belê, rêza yekemîn a vê romanê li wir hate nivisîn, ji devê Mîr Bedirzan, bi nefesa wî. Lê ji navberê wext bihurî, dewr û dewran derbas bûn. Min sê romanêñ din nivisîn, -ku ji wan Bîra Qederê bi deng û nefesa neviyê Mîr Bedirzan, C.A. Bedirzan, hate hûnandin.

Havîna 1994an, roja 17ê tebaxê, pismamê min Yilmaz Uzun li dorâ çiyayê Cûdî hate kuştin. Yilmaz, yek ji şerwanêñ bijarte yên tevgera serîhildana kurdî bû. Ew bi qasî yanzdeh salêñ ku her rojeke wan bi lêdan, heqaret, şikence, birçîtî û kirêtiyê tijî bû, li girtigehêñ eskerî yên Turkiyê ma, piştî ku ew ji girtîgehan derket, wî xwe spart çiyayêñ devera Botan û tevî hevalêñ xwe, tevî serîhildana çekdar bû. Ü ew li wir, nêzî çemê Dîcleyê, li serê çiyan hate kuştin.

Dotira rojê, nîvê şevê min xebera mirina wî bihîst. Ez ji tecrube-yên xwe dizanim, telefonên ku nîvê şevê têن, ne telefonên xêrê ne. Nîvê şevê telefon lê ket, dostê ku ji Turkiyê telefon dikir, xebera nexweş bi min gîhand, "Yilmaz hatiye kuştin... pêşî leşker wî digirin û paşê bi şikence bedena wî lîme lîme dikin, guh, bîvil, dest, mil, pî, ling, hemû bedena wî jê dikin, heta ku ew dimire..."

Wê şevê, heta sibê ez li oda xwe ya xebatê rûniştim û li Yilmaz fi-kirîm. Li zarokatî û xortaniya wî, li dê û bavê wî ku umrê xwe li ber deriyên zîndanan derbas kirin, li kekê wî ku Yilmaz hê zarok bû ha-te kuştin, li herdu birayên wî yê din ku pê re li zîndanan bûn û xwe-hêñ wî ku li welatê xerîbiyê bûn, li têkoşîna wî ku hema ci bigire her roja wê bi xwîn, xwîdan, jan û keserê tijî bû, li mala wan a fireh, li rûyê wî yê ronî, bejn û bala wî ya dirêj, meş û gotinêñ wî yê qehîm... Li qedera wî ku kêm-zêde, ji mêj ve ye, qedereke giştî ya navçê ye. Li şerê welatê kurdan ku kêm-zêde, ji sed û pêncî salan û vir ve ye, bi xwîn, dubare dibe û dewam dike.

Li ber destê sibê, gava çirûskêñ dawîn ên stêrên şeva ronî jî çûn ava, min li ser kaxizekê navekî nivisî: Biro.

Biro, navekî bi du manan e, du kahniyêñ wî hene. Kahniya yeke-mîn Hezretî İbrahim e ku bi sebr û hêza xwe ya liberxwedanê nas e. Biro, kurtebiriya vî navê pîroz e. Kahniya duwemîn jî bira ye, yan jî birader.

Ew gotina ku min wê şevê nivisî, Biro, hêdî hêdî, bi wextê, qulipî ser dengekî. Dengekî ku nîvê şevan bi hêdîka dihat û li ber guhê min, mîna pejneke sivik a bayekî sivik, bang li min dikir; "li min guhdarî bike, guh bide min... li dengê dengbêjan, li dengê Dîcleyê, li dengê hez û evînê, şer û pevçûnê, kîn û nefretê, îxanet û hesûdiyê, hêvî û têkoşînê, afirîn û hunerê guhdarî bike..." Bi vî terhî deng jî, bi wextê, bû şexsiyetek. Navê ku min nivisîbû, dengê ku bîr û heşê min vedi-girt, bû şexis, şexsiyet, huwyet û leheng. Lehengê romana Hawara Dîcleyê... -tevî Mîr Bedirxan û lehengên din. Gotina wê şevê û dengê şevêñ din bûn rêz. Rêz bûn rûpel, rûpel jî defter. Romana ku min dil hebû binivîsanda û gotina wê ya yekemîn li Baniyasê hatibû nivisîn, kete ser riyekê din. Min ew pêncî- şest rûpelên ku nivisîbûn danîn ali-yekî û rê da Biro, da ku ew gotina xwe bibêje, rê li ber xwe veke.

Carina şexs, leheng, bûyer an jî pêwendiyêñ romanekê zora nivîskarê/a romanê dibin, xwestekêñ nivîskar diguherînîn û bi xwe rê li ber xwe rast dikin û romana xwe dihûnin. Di romana Hawara Dîcleyê de jî weha bû. Dengê ku hûn ê di vê romanê de bibihîsin, dengê Biro ye, gotina ku hûn ê bixwînin, dîsan, gotina wî ye.

Biro kî ye? Dengê Yilmaz ku di nav dewr û dewranan de, mîna bayê hûnik ê berbangan digere û do bi îro, îro bi do digihîne? Dengê yek ji bapîrên Yilmaz ku di nav şerên xwîndar ên eşîran û osmaniyan de jiyaye? (Navê bapîrekî Yilmaz, ji çar bavan, Biro bû, Biroyê Dirêj.) Dengbêjekî ji dema Mîr Bedirxan ku wê dema tijî xwîn, xwîdan, keser û jan vedibêje? Dengekî ku ketiye dewsa Mîr Bedirxan? Dengê qederekê ku ji du sed salan û vir ve hertim dubare dibe?

Biryar, ya we ye. Lê belê Hawara Dîcleyê bi dengê Biro ve hatiye pê. Herçî tiştê ku min lê zêde kirîye, du tişt in; hin jêrenotên biçük û serenavên beşan. Hin agahiyênu ku dengbêj û vebêj jê hez nakin, mi-xabin, pêwist bûn. Min ew li dengê Biro zêde kirine. Û min şevbihurkên Biro yên balkêş, hinekî ji hevûdu veqetandin, serrast kirin û ji bo her şevbuhêrkekê serenavek û hin jimare danîn, -da ku dengê Biro zelaltır û rasterastir bigihije we.

Fermo, li dengê Biro guhdarî bikin...

M.U.

QENDİL

Gotina ku hûn ê niha lê guhdarî bikin, gotina jibîrbûyiyan e.

Dengê ku hûn ê bibihîsin, dengê însanekî jibîrbûyî ye ku di wextê xwe de dengê însanên jibîrbûyî bû.

We xwest, ez ê jî bibêjim. Qendilê pêxin û li dengê jibîrbûyiyan guhdarî bikin.

Ji bîr mekin; ji-bîr-bû-yî...

Berî ku hûn bipirsin, ez ji we re bibêjim ka jibîrbûyî kî ne.

Jibîrbûyî, ez im; Biro, Biroyê Dengbêj, yan jî em bibêjin, Biroyê Yêzidî, yan jî Biroyê Kor, yan jî Biroyê Dirêj.

Jibîrbûyî, Ester e; Estera ku min jê re digot, Stêr, an jî Estera file, nastûrî, yan jî Stêra ezîza ber dilê min, roniya çavê min, Ester, sêwiya zarşêrîn, bal û endam xweşik...

Jibîrbûyî, Mîr e, Mîrê Cizîra Botan, serekê Ezîzan, an jî Mîrê se-rîhildana kurdî, yan jî Mîrê nefikirî, yan jî Bavê Têllî, Têlliyyê kor ku hevalê min e.

Jibîrbûyî, Stephan Manolgiyan e, ku min jê re digot mam Safo, aqilmendê Mîr, alîmê ermen ê xwediyyê kitabxana yekta, bavê Migirdîç ku hevalê min bû û min jê re digot Migo, bavê Meryema bextres ku -heye- ez bûm sebeba mirina wê.

Jibîrbûyî, Apê Xelef e, şivanê yekta yê hemû Cizîra Botan, bilûrvan û dengbêjê zarotiya min, terbiyedarê dilê min, bavê Heme ku hevalê min bû, ku navê xwe kiribû Malmîran û me, min û hevalên din jî Malmîrana wî kiribû, Malwêran.

Jibîrbûyî, yêzidî ne, ku bav û kalên min in, ku hertim li serê çiya û newalên kûr ên welatê yêzidiyan têñ kuştin, hertim ferman û talana wan radibe, ku ji tırsan, nikarin, danê sibê û danê êvarê, rûyê xwe ber bi tava rojê bikin û dua û ayetê xwe, bi deng, bixwînin.

Jibîrbûyî, suryan, keldan û nastûrî ne, ku bav û kalên Stêrê bûn, ku nikarin li welatê xwe yê bav û kalan, rehet, aza û serbest li tîrêjîn berbangan ku li milê rojhelatê Dîcleyê hiltê binihêrin, li esmanêñ çikî ronî yên şevêñ Mezoptamyayê temaşe bikin.

Jibîrbûyî, ehlê Cizîra Botan, însanêñ Hekaran, xelkê Mikis, Wan û Serhedanan in ku li dijî hevûdu, li dijî eşîrên cîran, eqeliyetêñ pis-mam, li dijî dewleta Osman û dewleta Farisan, li dijî hemû dinyayê ñer dikin, heyata wan bi ñerê dest pê dike û bi ñerê kuta ñibe û her-tim têñ xapandin, qirkirin û koçkirin.

Jibîrbûyî, mal û malbata Mîr, law û keçen wî, bira û birarzî, xal û xwarziyêñ Bedirxaniyan in ku nîrê Osmaniyan û zîziya welatê xe-rîbiyê bûye qedera wan.

Jibîrbûyî, birarziyê Mîr Yêzdîn Şêr e ku şopa umrê me da ser riye-ke kirêt; mîrê Hekaran Nûrilah Beg û ehlê wî, mîrê Mikisê Xan Meh-mûd û ehlê wî ne, ku tevî me ketin ber pêla welatê xerîbiyê û li wan deran ji bîr bûn.

Jibîrbûyî ev û kesêñ din in ku ez ê ji we re, ji pêketina qendîlan he-ta temirîna qendîlan, carina kite bi kite, carina di ser re, qala hal û hewal, coş û hêvî, jan û keserêñ wan bikim.

Berî ku hûn bipirsin, ez ji we re bibêjim ka ev însan çîma jibîrbûyî ne.

Ev însan jibîrbûyî ne, ji ber ku bindest in, biserneketine û têk çû-ne. Bindestî, malwêranî ye, zimanê însanê bindest qifilkirî, destê wî zincirkirî ye, ne dikare bibêje, ne jî binivîse. Bisereketin, mîna birî-na min, birîneke xedar e, ku hêdî hêdî birîndar dikuje. Gotina însa-nê biserneketi, hêdî hêdî, winda dibe, heyata wî, dewr û dewrana wî dikeve ber pêlîn wextê û dibe hîç û pûç. Ne gotineke însanê biser-neketî dimîne, ne jî tarîxeke wî. Têkçûn, jixwe ji nav diyar e, mirin e. Dengê însanê mirî nayê bihîstin, nefesa wî nayê hîskirin.

Ez, yek ji van însanan im, însanekî ji însanêñ bindest, biserneketi û têkçûyî.

Ji lewre, gotina min, gotina wan; dengê min, dengê wan e.

Ez, Biroyê dengbêj im, ez ê heyeta wan, jan û kesera wan, hêvî û xwesteka wan ku di nav dengê wan ê windabûyî de veşartî ye, ji we re, bibêjim.

Umrê min ê ku niha êdî bi gavên lez ber bi qonaxa dawîn dere, eger ez ne şaş bim, kêm zêde, li dora pênceyî ye. Di vî umrê kin -heye ku dirêj- ê teres de, min gelek tiştên xweş-nexweş, rind-kirêt dîtin, pêrgî gelek tiştên ecêb ku min hîç texmîn nedikirin, bûm. Mîna vî çemê Dîcleyê, min jî şahîdî li best, daxwaz, hêvî, dilşikestin, jan û ke-serê kir. Mîna pelekî tenik ê rihanê ku ketibe ber pêlên Dîcleyê, ji Ci-zîrê heta Stenbolê, ji Stenbolê heta Girîtê, ji wir jî heta Şamê ez geriyam, min dît û bihîst. Li Diyarbekir, Beyrûd, Şam, Heleb, Ninova, Mûsil, Baxda, Tebriz û Tehranê min ziyaretgeh, meyxane, dersxane, qesr, saray, zîndan, cami, dêr, hevra dîtin, gotinêن xerîb, bi zimanêن xerîb, li gotina xwe ya kurdî zêde kirin. Min li dengêن bêhejmar guh-darî kirin, li rûyêن bêhejmar nihêrîn, his û pejnêن bêhejmar nasîn. Ez bûm şagirtê wext, tevger, însan û bûyeran. Ez bûm xwedîyê ders û tecrubeyên bêhempa, -ku niha êdî bi kêrî tu tiştî nayêن.

Lê belê tevî van ders û tecrubeyên heyata min a bêkêr, min, tu ca-ri, du tişt fahm nekirin; Çima bindestiya vê Mezopotamya kambax evçend kûr, dûr û hûr e? Çima însanêن Mezopotamyayê hertim bi şî-kestên xedar hildiweşin? Çima bindestî weha bêdawin e?.. Ü li milê din, ez tu carî tênegihîstim çima ev deverên kevnare yên miqedes ev-çend bi kîn û nefretê dagirtî ne? Çima însanêن der û dorêن Firat û Dîcleyê, tevî ku ew bindest in, evçend li dijî hev in, evçend gora hev vedidin?

Bêguman ez dizanim, însanê bindest mîna pizota êgir e, zirara wî, berî her kesî û her tiştî, jê re ye. Însanekî weha mîna dûpişka bêkeys-keşî ye, ji bêgaviyê, bi der û dora xwe, eger li der û dorê kes nîn be, bi xwe vedide, derzî û jahra dûpişk a parastinê dibe mirina wê. Ez di-zanim, qurban, bêgav e û însanê bêgav dikare her tiştî bike, dikare, heke fersendê bibîne, ji nişkekê ve bibe celad. Helbet ez bi vê dizanim, di nav her mileti de, li her navçeyî bêgav, bindest, qurban û dû-pişkên bêçare hene. Lê we li kû derê dînyayê dîtiye ku navçeyeke se-ranser, însanê hemû navçê, têr û birçî, xweş û nexweş, desthilat û jar, mîr û kizîr, gundî û bajarî, hemû bi hev re, bindest in, bûne dû-pişkên jahrîn û bêrawest bi hev vedidin? Em bibêjin, li derekî dinya-yê rewş, demeke kurt an dirêj, weha nexweş e. Lê we li kû dîtiye ku ev rewşa hanê her û her dewam dike, dubare dibe û dewsa ku bigu-here, herkesî diguherîne û dike esîreki pêncperan ê vê qederê?

Hûn hatine ku li min guhdarî bikin, ez dizanim, lê niha bersîva
pirsa min bidin; we misûbetekê weha li kû dîtiye?..

Li dora xwe binihêrin, ji her derî xwîn dilop dike. Ax dinale, av
diqîre, ba dinihwirîne. Çima? Ji min re bibêjin çîma ev axa bimbarek
ku bi ava Firat û Dîcleyê dihate avdan, niha di nav bêdengiya zîz a
şînê de, bi xwînê tê avdan? Hema çi bigire, di hemû gavêk kulek û
xeşîm ên umrê min ê teres de, ez li van herdu pirsan fikirîm; bindes-
tî û kîn û nefreta bêhempa ya navçê. Gava ez li Cizîrê, hê li Medre-
sa Sor şagirkê nezan ê zanîn û îlmê
bûm, hê hingî li milekî çavê min li ser
rêzên tevîhev ên rûpelên kitabêz
zehmet ku li ber min bûn, devê min bi rê-
zên dijwar ên jiberbûyî tijî, min pise-
pis dikir, li milekî din jî heşê min li
derekî din, li bersîva kahniya kîn û
nefretê bû. Ev kahniya malmîrat li kû
bû? Heye ku haya we jê hebe, di nav
gotinê stranê min de ku min hê di
xortiya xwe de li bilindahiyên çiyayê
Cûdiyê, di berbangê sibehan û hin-
gûrên êvaran de, rûyê min ber bi tava
ku hildihat, an jî diçû ava, digotin,
hin rêz hebûn ku her dubare dibûn,
kahni, tu li kû yî? Kahnî tu li kû yî?
Di nav wî şer, pevçûn, qetliyam û go-
la xwînê de ku ji nişkekê ve bi ser me
de hat, min hertim gotinek dibare di-
kir, çîma, çîma? Li ser riya dirêj û ke-



sertijî ya sîrgûnê, li ser pêlêن har ên Derya Reş ku em di nav keştiye-
ke osmanîyan de mîna hêlekanekê, bi lêdana pêlan, geh bi vir de, geh
bi wir de diçûn, min ji yara xwe ya birîndar dipirsî, Stêra min, li stê-
ran binihêre... ma ev stêr bi halê me nizanîn, ma çîma ew nayêñ ali-
yê me û birînê me derman nakin? Çîma ew bersîva vê zilmê, vê ne-
zaniyê, vê kîn û nefretê nadîn? Ez li Girîtê, di danê êvaran de, li ser
bircêن keleha Xaniyayê rûdiniştîm, nêrîna min li ser ava şîn a Derya
Spî ku mîna cawekî hewreşîmî bi rengê şîn, kesk û sor leyлан dida,
destê min li ber guhê min ku hertim li ser dengan bû, min dengê stra-
na xwe bi dengê pêlêن Derya Spî digîhand û jê dipirsî, deryayê, ezbe-
niyê ... çîma, çîma? Herçî Şam, qonaxa dawîn a koçberiya me bû, ez
li oda biçûk û germ a Mîr ku bi mehfûr û kulavêr rengereng raxistî-
bû, li kêleka Mîrê min ê şikestî û gelekî westiyayî rûdiniştîm û gava
ku Mîr, di destan de tizbiya sedeffî ya nod û neh libî, dest bi xwendî-

na Qurana kerîm dikir, min jî gotinê stranê nû ku hêdî hêdî dike-milîn û li hev dihatin, bêdeng, dubare dikirin, Mîrê mino... em li kû, kahnî li kû?

Kahnî; kahniya jiyana însên, zayin; kahniya evîn û evîndariyê, zelaliya zaroktiyê, westa kalbûnê, kêt û henekê, best û coşê, şeng û şongê, xebat û lebatê, şer û pevcûnê, kîn û nefretê û mirin û kuştinê... Kahnî, kahniya windabûna jiyana însên, mirin... Heyata min, ji kahniyekê ber bi kahniyeke din.

Lê belê kahniya bindestî, kîn û nefretê... Ev ji kû dertê? Ji kûrahiyên şevê ku bi perda xwe ya reş dinyayê vedigire û dixe nav xeweke xeşîm a kûr? Ji kûrahiyên vê axa reş a bibereket ku ji hezaran salan û vir ve ye, hemû Mezopotamyayê têr dike? Ji kûrahiyên ba û bâhozên qedîm ku li gopikên çiyayên Cûdî, Herekol, Bagok û Hekaran, bi fizîn, bi xeşmet, xwe li ba dike? Ji kûrahiyên xewnên şevêne reş ên bêpayan bêdeng ku hema ci bigire hîç wextekê nayêne zimêne? Ji kûrahiyên xwîna sor ku di rehêne însanêne bêgav de, hertim bi coş, bi kel, bi rik û bi kerb diherike? Ji kûrahiyên dilê wan ku bi hesret, hêvî, best, êş, xizîn, şerm û bi daxwaza tolê hildavê?

Li dinyayê ji herkesî bêtir diviya me, însanêne Mezopotamyayê, eh-lê Dîcleyê bizanibûya ka ev kahniya ku mîna kabûsekê, mîna şürekî li ser stûyê me hilawestî ye, ci ye û li kû ye. Lê ez ji tecrubeyên keft û leftêne jiyana xwe ya fetloke dizanim; em bi hîç tiştekî nizanîn, ne kahnî, ne zayîn, ne jiyan û ne jî mirin, bi hîç tiştekî... Heke me bi tiştekî bizanibûya, ji tecrube û keft û leftan ders werbigirta, ne halê me dibû ev halê bêhalan, ne jî mirin dibû nan û ava însanêne Dîcleyê. Se-re xwe hildin û ji pencereyan li Dîcleyê binihêrin, guhê xwe bidinê û dengen ku ji Dîcleyê bilind dibin, seh bikin. Ev, dengen ci ne, kê ne? Ava Dîcleyê ci vedibêje?

Dîcle, ava Dîcleyê, dengê ava Dîcleyê. Ez, dengê min, stranê min, stranê min ên li ser Dîcleyê; ro, ronahiya rojê, tîrêjên ronî. Germahî. Geşî, xweşî. Bihar, dilşahî. Dinya dikene, ax dinale, sar, seqem dihele. Av vedije, Dicle hişyar dibe. Bîhn, ax, herî, dar, ber, gul, kulilk. Dinya vedije. Av, avzê, kahnî, co û çem. Ji Dahl, daristan, zinar, ciya. Ji herderî, ji jêr, ji jor, ji çarmedor. Av, Dicle. Dicle vedije, Dicle har dibe. Ro û Dicle. Tav û av. Tîrêj û pêl. Bi hev re, di nav hev de. Dicle dibiriqe. Dicle diçirûse. Dîcle distrê. Dîcle dibêje.

Dîcle ci dibêje? Guhê xwe bidin ser dengê Dîcleyê, bi dîqet, bi hizir. Bibêjin ka gotina Dîcleyê ci ye?

Ez, dengbêjê Dîcleyê, ji we re bibêjim; deng, dengê miriyan e û ava Dîcleyê strana zîz a miriyan dibêje.

Roja ku fermana me rabû û Mîr, çar bermaliyên wî, çardeh cari-yêñ wî, keç û lawêñ wî yên hê hingî bêhejmar, bira û birarziyêñ wî, mal û malbata wî, ehl û eşîra wî, em, dildar û şîrikêñ şikestî yên qederâ wi, hemû bi hev re, ketin ser riya welatê xerîbiyê, danê sibê, ga-va tîrêjêñ roja zêrîn li ser ava Dîcleyê diçirûsîn, min, bi dilekî zîz û kesertijî, li Dîcleyê nihêrî û ez weha fikirîm; li vê yeka kambax binihêre, Dicle jîn, bextiyarî û serfiraziyê dibexşîne me û em jî mirin, jan û keserê didin wê.

Umrê Dîcleyê çiqas e, ji çend hezar salan û vir ve, ev ava boş weha bisebr, bêwest, bêrawest diherike? Umrê mirinê çiqas e û ji kengî ve ye ku mirin li der û dorêñ Dîcleyê, mîna xezeba Mûsa yan jî tofana Nuh, evçend bi xurtî, li dar e? Xezeba Mûsa ya li ser firawinan yan jî tofana Nuh a li ser neçeyan heta derekî û wextekê bû, piştî wê ew miçiqîn. Lê ev mirina kambax ku gelekî bi xezeba Musa û tofana Nuh dişibe, ku hertim li dora me ye, çîma namiçiqe?

Mîr mir Berî niha bi demeke kurt, heye ku sê, çar hefte, wî, di oda xwe ya biçûk de, li ber pencera fireh ku pelêñ çîki kesk ên dara ziqumê li dorê rapêciyayî bûn, di nav kitêb, ayet, hedîs û telqînêñ xwe de, bi hesreta axa bay û kalan, kahniya evîn û derdan, serê xwe danî ser axa rehmetê û ji her tiştî xatir xwest û bêveger çû.

Stêr mir.

Mam Sefo Manolgiyan, Migo, Meryem, diya Meryemê, xismêñ wan, hemû, mirin.

Apê Xelef mir. Heme, Malmîranê malwêran mir.

Ne yek, ne dudo, ne deh, ne sed, ne hezar, bi deh hezaran nas, dost, heval, ehl û însanêñ ku min dinasîn, mirin.

Ermén mirin. Suryan, keldan, nastûrî bêhejmar mirin.

Yêzidî mirin. Kurd mirin.

Û ez ê jî bimirim. Ev birîn naceribe, ev ê min bikuje.

Ez dibêjîm, ew mirin, lê rastî weha ye, ji Mîrê min ê ku ji derd, kerb û hesretê mir pê ve, yên din hemû hatin kuştin. Bi ecelê xwe mirin tiştékî ye, bi şûr, xençer, kêt, temanç, tifing û topan mirin tiştékî din e. Li der û dorêñ Dîcleyê mirin nîn e, kuştin heye. Ecel nîn e, fermana melekê Ezraîl, bi qewlê yêzidiyan Melekê Tawis, ku bi hale-tên kuştine tê, heye. Melekê Tawis bi du şêweyan tê nik me, însanêñ fanî ku ji afirînê bêtir ji hilweşînê, ji evînê zêdetir ji kînê hez dikin; yek, bi lorîna nazik, gotina xweş û xewa şêrîn. Dudo, bi şûr, xençer, temanç û tifingê. Para Mezopotamyayê, ya diduyan e.

Ez ê jî bimirim, ji ber ku qesta xençerê, fermana melekê nemir, qesta kuştina min bû.

Bêşik ez ê ji we re çela evîn, xweşî, hêvî, coş û heyecanê jî bikim. Lê eger hûn meraq bikin ka ez çîma weha behsa mirin û kuştina bed-bîhn dikim, bersîva min ev e; mirin û kuştina ku min, di hemû heye-ta xwe de şahidî lê kiribû, berî niha bi çendekê, piştî mirina Mîr, di nav kirasê yekî zikreş de, mîna segekî har ê devgirêz, ji nişkekê ve, derket ser riya min û êrîşî min jî kir. Çare nîn bû, min diviya bersîv bida, mîna hespê ku di geremola çemê Dîcleyê de, veciniqî û matbû-yî, çavêن wî li qeraxêن çêm, li ber xwe dide û dixwaze xwe bi qiraxê bigihîne, welê min jî diviya xwe ji geremola xwînê xelas bikira. Çare nîn bû, min segê har di nav xwîna wî de vegivizand. Da ku ez nemi-rim, min segê segan kuşt.

Belê, min însanek kuşt. Ez ku ewçend ji kuştinê direviyam, ewçend min ji kuştinê nefret dikir, di dawiya umrê xwe de, bûm mîrkuj û min jî merivek, bi darbeyên xençerê, xiste erdê. Gerçi însanê ku min kuşt, segekî har, bênamûsekî rezîl bû û xwîna wî, bi pereyên çikosan jî, bi pênc pereyan nedikir, lê kuştin bi min nediket. Bila Yezdanê me-zin ceza wî bidayê, bila ew bêbextê bêbextan bi derdekî bêderman bi-keta ku dermanê wî şîrê teyran û qoçê keran bûya. Mixabin welê ne-bû, di wexteke min a gelekî zîz de, ku ne dengê dil, ne jî dengê heş digihîste min, her tişt bi leza birûskê qewimî. Lê eger wî bênamûsî bi xençera dudevî ya zîvhêlî êrîşî min nekira û ez birîndar nekirima, min ê ew nekuşa.

Xençerê ku pêşî di destê wî bêşerefî de bû, rabû, bi qasî kêliyekê li hawayê, bi şewqeke gelekî ronî çîrûsî û ber bi zik û navtenga min daket. Xençer cil û bergên min çîrandin, ten û çermê min qelişand û agir xiste bedena min. Mîna ku hûr û pîzûrên min der bin, welê ne-fesa min çikiya, bi qasî bîskekê dinya li ber çavê min reş bû. Lê çi bû, çawan bû, ez nizanim, çaxa xençer dîsan hilawesta, ez rahiştimê. Destekî min li ser devênen xençer, bi destê din, min çend gurmistên reh-manî li ser sûretê wî bêşerefî teqandin. Tevî ku destê min jîbû û de-vê xençer gihîste hestiyân, min ew berneda. Û em hilweşîyan erdê. Demeke gelekî dirêj li erdê me hevûdu bir û anî. Mirin li odê bû, Melkekê Tawis, bi xençerê dudevî, li wir, li ser serê me hilawestî bû. Em ê bimiriyyana, ez, yan jî ew, yan jî em herdu, lê mirina bêbext, bêvij-dan qetî bû. Rengê oda xweşraxistî guherî, xwînê rengê xwe da he-mû odê, cil û bergên me, dest, pî, mil, rû û hemû laşê me, mehfürêñ li erdê raxistî, diwarêñ odê yên spî, dîwana müşmişî ya koşê, hemû, her tişt di nav xwînê de ma.

Bi dû pevcûneke gelekî dirêj re, ez, bi hedîka, hemû bedena min bi janeke bêpayan ketî, rabûm ser piyan. Lê ew bêşerefê bêşerefan rane-bû. Xençer di destê min de bû. Bi qasî çendekê ez, bi zehmetî, li ser

serê wî rawestiyam û min lê nihêrî. Çavên wî, beloq, vekirî bûn, rû, simbêl û rîha wî di nav xwînê de bû, ji bîvila wî xwîn diçû û ji stûyê wî xwîneke boş dipijiqî.



hezaran salan û vir ve, însan, heywan, rîwî, birîndar û mirî dibirin û dianîn, li hewşa fireh û hertim ronî ya Medresa Sor ku warê îlim zanîn û merhametê bû, li kêleka Birca Belek a qesra Mîr ku li ber devê Diclê lê bûbû, ku hertim tişî jin, cariye, zarok, aqilmend, qumandar, alîm, şahîr, dengbêj, dîndar, şêx, mîr û axa bû, li zozanên çiyayê Cûdî ku bi bilindahiyêن xwe mîna teyrê simîr, nobedarî li hemû navçê dikir, li hawirdorêن gola Ûrmiyê ku hêzên çekdar ên Mîr dirêjî kiri-bûn, li deştêن zer ên Cizîra Botan ku qulipîbûn ser qada şer ku di navbera hêzên kurdan û osmanîyan de dihate pê, li doraliyêن sûr û bircêن keleha çiyayê Erexê ku me, Mîr û nêzên wî, ji bêgaviyê, xwe spartibûyê , li ser riya bêdawîn a welatê xerîbiyê ku piştî şikestînê derketibû pêsiya me, di nav keştiya kevnare de ku li ser pêlêن Derya Reş, mîna pelekî zerbûyî û hilwehiyayî yê payizê, bi hêdîka, hêl dibû, li Stenbolê, payitextê padışahê osmanîyan Siltan Evdilmecîd, di zîndanêن tarî de ku em, girtiyêن Cizîra Botan, Hekar û Mikisê, mîna pêzîn ku bi şebekê ketibin, li ser hev, bêyî ku haya me ji roniya rojê, ta-riya şevê hebe, rûniştibûn, li Girîtê, warê me yê xerîbiyê, li bajarê

kevnare Xaniyayê ku ji bo min bû medreseyeke nû mîna Medresa Sor û gotina serpêhatiyên Hektor, Parîs, Helena, Aşîl, Odyseus û Penelopê ku gelekî bi gotina serpêhatiyên me dişibîyan, gîhande min...

Min li hemû van deran, bi çavê xwe, mirî dîtin, çavêwan ên ve-kirî, rûyên wan ên sar, termêwan ên ku hew diliviyan dîtin. Ü da-wiya dawîn jî li Şamê, bajarê miqedes ê misilmanan, bajarê ku divi-ya bajarê merhemet û vîjdanê bûya û di dawiya umrê me de siku-ne-tekê bexşî me, însanênesakîn û westiyayî yên şer, pevcûn û xerîbi-yê bikira, ji bo min, qulipî ser bajarê mirin û kuştinê. Her cara ku min çaven mirî dîtin, ez li melekê ezîm û abadîn, Melekê Tawis û li şûr, xençer û tifingên wî fikirîm. Çavêmirî ez dilşikestî dikirim; he-mû keft û lefta jînê hîç bû, dawiya ku hîç tu însanekî nikaribû jê bri-reviya, xwe jê xelas bikira, ev bû, mirin. Çavêmirî ez kefxweş dikiri-m; mirî ne ez bûm, mirin ji min bi dûr bû. Lê li Şamê, mirina ku hertim li dora min bû, hertim di nav hîsên kûr de nefesê li min diçi-kand, hate û pêşî bû pardarê heyata min, paşê jî heyeta min, heyata yara min têk bir.

Min kê û çîma kuşt? Ez ê, kite bi kite, vê ji we re bibêjim.

Ez ê çela kuştina Stêrê, yara heyata min, jî, dîsan, kite bi kite, bi-kim, hem çawan Stêr çendîn caran ji şûrê mirinê xelas bû, hem jî çawa-n, bêyî ku hay jê hebe, ew kete tora mirinê û bi derbeyên xedar ên xençerê mir. We nedît, min dît; ew bedena wê ya nazîk û narîn quli-pîbû ser seradeke sor a qulqulî ku jê xwîn diçû.

Lê sebir bikin. Gotin ê gotinan veke, bûyer ê bûyeran, derî dê de-riyan, rê dê riyan. Ji bilî gotinê û lihevanîna wê ez bi kêrî tu tiştî na-yêm. Ne pevcûn û şer, ne kar û şixul, ne îlim û siyaset, ne idare û kar-gerandin, ne xulamtî û murîdî, ne jî serekî, mîreki, şêxitî, axatî. Ez bi tenê, bi karê gotinê dizanim. Ü ez ê wê ji we re bibêjim. Lê ne bi lez û bez, bi hedîka, bi sebir, bi germahî û zelaliya gotina edebî.

Berî niha bi demeke dirêj, gava ez ketibûm pey reh û rêcêñ xwe û li newalêñ Lalêşê, li ber deriyêñ neqişandî yên tirba şêxê qedîm ê yê-zidiyan Şêx Adî, min li dengê kalêñ rîhspî û cilspî yên yêzidî ku bi bi-lûr, def û erbanê telqîn û stranêñ yêzidiyan digotin, guhdarî dikir, hin gotin, mîna lûlûyêñ zelal ku di telqînen yêzidiyan de behs dibe, ketin ber guhê min, na ne ber guhê min, ber dilê min; xwedavendê nûranî ji nûra xwe heft melayike deranî, melayikê mîna însanekî bi qendîle-ke qendîleke din pêxîne, welê dafirînî... Bi qendîleke ronî pêxistina qendîleke din, bi cirûskekê cirûskeke din, yeka din, yeka din... Qen-dîl, cirûska jînê, hêviyê. Jan, keder, hizîn, lê tevî vê jî qendîl, ronahi-ya hêviyê ku rehê jîndar ê heyatê ye. Qendîl, ji gotinekê ber bi goti-

neke din, ji şevbuhêrkekê ber bi şevbuhêrkeke din... Weha, biûsil, têkûz, bi rêzdarî, aramî. Bi nûr û ronahî.

We qendîl pêxist, ez ê jî bibêjim, quweta gotina xwe bi we bigihînim, gotin bi gotin, şev bi şev, qendîl bi qendîl.

Lê belê dengê ku hûn ê lê guhdarî bikin, ji bîr mekin, dengê dengbêjekî ye. Dengê dengbêjekî jî, dengê xewnan e, ku tê de do û iro, iro û sibê dibin yek; mirî û zindî, çûyî û yê bê bi hev re ne, rastî û qewimî, fikir û xeyal dikevin nava hev, gelek dengê kesên din jî di nav de ne. Dengê dengbêjekî, xuşexuşa Dîcleyê ye ku ji kûrahiyên avê dertê; gumîna çiyayê Herekolê ye ku ji bilindahiyên çiyê hawirdor vedigire, nalîna pîrejinekê ye ku hemû însanên xwe winda kiriye, girîna zarakêkî ye ku li darê dinyayê sêwî û bêkes maye, tepetepa dilê evîndarekê ye ku evîn lê qedexe bûye, kesera dilê şikestî yê mîrekî ye ku li hember hezên çekdar ên dewletên mezin şikest xwariye û bindest ketiye, hawara birîndarekî ye ku nefesa mirinê ya Melekê Tawis bi ser de hatiye, şerqîna şûrekî ye ku xwîn jê şîp, şîp, şîp dilop dike, hîrîna hespekî ye ku siwarê wî bi berîkekî tifinga dijmin ketiye, fîzîna bayekî ye ku xwe ji rojhelata çiyayên Hekaran dirêjî çiyayê Bakokê dike. Di nav dengê dengbêjekî de dengê jîbîrbûyî yê asûr, nastûr û keldanen dêr û qesrên Tiyarî, Tobî, Depreşan û Nînovayê, dengê qedexekirî yê yêzidiyên kahnî, ziving û mezelên Lalêşê, dengê mazlûm ê misilmanen medrese û mizgeftên Cizîre, Hekar, Wan û Diyarbekirê heye. Dengbêj, pêşî, seh dike, guh dide dengan, paşê wan werdigire û diqulipîne ser dengê xwe û dawiyê jî, mîna ku ez niha dikim, wan mîna dengekî ku ji dengên têkel ên wext û dewr, hez û evîn, hesret û jan, kîn û nefret, tirs û heyecan, coş û hêviyê hatiye pê, vediguhezîne însanan.

Ji lewre divê hûn ji min nepirsin ka dengê min aidê kê, ci û kengî ye. Dengê min, aidê herkesî, her tiştî û her wextê ye. Lê bervajiyê vê yekê jî heye, dengê min, aidê tu kesî, tu tiştî û tu wextê nîn e.

Ji min mepirsin ka ci rast e, ci ne rast e, ci kengî û çawan qewimîye. Dengê min, dengê rastiyê ye, lê ne rastiya şûr û xençeran, tifing û topan, axa û began, şêx û seyidan, berdevk û waqanûseran, mîr û paşayan, sultan û padışahan. Rastiya dengê min, rastiya Dîcleyê ye ku tê de hemû dewr û dewran, şexis û însan hene, ku mîna dewr û dewranan, însan û însaniyetê, her û her, diherike.

Fermo, ji we re rastiya Dîcleyê; guhê min li dengê te, ku qîrîn e, hawar e. Çavê min li pêlên te, ku xuşexuş e, herikîn e. Ji deverên dûr ber bi deverên dûr e, di nav wext û heyaman de. Dengê te, ku bi dengê ba, baran û berfê ve yek dibe. Endam û bala te, ku bi tîrêjên tavê,

çirûskêñ hevv û stêrê li hev dipêçikine. Li dengê te guhdarî dikim, ku kûr e, dûr e, nûr e. Her roj, her şev, ji jor ber bi jêr e, li vir e, li wir e...

Min ji dengan hez kir, li dengênu ku dihatin bihîstin, guhdarî kirin û li dengênu ku nedihatın bihîstin, meraq kirin. Ez ketim pey dengan, min guhê xwe, dil û ruhê xwe ji dengan re vekir û bûm dengbêj. Li dinyayê her tişt xwediyê dengekî ye. Ne bi tenê însan, teyr, tilûr û heywan, herweha erd û ax, dar û ber, zinar û çiya, av û çem, ba û bâhoz, berf û baran, tav û heyam jî xwediyê dengekî ye. Heta dengê bê-dengiyê jî heye. Gava însan hosteyê şixulê dengan be, ev deng, hemû bi hev re, yan jî yek bi yek, dikarin bêtin bihîstin. Lê belê berî her tişti meraq divê. Meraq, bi dû re sebat, bi dû re jî xebat.

Hê gava ez zarok bûm û min li ber rehleyên dersxaneyên Medresa Sor ayet û hedîsên kitabêni miqedes, bi erebî, rêsên seydayên Cizîrî, Teyran û Xanî, bi kurdî, rêsên şahîrên faris Fîrdewsî, Hafiz, Sadî û Xeyam, bi farisî, ji ber dikirin, hê hîngî min, tevî wan rêsên bedew ên şahîran, li dengê wan jî meraq dikir; gelo dengê wan çawan bû? Dewsa feqeh û melayên me yên rûtîş ku çoyê wan ê dirêj hertim li ser serê me bû, eger şahîran bi xwe rêsên xwe bixwendina, wan ê çawan, bi ci şeweyî bixwenda? Dengê wan ê çawan derketa? Ew deng ê çawan bigihîştina me? Hê hîngî, danê êvaran, gava ez û hevalê min ê file Migo ku Medresa Sor jê re qedexe bû, pişti keftûlefta rojane ya ders û medresan, li mala wan ku li ber perê Dîcleyê bû, li kitêbxana gelekî fireh a bavê wî Mam Sefo, ku tijî kitêb bûn, em li ser xalîçeyen rengîn ên kitêbxanê dirêj dibûn û me li rûpelên kitêbêni mezin ên qehîm cîldkirî ku tijî resim, wêne û sûret bûn, dinihêrîn, min li dengê wan sûret, wêne û însanên bêdeng meraq dikir; eger ew ne wêne, lê însanên zîndî bûna, ew ê çawan bipeyiviyana, bi ci zimanî, bi kîjan dengan? Wêne û sûretan ci digotin? kitêbeke gelekî mezin hebû, rûpelên wê zerbûyî, cîldê wê yê textîn çermkirî bû. Di her rûpela kitêbê de wêneyeke zelal, reş-spî, hebû. Filîsoph û kumandarekî yew-nanî ku tevî deh hezar neferan di Anatolî û Mezopotamyayê, di welatê kurdan û ermenan re derbas bûbû, wê kitêba mezin ku çela wê gerê, yan jî bi qewlê nivîskar vejerê, dikir, nivisibû. Navê nivîskar gelekî zehmet bû, ji lewre min navekî din lê kiribû, Keso. Min û Migo, rûyê me ber bi pencera vekirî ku li Dîcleyê dinihêrî, di nav gulokên tîrêjên tavê de ku di ser ava Dîcleyê re xwe dirêjî hundirê kitêbxanê dikirin, me rûpelên kitêba Keso vedikir, li wêne û sûretan dinihêrî û li gora tevger û hereketên sûretan, dewsa wan, em dipeyivîn. Ez û Migo dibûn dengê sûretên bêdeng. Min bi zimanê kitêbê ku bi tîpêñ latînî hatibû nivisîn û ji milê çepê dihate xwendin, nizanîbû. Lê Migo ku ji bilî ermenî, bi hin zimanêni din ên welatê rojava mezin di-

bû, bi zimanê kitêbê, eger ez ne şaş bim, bi fransizî bû, dizanîbû. Carina, gava wêne û sûretan şer û pevçûn salix didan, Migo rêsê li binî wêneyan dixwend û ew ji bo min şerh dikirin. Lê bala min ne li ser gotinê Migo bû, min li dengê bêdeng ê sûretan meraq dikir. Kesên wêneyan çawan diqîriyan, bi ci texlid dengan êris dibirin ser dijmin? Gava ew bêkeys diketin, wan çawan gazî û hawar dikirin? Bi qîrîn û qîjîn, bi tika û lavelav?

Ji bilî Keso hin nivîskarê din jî di kitêbxana germ û şêrîn de ku jê bîhna taybetî ya kitêban difûriya, hebûn. Navê hemûyan niha na-yê bîra min, lê gava gotin gotinê veke, bi alîkariya qendîlê, ronahiya gotinê bireşe ser bîr û heşê nankor ku hosteyê jibirkirinê ye, hingî heye ku navê hemûyan bête bîra min. Lê diduyêñ din hebûn; Maro û Naso ku herdu jî Romayî bûn û di wexta keysar Agustos de jiyabûn. kitêbêñ wan jî gelekî girs, bi textekî tenik cîldkirî, rûpelên wan neqîşandî û nava rûpelan tijî wêne û sûret bûn. Herçî ev herdu kitêb bûn, Migo jî bi zimanê wan ê latînî nizanîbû. Lê me li sûretêñ ku geleki zelal û lihevhatî bûn, dinihêrîn. Di şevêñ bê de ez ê çela kitêban û sûretêñ wan bikim, lê bi xêra sûretan û şerhêñ peregende yên mam Se-fo ku carina dihate kitêbxanê, bi ken li me û kitêba li ber me dinihêrî, simbêlê xwe yê boq badida û jî me re, bi çend gotinan, behsa sûretan dikir, em hînî serencamêñ kitêban jî bûn. Ci serencamêñ balkêş, tijî xwîn, xwîdan, girî, jan, keser, heyecan, evîn û hêvî ku bi heyata me ya neçar û bi serpêhatiyêñ me yên keserkûr dişibîyan! Min dengê wan hemû hîs û pejnan ku di nav rûpelan de bêruh razayî bûn, dibihîstin, ew hemû hîs û pejn vedijiyan û xwe bi ruhê min ê qesmer ku ji ber zaroktiyê, hê bîr bi çerxa dinyayê nebir, digîhandin. Lê piştî ku min jî, bi vî çavê xwe, şer û pevçûn, xwîn û xwîdan û ew hemû hîs û pejnêñ rûpelan di heyata xwe ya kambax de dîtin û jiyam, min ew di dil û ruhê xwe de hîs kirin, hingî ez tegihîştim ku Maro û Naso ne bi tenê dengêbêjêñ welatê Romayê, herweha ew dengêbêjêñ min bûn jî. Kitêba Maro ku bi dengê hizîn ê şikest û bindestiyê ve hatibû hûnandin, çela bajarê Truwayê, hespê qerase yê îxanetê, şewata bajêr û reva Enasê ber bi welatê xerîbiyê dikir. Ma heyata me jî nebû mîna serencema kitêba Maro? Ma hespê qerase yê îxanetê, çaxa hêzîn çekdar ên Mîr ji bajarê Cizîrê bi dûr ketibûn û di germa havîna zelal de ku xwîdan, bêrawst, ji me û jî hespêñ me diçû, li ber qeraxêñ gola Urmiyê ku tavê li ser avê bi rengêñ têkel leyлан dida, hâziriya şerîn mezin dikirin, hingî, bi navê Yezdan Şêr û hêza osmanîyan, evî bajarê me yê qedîm Cizîrê venegirt? Ma me şikest nexwar û serê xwe li ber paşa û sultanêñ osmaniyan netewand, stûyê xwe xwar nekir, riya me, bi dengê strana hizîn a vejetînê, ber bi welatê xerîbiyê neçû û em li welatê xerîbiyê bi hîsa hesretê nekizirîn? Herçî Safo

bû, wî jî di kitêba xwe de ku li welatekî gelekî xerîb û nenas ê Derya Reş, bi keserê hatibû nivisîn, çela xerîbiyê dikir. Ma xerîb kî bû? Ne em bûn? Ma xerîbiya malkambax nebû qedera me, pêlên hov ên Derya Reş ku bi rastî jî bi renekî girtiyê xoftijî diçeliya, tirseke bêpayan ne-xist dilê me jî? Ma bayên seqem ên welatên nenas rûyê me jî nebîrî?..

Deng li çeperên xewt û dewran, tixûbêñ însan û welatan guhdarî nake, ew hertim xwe bi dengan digihîne. Deng rê li dengêñ din vedi-ke. Mîna qendlê, bi dengekî dengekî din dertê, bilind dibe. Lê însan divê dengan bibihîse, dilê xwe jî dengan re veke, heşê xwe bi dengan bineqişine û ji dengan dengekî nû biafirîne ku dikare bibe dengê ne-bihîstiyân...

Dengê nebihîstiyân -an jibîrbûyiyan- dengê birîndaran, dengê Meyrema çavreş, dengê keça Mîr, Zîna zirav, dengê şirîka qedera min, Stêrê. Esterâ porzer, Stêra çavşîn, gotinêñ wê yên birîndar ku mînâ kuliyyen berfa çiyayê Cûdiyê, yek bi yek ji zimanê wê yê lal derdiketin. Û dengê nebihîstî yê bav û kalên min ku min tu carî nedîtin û nenasîn.

We ez ji Şamê hilgirtim û anîm bajarê umrê min Cizîrê. We û xêrxwazên mîna we ku bi hesreta min a ava Dîcleyê û axa siûdê dizanîbû, çeyiyeke mezin bi min kir. Piştî umrekî gerok ku bi xaçeriyyêñ fet-loke tijî ye, ez dîsan vegeriyame warê ku ez jê derhatim. Riya navbera Şam û Cizîrê dirêj bû, zehmetî zahf bûn. Lê bawer bikin, li rê, ne êş û jana birînen min ên kûr xema min bû, ne jî zehmetiyêñ bêhejmar ên rîwîtiya dirêj. Her tişt niha li pey ma, ez li vir im, ez ê li vir, li ser axa bav û kalan nefesa xwe ya dawîn bidim û xwe berdim hembêza Melekê Tawis. Ez ê li pêlên ava Dîcleyê, li ronahiya tavê, li şewqa heyvê, li çirûsîna stêrê binihêrim û bimirim, bi lorîna dengê ava Dîcleyê, bi strana bayê hûnik ê berbangêñ Mezopotamyayê. Wesiyeta min li we, gava dengê min hate birîn, ne bi tenê dengê ava Dîcleyê, divê dengê dengbêjîn nûgîhiştî jî bistrê, dengê pîrejinan binehwirîne, dengê kalemêran bibêje. Hûn divê min bi dengan bi rê kin. Ez ê herim. Lê xwezî min bizanibûya ka bav û kalên min li kû veşartî ne, da ku we bedena min a sar li nik wan veşarta. Lê ez nizanim, hûn nizanîn. Ji lewre hûn divê min li bilindahiyeke qeraxêñ Dîcleyê veşérin, an jî li kêleka tirba Nuh nebî ku bi keştiya xwe li bilindahiyêñ vê axa Mezopotamyayê venişt û konê xwe li van warêñ kevnare yên însani-yetê vegirt û ev ax kir welatê me. Yan jî min li ber lingêñ Birca Belek ku ji sedan salan û vir ve, tîmsala abadîn a mîr û dotmîran, evîn û evîndaran, deng û dengbêjan, şîhîr û şahîran e, veşérin. Hûn bi qîma xwe ne, lê şertekî min heye; dengê ava Dîcleyê divê ji min û gora min bi dûr nebe. Yan jî hûn dikarin weha bikin, bedena min bi mehfûre-ke neqişandî ya Botanê bipêçin, wê daynin ser kelekekê û pê qehîm

girêbidin, dawiye jî kelekê berdin nav ava Dîcleyê da ku Dîcle min bi xwe re bibe welatên xerîb û warênenas. Ma însan û umrê însen ne mîna dilopeke ava Dîcleyê ye ku di boşahiya avê de winda dibe?

Ez nizanim ka kê ev nav li min kiriye, lê navê min Biro ye, Biroyê dengbêj, Biroyê dirêj an jî bi qewlê hesûd û xérnexwazên min ku mîna siya min her li pey min bûn, ji deng û eserên dengê min dihesidiyan û bûn sebeba kuştina Stêrê, Biroyê kor. Bila kêfa hesûd, çavnebar û dijminan bête, Biro, yanî ez ê herim, lê eger ez bikaribim xewn û xeyalên serpêhatiyêñ xwe di van şevbuhêrkên me de ku bi agirê qendilê ronî dibin û bi dengê Dîcleyê olan didin, bibêjim û bibim sêrî, hingî, tevî her tiştî, min hêvî heye ku dengê Biro, -herweha dengê jibîrbûyîyan- li pey min, bimîne.

Herçî korahiya min e, ji şopa kûr a darbeya şûrê tûj ku ji enî he-ta çengê ye, diyar e. Li vê qedera min a teres binihêrin, min çavê xwe yê rastê bi darbeya mirinê vekir û niha jî ez ê bi darbeya mirinê bigirim. Berî niha bi umrekî, gava min çavê xwe vekir, bi tenê çavekî min ronahiya dinyê dît. Ronahiya çavê min ê çepê bi darbeya şûrekî mirinê vemirîbû. Umrê min ê beriya darbeya şûr ku ne zêdeyî çend salan bû û bêguman bi bay, dê, heye ku bira, xweh, nas, xisim bû, na-yê bîra min. Ew çend salêñ umrê min ê beriya şûr di bin siya tarî ya nenasiyê de ye. Tevî ku ez carinan xewn û kabûsan dibînim, tu kes nayê bîra min, tu deng xwe bi min nagihîne. Di umrê min ê piştî darbeya şûr de ku destpêka heyateke nû bû, yan ji mirinê vege bû, ne bav û dê, ne jî bira û xweh hebû. Bi tenê Biro hebû, zarokekî birîndar, bêkes, sêwî û çavekî wî kor. Û xerîb. Û dilşikestî. Û tırsiyayî...

Deng, dengê bêdengiyê; Deng. Hîrîn. Hesp. Tekbîr, Allah, Allah, Allah. Deng, teqîn. Qîrîn. Qîjîn. Agir, gulok, şewat. Deng, şîrqîn. Şûr. Şewq, xwîn. Dilop bi dilop. Şûr, dudevî. Şûr, cirûsîn...

Û ji dengê hîrîn, tekbîr, teqîn û şîrqînê tırsiyayî...

Hemû însan, qeder, bûyer, pêwendî û serpêhatiyêñ ku ez ê ji we re behs bikim, min bi çavekî, bi ronahiya çavê rastê dît û bi çavê xwe yê kor ê çepê jî hîs kir. Şûrê ku şekil û şemalê rûyê min guherand, dinya min jî kir du perçe; perçeyê ronî ku didît û perçeyê tarî ku hîs dikir. Çavê min ê rastê ku mîna dûrbînekê, bergehêñ însan, war û mekanan li ber min radixist, ne bi tenê alîkariya min dikir, herweha wî alîkariya hevalê min Têlli jî ku ji herdu çavan bû, dikir. Ez û Têlli, em du kesen girs û dirêj, bi çavekî, diketin pey seyd û nêçiran, di geliyêñ bêbinî yêñ bakûrê Girîte de, em diketin pey bizinêñ kovî ku jê re digotin krî krî.. Herçî çavê min ê çepê ye, ew dûrbîna bûyerên ku mîna pêlêñ xezebê yêñ Derya Spî ku bi ser me de dihatin, bû. Ez bi çavê xwe yê kor bi hatina bûyerên ku li rê bûn, dihesiyam. Gava

bûyerek ê biqewimiya, şopa şûr, birîna kûr jan dikir.. Heyata min a şerpeze û peregende ku ji ronahî û tarîtiyê hate pê, mîna kelekeke Dîcleyê ku ketibe ber lehiyeke har, di navbera dîtin û hîskirinê de çû û hat. Ji lewre gotina min a ku bi ronahî û tarîtiyê hatiye hûnandin, esereke herdu çavan, ê ronî û yê tarî ye, bi gotineke din, esereke dîtin û hîsan, mêtî û dil e.

Ez êdî westiyam. Îşev hewqas, gotina min a îşev heta vê derê, eşâ birînê nefesê li min diçikîne, dengê min dibire. Niha bîrînên dest û laşê min derman bikin, taseke av û misteke mewij daynin ber serê min, lehîfê bikêşin ser min, qendîlê bitefînin û herin. Lê beriya wê, ji kere-ma xwe, wî kevirê boz ê kehrîbar ku sûretê teyrê tawis lê kolandî û neqişandî ye, ji dîwarê ber pencerê daynin û bînin bi stûyê min kin. Kalepîrekî rîhspî yê yêzîdî ew, li ber Kahniya Spî, li Lalêşê, mîna ya-dîgareke oxirê da min. Min jî ew da Stêrê da ku teyrê tawis bibe oxi-ra evîna min û Stêrê. Oxir... Ez ê gotinê bînim ser oxirê, lê ne niha. Cara dawin min kevirê teyrê tawis ku tîmsala Melekê Tawis e, li nik mérkujek, mérkujê ku bedena nazik a Stêrê kiribû mîna seradê. Bi xê-ra vî kevirê hanê ku ewrûpayî jê re dibêjin madalyon, min fahm kir ka mérkujê Stêrê kî bû. Niha wî kevirê min ê pîroz bidin min, da ku teyrê tawis li ser sînga min be. Heye ku Melek ê Tawis jî îşev, bi den-gê dîcleyê û ronahiya stêran, were û min, bi baskên xwe, hilde û bi-be warê heyv û stêran, warê Stêrê. Hingî ez ê tevî teyrê tawis, bike-vim ser riya dawîn ku Melekê Tawis ê nîşanî min bide.

De herin, lê ji bîr mekin, berî ku hûn derin, qendîlê bitefînin. 

Kamûran Bedirxan

Şiîrê Hawarê

JÌ MİN BAWER BİBE

Robar hêdî hedî diherike, pêlên wî sar û xweş in. Ava wî bi kef e, û wek zîv gewr e

Meşa wî li deştê, wek rêveçûna destgirtiyan û bûkan bialûs e, beza wî di nav çiyan û gelîyan de, wek reprepa hespêñ serhişk e.

Lê gava ez jê re dibêjim ko ez hej wî dikim bila ji min bawer mebe!!

Rêl kesk e, siha wê honik û çak e. Li ser çiqilên daran, çûkan, dişeqin. Pelên wan ter in.

Lê gava ez jê re dibêjim, ko ez hej wê dikim bila ji min bawer mebe.

Azman heşîn û avîje ye. Stêr wek gewher û mirariyan dibiriqin. Heyv bi rûnahiya xwe distire.

Lê gava ez jê re dibêjim, ko ez hej wê dikim, bila ji min bawer mebe.

Buhar bi bîhn û rengîn e, bi stran û kêf e. Şiraniya wê xweş, xwesiya wê şirin e. Tebîet jî xewê radibe û dikene. Her kunc bi kulîlk û mîerg, bi av û dar in.

Lê gava ez jê re dibêjim ko ez hej wê dikim bila ji min bawer mebe.

Can şîrin e, jîyîn spêhî ye. Ez hêj ciwan im. Min hêj bîst û pênc buhar ne dîtin. Gelekî hej jîyin û evînê dikim.

Lê gava ez ji wan re dibêjim ko ez hej wan dikim, bila ji min bawer mebin.

Dê û bav, ap û xal, pismam û dotmam çiqas delal in.

Bi wan re rûniştin û di ber tifikê de axaftin çiqas delal û xweş e.
Li ser çiyan û zozanan bi wan re gerîn û bezîn gelekî çak e, pê dilê mirov vedibe.

Lê gava ez ji wan re dibêjim ko ez hej wan dikim bila ji min bawer mebin.

Heval heval e, lê bira delal e. Çiqas ez hej birayê xwe dikim.

Lê gava ez ji wî re dibêjim ko ez hej wî dikim bila ji min bawer mebe.

Ez dilketî me. Delala min spehî ye, wek berfê gewr e, wek agira germ e, û wek gulân sor e.

Dilê min di çavêن wê de dîl e.

Lê gava ez jê re dibêjim ko ez hej wê dikim, bila wi min bawer mebe.

Lê welatê min, welatê dê û bave min, welatê kal û kalikên min, welatê min ê şirîn, gava ez ji te re dibêjim ko ez hej te dikim ji min bawer bibe.

BÊRIYA WELAT

Ax ... dilê min çiqas bêriya wê dûriyê dike!! Wê dûriya ko di nav wê de ezman bi rengekî din heşîn e, stêr wek çavêن delalan dibiriqin, û çiya rawestiyane.

Bêdengiya rêlan, min dikişîne bin sîha xwe. Dixwazim di bin çiqi-lêن berû, qizwan û kenêran de rûnim.

Ciqas bi dileki şewitî, ez dixwazim guh bidim guşguşa pelên daran. Dixwazim herim ronahiya hêyvê, bi ser zinar û ser serê çiyan de bibezi.

Tinê li wê derê, di wê spehîtî û delaliyê de, dikarim bi dil bikenim.

Mehmet Sanrı

Pangînî

Pangiya, peqiya, belav bû...

Ez di xewnekê de me, an jî ez xewnekê dibînim; ci ferq e, an rast an jî xewn an jî xewna yekê/a dî. Zimanê birî serê vehesiyyâ; pîmê veşartî.

Kuştina mêmariyên reş guneh bû. Mêmariya reş, gerdena xwe bilind dikir xalên rengîn dibiriqîn. Li kèleka malan li ber dehla dirdirîyan, bi seetan min seyra xwelihevpeçana marêñ reş dikir... Keçika Pordelal, ramûsana pêşiyê bû, min ji lêvîn te yên şil û şérîn girt: Ramûsana pêşiyê, wekî brûskekê ji lêvan difelite, zelzeleyeke bênav û nîşan xwe bi ser can û bedenan de diberde, fûrek ji kûrahiya ruhê mirov xwe ber bi jor ve diavêjin; ew bêhn qet nayê jibirkirin... Asîman zelal, roj li asîmanan hilawistî; li ber sitiriyê dirdiriyê çiplaq-tazî, beden-li-hev-badayî.

*

Ez li otobusê siwar bûm; her çavek li ser yê/ya dî tehdîdek e, her kes ji yê dî re bertangiyek e; jinek û merekê kal bi çavêñ behitî li dora xwê dinêrin û xwe dipasîrin hev... Bajar di nav ewrêñ gemarî re wekî rûyekê kalê çavkinîsto xuyaye; şaristaniyaka tenikeyî, jiyaneka bafûn; hewa û rêbarêñ wî bajarî wekî mencenîqan ruhê mirov diguvişîne û ber bi jêr ve diavêje; sal, demsal, her tim bêhneka giran, tâmekâ gemor... Bajar, dojeha li jêrayiya Diteyê, çar dorberêñ herî li jêr... Ci çax bû min tu dîtî, li kûderê, cara pêşiyê ya paşiyê?.. Viyanêñ heram, gunehêñ giran, rû bi rû, çav li çavan. Di wan gunehan de behra min, a te ci bû; ne ez Lennei me, ne tu Georgeî û ne jî yê çêroka me dinivîse Steinbeck e. Lê ez gelekê xwe nêzîkî Lenneiyî dibînim; bê niyeteka xirab; dîn, ehmeq, qatil lê ewqas xwedî hêvî û xwedî xeyal... Bêhneka amberîn ji ser sertiliyêñ min tê.

Ez û tu tinê bi serê xwe, me koxikek ava dikir ser kanîka Çevrobiyê; mirîşk, çîçok û kûcik û kudikêñ me pir bûn. Daristaneka aram;

daristana me qet ne tarîstan bû; her darekê li ser rayê xwe bilind dibû, yekê sîh nedikir ser ya dî, ji me re wargeheka bextewar bû. Da-ra belbelalokê, bûka biharan, sûka havînan, pepûka zivistanan bû. Her demsalek xemleka nû bû...

Xidir, navê wî di deftera dinê de tune bû, lê wî digot; "Xaniyê min li ser serê girikê nêva dinê ye; ez mehzûbanê hêyyû rojê me; roj li cem min taştê dixwe paşê dide der; hêyy li cem min şîv dixwe dûv re li asîmanan zîz dibe". Xidirî tu çaran hevîr ji ser sertiliyên destê xwe pakij nedikir; digot, "Hegî ez ji ser sertiliyên xwe hevîrî pakij bikim, dê dinya tahmsar û bêbereket bibe".

Cara paşiyê bû li rastî te hatîm;
qedeha badeyê di nav tiliyên te
yên qelem de wekî gulxwînê disekinî; hewa, erd, asîman ji gunehan giran bûn, min xwe li ber gunehkariya lêvên te negirt. Ji tahma lêvên te yên lîlozî ez dîsa tavizîm. Bêhna laşê te bêhnek ji bîhuşta baqî berda ser sertiliyên destê min. Erd derizî, ez lerizîm...

Cara pêşiyê min tu li zozanê Feraşinê, li ber belekên berfê, di bin hêsiyê konê reş yê çardehstunî de dîtî. Tu wekî evîndara Cembeliyê Kurê Mîrê Hekariyan bûyî. Ez rêwiyeke dilbiyanî bûm. Li Cûdî, li ser rîya deriyê miradan min tu dîtî; hêyva li asîmanan hilawistî, ji rûyê te dihesidî, di bin kevana burhên te de, herdu çavêne du tîrên li armancê rastkirî

bûn. Paşê li surha Diyarbekirê li te rast hatim; tu guriyek agirê Newrozê yê evînuka veşartî bûyî; li ber gola Ûrmîyê tu wekî pengüneneka gerdenspî, piştreş bûyî... Di kolanêن Hewlîrê de wekî dînan min çengen xwe dihêjandin û digeriyam. Çavê min li te ket; kefiya cemêdanî ji paş ve girêdayî bû, pora te ya delal gurzek bû li ser qolincen te. Gerdena vekirî nemam dianîn xezebê; bisk û temberî daheliyabûn û reqseka seklawî bûn li ser rûyê te; û bi lêvên te yên lîlozî ez tavizîm...

Wekî şemaleka ji kederê li paş rawestiyayî; navê te her Keçika Pordelal bû, ez ji her rêwiyeke dilbiyanî bûm. Min ji delaliya gerdena te zanî ko, çîma kuştina mêmariyên reş guneh bû.

Cara paşiyê bû li rastî te hatim; qedeha badeyê di nav tiliyên te yên qelem de wekî gulxwînê disekinî; hewa, erd, asîman ji gunehan giran bûn, min xwe li ber gunehkariya lêvên te negirt. Ji tahma lêvên te yên lîlozî ez dîsa tavizîm. Bêhna laşê te bêhnek ji bîhuşta baqî berda ser sertiliyên destê min. Erd derizî, ez lerizîm...

Bi gotina Ulyssesê çiyan, "xudahafiz" Keçika Pordelal, şêraniya dinê! Peqîyan, belav bûn, ji nû ve ava bûn.

Ez peyar bûm. Rêwîtiya xirab ci zû xilas bû. Waye nêzik dibin, nêzik dibim... Çima şairî digot “qelbê min bîra dînemêtan e”. Ka pîmê veşartî? Newqa min, binçengên min giran in.

Tilî ket ser pîmê sar; bila biteqe ji bin; zimanê birî serê vehêsiyâyi, ne deng ji min, ne jî ji te... Vê êvarê bû min lêvên te maçî kir; carâ pêşiyê û ya dawiyê bû... Bi sirînî pîm ji cihê xwe derket; pangiyâtî giş teqîyan ji binî! Dilmest û serxweşê peqîyanê me; zûl-zûl, parça-parçe!

Bayekê sar dilekê vala; xudahafiz...

Ahmet Erhan

Rêzikên dawiyê ên helbesteke dirêj

Ma gelo ez jiyanê wek gumlekekî bişeqitînim ji xwe?
Di dilê min de tengezariya gumlekekî terî li dû xwe hiştîye
An jî ber û berên rêyan, ber û berên rêyan?
Gelo ez destê xwe bi ser birîna xwe de bidewisînim?
Ewqas ne hêsan e jibîrkirin.
Rojek tê mirin jî mirov naxwaze
Di kîlîka dawiyê de çavlêketina kulîlkekê
Ji dûranê bihîstina dengê zarokekê...
*

Ev xwîn e ez digirim di destêن xwe de
Ango ji gulêن hatine peritandin e
(ji ku hat ev sorahî)
Yêن ku me digot herî dûrî mirinê ne yek bi yek dimirin
Di rêyên mezelan de şopêن me zêde dibin
(ji ku hat ev reşbînî)
Kaje-wajê layiqî bîranîna wan miriyan nabînim
Êdî li gotaran jî guhdar nakim.
Tu nemirî, ew te dijîn...
Emanetvanê çîroka wan miriyan
Êvaran deriyên xwe zû digirin.

*

Ewqas ne hêsan e ziwakirina
Çavêن dayikan î miştîsir
Kulmêن me li devekeke dûr, diranêن me kîlînkirî
Merin jî, helke helka wê ye li devê derî
Û ji kengî de ye dengêن çekan
Peyvêن dinyayê yêن herî bedew difetisîne.

Ji tirkî: Selîm Reşît

Rênas Jiyân

Semîramîs

- Kostum:** Çermê şeva serjêbûyî.
Dekor: Qoqên serê Edûlê û Julîet, parsuyêñ Derwêş û Romeo.
Muzîk: Nalîna yezdanêñ birîndar.
Ronahî: Heyverona nûzayî ya “gixikan” dike.
Perde: Betanê bekaretê.
Sahne: Kurdistan.
Temaşevan: Herdu çavêñ helbestvan.
Lîstikvan:

Semîramîs
Bav
Evîn
Cîhan
Welat
Sinc (ahlaq)

SAHNE 1

Semîramîs:

- Di hemû ferhengên min de wateya bextewariyê vala hatiye his-tin, an beramberiya wê “kerb” hatiye nivîsîn, zimanزان zalim in, ci-bikim. Ji keyserên sûsmaran re dibûm marmarokeke bi xêlî. Qelenê min, hemû pirtûkên pîroz; Quran, Încîl, Tewrat, Zebûr. Berbûyêñ min; Mûhemmed, Îsa, Mûsa, Dawûd... Zava: Xwedê!..

Sinc: (Bi helwesteke liberketî)

- Berê xwe didim newalêñ xewle, xeyalêñ xwerû, risqekî lihevhatî min nedidît ji bo te. Ahurî Mazda dev ji yezdanbûna xwe berdida, Nîrwana parsek dima.

Cîhan:

- Tu bakîreyeke pîroz bûyî û ji bo qurbana toteman tu hatî hilbi-jartin. Serê pêşîrên te jê kirin, xistin qefesan, dizîn qesasan, bi keşti-yan Transatlantîk derbas kir. Welat yetam ma, bê şîr û bê pêşîr.

Semîramîs:

- Temenê min ji hevokeke marpêvedayî pêk dihat, ew jî ev bû, "Semîramîs, goşiyê ji bo şeraba salane hatiye pelçiqandin". Fermandarê qereqolê yê bi eslê xwe "jontirk" hukim li navrana min kir. Deng-bêjên di dawa min de belawela kîrin. Û namûs penaber bû, çûûû, serê xwe li tahtan xist. Min li xwe xist, te li xwe xist. Mixabin, tiştê çû ez dê her û her bidim dû....

Sinc:

- Zulm, bûkalemûn e. Li her derê lejyonê zagonê wê diparêze, yên qelûna wê vêdixe, ji xwe re dibîne, keçê! Ma yê te tune bû xwediyê lêvên te?

Semîramîs: (Li ezmên nihêrî)

- Gelheyên ramûsanê min bê hed û hesab in. Girnijînê min, girê gerîla tê de bi cih tûn in. Belê, hebû xwediyyê hêjayiyê min, bedena min, bes ew jî bi gulleyeke kalîbreya wê pirhejmar mirar kir.

Evîn:

- Diran di devê dîlanê te de nemane, porê dilşahiyê te sipî bûne. Heke tu bête hezkirin koç bikî tu ê hero duro li devê deriyêن bihuştan bixî. Cîhan her çiqas dojeh be jî, eşq, talanan betal, temenan bizar dike, ji bîr meke. Tu di tewlan de mehîna herî seglawî, beza, bi bûjiyêن te girtiye serhildêran, ji berî zayînê tê, piştî zayînê cengan li dar dixin û diçin.

Semîramîs:

- Cîhan, cahniyeke tebekî, meş û bazdanê wê bi rojî. Min bes e, êdî semîra hetikî, lewitî lê fermandarê qereqolê bi kesayeta xwe ya mevretkirî hîn dijî.

Chan: (Dilê xwe bi xwe şewitand û)

- Belê, pîr im bi qasî emrekî pênc milyar salî û kulek im jî. Celebêن mirinê pir in; şûr, xencer, gule, jahr. Carnan "ji te hez dikim" jî ji van celeban yeke. Xezeb, dê tim û tim di rûpelên salnameyan de lehengekî tirsonek bimîne. Heman xezeb, weledê zinê yê neheqiyê ye, ji xwîn û hoşt xwedî dibe, kengî der û dora xwe perçê dike, îcar ji kezaba xwe dest bi xwexwarinê dike. Û ro bi ro diqede.

Welat: (Di rewşeye şerpeze de ye)

- Li xakêñ bi şer ducanî, te şoreş tevn bi tevn hûna. Li qadêñ xerdel û kîmyasal lê serxweş, fahş zerîpoş, belaş laş, berxikêñ li makêñ xwe diketin, aj dibûn hebûn, (Ne weke Oîdîpûs bi şâşî, belê rasterast bi weldiznetî) te qet hay ji wan tune bû Semîra.

Semîramîs:

- 28 serhildan bi xwînê hatin çewisandin qey ne bes bûn, ez bûme ya 29an; ne bes be, ez ê bibim ya 30yan; ew jî ne bes be, ez ê bibim ya 31an, 32yan, 33yan...

Welat: (Bi germahiya dêyê)

- Heta qîzên min ên weke te şîrhalal hebin, wê şîrheram teqez têk biçin. Naxwe yên welatan dikin welat gernasên mîr(jin)xas yên çîrokan in.

Cîhan:

- Lî belê lîjneya çîrokan cih nadî her lehengî/ê. Di mijarêne xwe de, bes bi şertê ku birînê dîrokê derman, çavêne wê merhem bike.

Sinc: - Edalet edem bûye, şeytan bi şaristaniyê keniyaye, mirovahî bi cenabet e!..

Semîramîs: (Bi qêrîn)

- Mixabin, mirovahî bi cenabet e!..

Welat:

- Welatê evînê êdî nîn e, şatoya şahiyê êdî nîn e, quesra qedir nîn e. Hemû huzna qulingên sezeryan dizan te li xwe civand, yara esîl!..

Semîramîs:

- Okyanûs min qewl kirine ji bona azadiya te ey welat!

Welat:

- Baş dizanim, lê Semîra te jînenîgarî kir boraq ji bo erdnîgariyê, heyf a min tê li keçikantiya te ya terr, hêviyên te yên serzer.

Cîhan: (Di ber xwe de)

- Rîhanên xerabiyê bişkuvîn li ser sergoyan. Surişt, sirûda zûrîna guran distirê li tebeqeyen atmosferê. Mirovahî bi gişt jan û eşen xwe, xwe sipart heyama 21an, çawa ez cîhan bim û nikaribim nexşeyeke welatê nexweş li ser ruyê erdêne xwe bihewînim.

Semîramîs:

- Seyidvanê kurkan, bi pey kurkê kurda dawîn ketin.

Evîn:

- Li konê bextewariyê bagereke erjeng râbû, sîng rakir, kir bafirokeke benqetiyayî, bir, li ser keskesoran siwar kir. Tu masiyeke berîvanî ya pêlên deryayan nedîtî bûyî, bi sura bayan li ser pêlên geniman tu diliviyayî û mezin buyî. Giyana te bû, cixareya di bê de tête kişandin, bê tehm, bê rahm zû buhurî. Emrê te yê eşqê, bû yê minminîkê.

Semîramîs:

- Ji minminîkên destê sibehê re dem, herdem berbang e.

Evîn:

- Her mirineke sipehî jiyan makyaj dikir, te pê dizanîbû. Weke balindeya Zumruda Anka tu dihatî kuştin û tu ji xweliyên xwe dîsa dihatî afirandin. Mirin ji te re tune bû. Lê tu dildarî bi pore te ruyê xwe neşuşt, bi mijangên te xwe nekuşt; tu kes nehate ruyê te, ji bilî leçe-ka te.

Semîramîs:

- Ji guhanêñ kerengan min tahm kiriye qeliya ser sêlan bi salan.

Edî bimirim jî ne xem e.

Sinc:

- Îdî bimire jî ne xem e.

Cîhan:

- Îdî bimire jî ne xem e.

Welat:

- Îdî bimire jî ne xem e.

Evîn: (Jê re xem bû)

- Ax Semîra ax! Çavêñ te ruyê te kûr kolane. Di şer û pevçûnan de, dê ruyê te her li devê deriyê hişê min bixe. Tu serhildaneke bi xwîne hatiye çewisandin î di hudirê min de.

Cîhan:

- De werin îcar xweliyê li serê xwe nekin. Qumitanê qereqolê dê bi temenekî qelew quretiyân bike, Semîra jî bi keçikantiyeke terr dê ji jiyanê biteriqe.

Semîramîs:

- Çiya bêyî jagûarên jakaw bimînin, hingê wawîk bajaran dixwin.

Sinc:

- Heqî û neheqî li gora livandina berê lûla çekê diyar dibe. Agirê dadmendiyê bi arduyê rastiyê her neyê dadan, dê tifika heqiyê her bi ser serê xwediyê xwe dixan bike. Mînêralên di heqîba aşitiyê de, dê bibin berfa li ber tava havînê.

Welat:

- Mejî, bîra çelerîn be jî, dil dewla xwe çawa be, jê tijî dike. Ji lew-re jî divê guh bête dayîn li azana zanînê.

Evîn:

- Di kemînan de te kedî kir kirêtî. Di siya dêliyên stewr de gewri-ya te goşî hewandin. Tu ne welatparezeke platonîk bûyî. Raza veşar-

tî, dibû zingilê stuyê şêran, eşkere dibû. Tu di devê korsanan de di-bûyî benîş, eniya te her bes e bi başî.

Semîramîs:

- Belê, li salona ruh; can, konsera xwe ya dawîn pêşkêşî melkemotan dike, haydar im. Kişwer hertim ahenga seqemê dinehwirîne, haydar im. Bav sibê ro wê li min bê xezebê ji ber ku êdî ne qîz im, haydar im. Lê ey evîn! guhdar be, pörê min tiberk e, piştî mirina min tu ê ta bi ta li dilketiyan belav bikî.

(Xwedê giriya (baranê dest pê kir))

SANHE 2

(Baranê xweş kiriye, tegîn lal bûne, her tişt û her der di bêdengi-yeke betîlî de ye. Bav û qîz tik î tenê ne. Dever xalî, berî. Qurban, qîz; celat, bav; delîl, darê almanî yê di destê bav de.)

Semîramîs:

- Guliyên min ji emrê min direjtir in. Yabo heye biperpitim, ji lewre bi guliyekî min destê min û bi yê din jî lingên min girê bide, bila bi çipiskêñ xwîna min tu edem nebî.

Bav: (bi qahr)

- Top li bedena min bikeve, li min nebe sibe, ev tifinga navgîna getla te, însellah bi min vede, weke marê teyar, cîhan û civak serê xwe bixwe, ez jî ruhê xwe. Xwedîyê xezebê, qesem bi navê xwedê, dê tu xerê ji roj û şevê xwe nebîne.

Semîramîs:

- Te digot tu ê bibî bûkeke xweşik. Çima te nedigot tu ê mahr bikî, gorê û serê lûla tifingê. Semîraya ku te bi serî sûnd dixwar; ji ni-ha û vir ve tu ê bi serê tirba wê sûnd bixwî. Dibe ku hinekan qiza te ji te pirsî, tu ê bibejî "baranan ew xwar, êvaran ew revnad."

Bav:

- Evar û baran bi qurban, xezala bavê xwe, Semîra. (Bav ji kerba dixwest baranê gulebaran bike. Hebêñ baranê li ser hesinê tifingê dibûn dilopêñ gulover û direqisîn. Serê herdu pêşîr û guliyên wê bûne şironek, Semîra di nav dilopêñ baranê de bûyê dilopeke din, bi baranê ve kelijiye û diherike.)

Semîramîs:

- Li ber min mekevê zêdê bavo, salek ji çar werzan pêk tê; bihar, havîn, payiz, zivistan. Di her çaran de jî jiyame. Bi mirina min wê werzeke din li werzan zêdê bibe.

Bav:

- Bi serê baranên te ji wan hez dikir sünd dixwim Semîra. Kî li te bipirse ez ê bibêjim Semîra teyrikeke rengîn bû, dil da, lê da çû zozanan.

Semîramîs:

- Cîhê ez ê lê bême kuştin, dareke hinarê li ser gora xwe dixwazim. Û her pîrekên stewr bila bêñ, paçik û zolekên xwe bi dara min ve girê bidin, ji min qîz û lawan bixwazin. Wê çaxê wê Semîra ji nû ve bi her zarokî re bizê.

Bav: (Difişire)

- Kûpê emir ji dest şemîtî, ket, şikest, roj û şev li erdê belav bû; rê qedîyan, çem gihîştin deryayan.

Semîramîs:

- Bibêje ji şivanan re, bila pez mexel bikin li van deran. Ji hestiyêñ send û çîpêñ min bilûrêñ xwe bikolin û lêxin ji qîzêñ bavan re.

Bav: (Hê jî difişire)

- Dewl qetiya, kete bîrê li hola çolê, find tefiya, mijar qediya, çîrok nema.

Semîramîs:

- Heke diya min miraqa min kir û pirsî “çima nehat delaliya malê”, tu ê bibêjî “mahr kir lawê xalê û bûye kevaniya malê.”

Bav: (Hê jî ne li his e)

- Ma nîşangeh û nîşan! Gulle di hundirê lûlê de betilî can qerimî, xwîn tevizî.

Semîramîs:

- Bila di şevê zivistanan de tu kes çêlî min nekin û min bi bîr neynin. Ji xwe ez ê bi her kuliyyêñ berfê dakevim ser ruyê erdê

Bav:

- Kihêla bav, qey ji te heye ez dê ji ser mezelê te biqetim, ne? Ez ê bi sewalekê dirinde bibim û sîngê werîsê xwe li ber mezelê te biku-tim, bi nobedar bim.

(*Bav pişta xwe daye Semîra, ji bo ku Semîra bireve û ji dest wî bifilite. Lê Semîra, ji cihê xwe nalive. Baran û hêsisîrê bav ji hevdû na-yêñ neqandin. Bi serê çefiya xwe çavêñ xwe paqij dike, bêdeng e, re-ben e.)*

Semîramîs: (Di ber xwe de dibêje)

- Tiştê herî çê, baran dibare.

Bav: (Bêdengiya xwe xera kiriye û bi yezdanê xwe re dikelime).

- Ey xwedê! tu tune yî! Wexta agir bera genimê li ber dirûnê didan jî tu tune bûyî; wexta tevî kerî agir bera malan didan jî tu tune bûyî; wexta jinê ducanî tevî dergûşên xwe dibûn zerîpoşan, dipelçi-qîn jî, tu tune bûyî; wexta kalên heftêsalî bi qontaxêن tivingan perce dikirin jî, tu tune bûyî; wexta mîrov, weke kobay dihatin bi kar anîn jî ji bo testnîşankirina mayinan tu tune bûyî; lê ez jî tune bûm.

Semîramîs: (Kenogirî distirê) - Kevok im lêlêlê!..

w'ez kevok im lêlê!..
kevoka reş im way way...
li ser bana û bin bana
w'ez dimesim way way...
aşiqê lêlê.. çavêñ reş im way way

Bav: (Avêt ber) - Kevok im lêlêlê!..

w'ez kevok im way way...
kevoka şîn im way way...
li ser bana û bin bana
w'ez dixwînim way way...
aşiqê lêlê... çavêñ şîn im way way...

(Stran diqede, bav qutiya xwe ya cixareyê derxistiye, kezeba xwe dixe nav çermê xwe û dipêce, janêñ xwe dikîşîne, ewrêñ dixanê jî de-vê wî derdikeve.)

Bav:

- Xezala ber deriyê malê ya kedîkirî nayê serjêkirin.

Semîramîs:

- Her kes bi qasî êşen xwe dijî. Yêñ êşen wî/wê pir, pir: yêñ êşen wî/wê hindik, hindik dijîn. Hemû emrê cîhanê minbihartiye!..

Bav: ...

(Bav li cihê lê rûniştiye, rabûye, destêñ xwe işk li tivingê şidandîye, kenekî keliyayî li ser ruyê Semîramîsê dest ji bav re kil dike. Nî şangeh û nîşandar amade ne. Her dilopa baranê berî bikeve erdê ji bav re dibêje, naaaa!..

Tiving dilîlinê...

Û teqîn!...

Gulle diçê ji bo binamûsiya Semîramîsê ji eniya wê ve, wê maçî dike).

Emîn Bozan

Roja

kelmizotêñ mirinê
tê ji qirikê Roja
bersîvek tik ï tenê
û dilopek pirs...

nemane Roja
tu ronesansê min!
ez im ê mirî
di binê zemanan
bêr bila ne dirêj bin
tu dizanî Roja!
dest dirêjî ruyê zîwanî
nebûn tu caran
zû erebî hîn bibe Roja!
gişt erebî ne
xatirxwestinêñ ji evîndaran
ez lawlawê muslimanan

min fêm bike Roja!
li gundekî mîratmayî
dewlan bibîne û
bîran bikole ji hêşiran
bila genî nebin Roja
hêviyên xewnê min
av bide Roja, av...


li benda te me Roja!
her êvarê xêran
şekirê qursikî bîne
bo hacûcêñ ser mezelan
pevçûnêñ zarokan
û biherike
xwîn û lîçik
mîna çeman...

rabe Roja!
ez evîna te dikujim
bi kêrî çi tê Roja!
germahiya laşan
wexta herimî xew û
werimîn çavêن bizonek
min nedît
himbêzkirina sîsikan

paç û kiras li xwe ke
bixemilîne hestiyan Roja!
xovendekê li dar xin
da ku jinêن Dêrikî
bi xwe bînin xweziya xwe
ê kor bike axa sar
herdu dilan
êdî biçe Roja!
ser seran ser çavan

"Heta ku ez bi henekên we nekenim, ez nabêjim ez fêrî vî zimanî bûme."

Mustafa Aydogan jî bo Pelînê bí Maykil Çayit re peyivî



Maykil Çayit

Ji Havîna 1987an û vir de ye ku Ens-tîtuya Kurd li Parîsê her ji şeş mehan cárrekê, bi navê "civîna Kurmancî" civîneke heyştrojî amade dike. Di civînan de, ji devokên herêmên Kurdistanê ên cuda, ji nifir û diayan, bêje û termên rêzdariyê, ji ferhengokên klasîkên kurdî û idiomên kurdî bigirin, heta rastnivîsandina kur-mancî, li ser gelek babetan encamên xebatênu ku hatine kirin, wek pêşniyar têr pêşkêş kirin û minaqşekirin. Berhemên her civînê, di rojnameya Kurmanciyê de têr weşandin. Îsal hejmarêne Kurmanciyê ji 1ê heta 20an (Berhemên civînênu ku di

navbera Havîna 1987an û ya 1996an de hatine çekirin), teví ferhengo-ka wan a kurdfî-tirkî-fransizi-îngilizî û endeksên tirkî, fransizi û îngilizî wek pirtûkekê hat weşandin.

Civîna Kurmancî ya vê Biharê a bi navê civîna 25an jî di navbera 27.03.1999- 03.04.1999an de li Swêdê li Bîskops-Arnoyê çêbû. Beşdarênu vê civînê ji herêmên Kurdistanê yên cuda bûn. Yek ji van beşdaran jî Maykil Çayit bû. Di derheqê Maykil de, berê jî di gelek kovar û roj-nameyan de nivîs û hevpeyvîn hatibûn weşandin. Ji ber vê yekê, ez ê li ser jiyana wî tiştekî zêde nebêjim. Lê ez dixwazim bi tenê bibêjim ku Maykil Çayit di Radyoya Dengê Emerîkayê de, redaktorê beşa kurdî ye û yek ji wan sîh (30) zimanênu ku ew pê dizane jî, zimanê kurdî ye.

Beşdarênu civînênu kurmancî di maweya civînan de, li ser gelek pirsên cur bi cur suhbet dikan û bi vî awayî bi fikirêne hevdu dihisin û tesîrê li fikirêne hevdu dikan. Ji dema ku Maykil beşdarî civînan bûye û heta niha, suhbetênu me xweştir û minaqşeyen me rengîntir bûne. Ji bo ku em hevdu baştıra nas bikin û ji fikirêne hevdu fêdê bibînin, civînênu kurmancî hem atmosfereke xweş e û hem jî îmkaneneke pir baş e.

Gava ku Maykil nuh hat nav me, bi henekênu me nedikeniya. Wê ga-vê wî weha digot; "**Heta ku ez bi henekên we nekenim, ez nabêjim ez fêrî vî zimanî bûme.**" Lê di hundurê wextê de, ev rewş hat guhertin. niha êdî Maykil hem bi henekênu me dikene û hem jî ew bi xwe bi kurdî he-

nekan bi me dike. Maykil ne ji ber ku bi tenê kurdologek e, yanî ev kar karê wî ye û ji ber vê yekê, bi kurdî mijûl dibe. Ew digel kurdologbûna xwe, herweha bi kêmanî bi qasî kurdekî dilsoz xema pêşeroja vî zimanî jî dixwe. Ji ber vê yekê, her gaveke erînî ya ber bi ewlekirina pêşeroja kurdî ve tê avêtin, wî pir dilxweş dike û kêfa wî ew qasî pir tê ku nema di dilê wî de hiltê. Wê gavê, kêf û dilxweşîya wî lê dibe bişirandinek, xwe di-de der û wek guleke ku nuh dibişkive, hêdî hêdî xwe li ruyê wî belav dike.

Ligel kapasîteya wî ya entelektuelî, devlikembûn, nermbûn, tolerans û nefispiçûkbûna wî bala me hemuyan ji destpêkê de kişand û bi van xu-sûsiyetan ve atmosfera me ya erînî di demeke kurt de geştit kir. Têkili-yên me -beşdarêن xebata bi navê "Civîna Kurmancî" tê zanîn- û Maykil li gel danûstendinê di pêvajoya civînan de, bi telefon û "e-mail" an û bi şêwirdariya li ser pirsên kurmancî yên cuda, bûne perçeyekî jiyanâ me. Ü ev têkilî bi atmosfera germ a civînan ve her ku diçe me bêtir nê-zîkî hevdû dike.

Ji ber vê yekê, gava Pelînê ji min xwest ku ez li ser hin pirsên zarava-yê kurmancî bi Maykil re hevpeyvînekê bikim û min jî ji bo pêkanîna vê hevpeyvînê têkilî bi wî re danî, em herdu jî têgihîştin ku ji xwe, me ge-lek caran minaşeşeyen weha kirine û loma jî me xwest ji berdêla hev-peyvîneke resmî, em li ser hin pirsên kurmancî- ci piçûk, ci mezin- suh-betekê bikin. Lê tevî vê jî hevpeyvîna li ser navê kovarekê her di bîra me de ma û ji ber vê, divê ez diyar bikim ku em negîhaştin rehetî û serbes-tiya suhbetêن xwe yên civînan.

Her ci qas "pêşeroj" a min û "paşeroj" a wî di suhbetê de li bin guhê hevdû ketin û em dizanin ku ev ê di civata me de, demeke dirêj bê mi-naşeşekirin jî me di dawiyê de ferq kir ku em li ser gelek babetan nêzî-kî hevdû difikirin. Ji ber ku di vê qonaxê de, kurd di warê bikaranîna zi-manê nivîskî de, li awa û rûyên ku bikaribin wan nêzîkî hevdû bikin di-gerin, em herdu jî bi vê yekê kêfxweş bûn.

Bê gûman, di suhbeteke weha de, hemû pirsên hene nikarin bêne mi-naşeşekirin. Me li ser hin ji wan pirsên hene suhbet kir. Hûn ê jî bibînin ku me di vê suhbetê de, ne li ser pirseke taybetî bi tenê, lê li ser çend pirsên ku tesbît kiribûn suhbeta xwe kir.

Me xwest em di beşê yekem de, li ser rewşa kurdî, gefen li pêşeroja wî têن xwarin û perspektivê ji bo lêbixwedîderketineke xurt bisekinin. Di beşa duyem de jî hin pirsên rîzimanî û rastnivîsandinê, nemaze hin ji wan pirsên ku di nivîsandina kurmancî de têن îhmalkirin, bûn mijarêن suhbetê. Lê tevî vê jî carinan sînorêن beşan tev li hevdû bûn. Hêviya me ew e ku suhbetêن wilo dê berdewam bin û hercarê li ser pirsên cuda bê-ne kirin.

Bi hêviya ku suhbeta me bi kêrî xwendevanêن Pelînê bê...

Mustafa Aydogan


Zimanê ku zarok pê nepeyivin, zimanekî bêpaşeroj e.

Maykil Çayit

Mustafa Aydogan: Kek Maykil, wek tu jî pir baş pê dizanî ku iro kurmancî di qonaxeke xeter de ye. Ev xeter bi imkanên pêşveçûnên teknolojiya informasyonê mezintir bûye. Ji ber vê yekê, imkanên asî-mîlasyonê li gora demên dîrokê yên berê, bi awayekî nedîti pirtir û bi tesîrtir bûne. Ji aliyekî ve, siyaseta înkarkirin û tunekirinê li welatê me, bi hemû şideta xwe ve di rojevê de ye. Ji aliyê din ve, tevî hin ga-vênu ku hêviyê bi mirovî re çedikin jî misteweya lêbixwedîderketina kurmancî û ya parastina li hemberî xusûsiyetên ku mirov ji hebûna mirovî bi dûr dixin, têrê nakin.

Ji xwe, misteweya xwendina bi giştî -her bi ci zimanî be jî- ne tet-mînkar e. Tew rewşa xwendina bi kurmancî ji vê jî xerabtir e.

Maykil, me gelek caran minaşe kiriye, lê ez niha dixwazim ji bo xwendevanên Pelînê ji te bipirsim. Gelo tu ligel xusûsiyetên vê pêva-



joyê, pêşeroja vî zimanê ku bi her awayî tê tehdîtkirin, çawa dibînî?


Mustafa Aydogan û Maykil Çayit

Maykil Çayit: Beriya hemî tiştî, ez dixwazim diyar bikim ku tiştên ez ê niha bibêjim, dîtinên min in, ne dîtinên Dengê Emerîkayê ne. Ez paşeroja vî zimanî çawa dibînim? Weleh, ez geşbîn im, ez reşbîn nî-nim. Yanî ez optimîst im.

Mustafa Aydogan: Kurmancîaxêv di dema me de, ji bo vê gotinê, bêtir gotina "xweşbîn"ê bi kar tînin.

Maykil Çayit: Belê. Geşbîn, yanî xweşbîn. Ji bo min, gelek tişt hâ-tine guhertin. Di pêvajoya van deh salên bihurî de, min çend guher-tinên dîlxweşker dîtin. niha gelek kurd li zimanê xwe bi xwedî der-dikevin û zimanê xwe wek perçeyekî ji nasnameya xwe dibînin. Mirovên ku berê digot, karê min bi vî zimanî nîne, êdî niha dibêje; ez dixwazim hînî kurmancî bibim, zarokê min jî divê hînî zimanê xwe

bibin. Ji ber vê yekê, divê berê, ez hînî kurmancî bibim, da ku ez bi-karibim dû re zarokên xwe jî hînî zimanê xwe bikim. Prestîja zimanê kurdî jî bilindir bûye. Belkî, ev ji ber wê ye ku niha televîzyon û radyo bi zimanê kurdî hene. Hem li Ewrûpayê û hem jî li Emerîkayê piştevanî heye. Bo nimûne; piştevaniya vî zimanî ya ji aliyê dewleta Emerîkî tiştekî kêm nîne. Ez ditirsim, piraniya kurdên Bakur nizanibin ku Dengê Emerîkayê herroj saetekê bi kurdî weşanê dike. Ev çar sal in ku ez li wira kar dikim, lê heta niha, ji kurdên Tirkîyeyê belkî sê name gihîştine me. Lê dîsa jî ez van guhertinê hanê, wek gavê ber bi parastina paşeroja vî zimanî dibînim. Bêguman, pirsgirêkên kevin her mane. Lê tevî vê jî ez dikarim bibêjim ku helwestên kurdan li hemberî kurmancî bi awayekî erînî, yanî bi awayekî pozitîv tênguhertin. Ji ber vê yekê, ez dibêjim; ev guhertinê hanê yên ku di helwestên kurdan de çêbûne, min dilxweşker dikin. ï berî pênc salan, ya jî berî dehsalan tiştekî wisa, ne dihat bîra min.



Mustafa Aydogan

Mustafa Aydogan: Ji derveyî van sedemên ku te diyar kirin, tu sedemin din jî hene ku dihêlin, mirovekî wek te yê ku bi zimên ew qasî mijul e, tevî vê jî ne reşbîn, lê xweşbîn be.

Maykil Çayit: niha bi zimanê kurdî gerek kitêb têne çapkîrin û weşandin. Tevî vê yekê, hejmara xwendevanan hê jî gelekî kêm e. Ev pirsgirêkeke gelekî mezin e û divê em çareseriyeke jê re peyda bikin. Divê em kurdan pal bidin ku ew hîn bibin bi zimanê xwe binivîsinin û bixwînin. Ev tiştekî gelek girîng e. Ji ber ku bi sedan kitêbên nuh têne weşandin. Eger li dînyayê, sîh û pênc milyon kurd hebin û hejmara kurmancîaxêvên ku van kitêban dixwînin ji hezarî kêmter be, ev hejmareke gelek kêm e û dilxweşker nîne. Lê ez gelek hêvîdar im ku niha li nik kurdan, daxwaz peyda bûye ku hînî nivîsin û xwendina zimanê kurdî bibin.

Mustafa Aydogan: Gava tu pêlên asîmîlasyona îro, bidî ber demên dîrokê yên berê, tu di navbera wan de, ci ferqê dibînî?

Maykil Çayit: Weleh, guhertin çêbûye. Ez dibêjim niha gelek kurd bi şanazî dibêjin, ez kurd im. Berî deh salan, gelek kurdan nedixwest eşkerê bikin ku ew kurd in. Wan digot, ez ji Sûriyeyê me, ez ji Tirkîyeyê me. Yanî eger ez ne tirk bim jî ez ji Tirkîyeyê me.

Mustafa Aydogan: Li gora ku xuya dibe, rewş pir nazik e. Tevî pê-

lên asîmîlasyonâ ku ji her alîyî ve bi ser kurdan de têñ jî, ji ber wan sedemêñ ku te anîn zimêñ û wan xusûsiyetêñ ku hêdî hêdî bi kurdan re çêdibin, tu xweşbîñâ.

Maykil Çayit: Belê. Tevî ku ev xusûsiyet hêdî hêdî çêdibin jî, hêviyê didin min û ji ber vê yekê, ez dikarim bibêjim ku ez xweşbîñ im.

Mustafa Aydogan: Gelo ji bo ku kurd bi awayekî hîn xurttir li zimanê xwe bi xwedî derkevin û van xûsûsiyetêñ xwe yên ku hêviyê didin te, pêşdetir bibin, divê ci bikin, ci guhertinan di helwestêñ xwe de çê bikin û ji îro û pê ve bi ci awayî hereket bikin?

Maykil Çayit: Berî hemî tiştî, ên ku têne bîra min ev in; divê ku haya wan ji vejandina zimanêñ din hebe. Bo nimûne; zimanê ibrî. Di vî sedsalî de bi qasî du hezar salan zimanê ibrî, yanî zimanê cihuyan zimanekî mirî bû. Bi tenê zimanekî diayan bû. Zimanê axavtinê nebû. Lê îro zimanê ibrî, ne bi tenê vejiyaye, herweha zimanê hikûme ta Îsraîlê ye, zimanê sistêma-perwerdekirinê ye jî. Gelek rojname û kitêb hene, gelek xwendingeh hene ku zimanê wan ê fermî zimanê ibrî ye. Zimanê ibrî îro, zimanekî nûjen e. Ev ji sedî sed weha ye. Yanî her tiştê ku mirov bi îngilîzî bibêje, tiştêñ li ser zanyariyê, li ser rojnamevaniyê, li ser dîrokê, li ser zimanzaniyê, mirov dikare bi rehetî bi zimanê ibrî bibêje. Berî pêncî salan, ev tişt di destpêkê de bû. Ji ber ku emrê dewleta Îsraîlê pêncî sal e. Lê ev tişt bi gelek salan berî damezrandina dewleta Îsraîlê çêbûye û ez dibêjim ku divê kurd ji nêzîk ve lêkolînan li ser wê pêvajoyê û wê rewşê bikin. Ji aliyekî din ve, divê ku haya wan ji ihtîmalêñ herî xerab jî hebe. Eger ew helwesta xwe neguherin dê ci bibe? Wek mînak li Emerîkayê "emerîkiyêñ resen" hene. Bi tirkî ji wan re dibêjin; "Kizilderililer". Lê ew bi xwe naxwazin ku em ji wan re bibêjin, "çermîsor". Vê gavê, ez rêz û rûmeta daxwaza wan digirim û ez ji bo wan dibêjim; "emerîkiyêñ resen". Bi îngilîzî dibêjin; "native american". Gelek ji zimanêñ wan nemane. Be-rî sed salan, bi hezaran kes hebûn ku bi filan zimanî diaxivtin, piştî hingî bûn bi sedan, bi dehan. Piştî hingî bû yek û piştî ku ew yek jî mir, ziman jî digel wî mir. Gelo em dixwazin tiştekî weha bê serê zimanê kurdî jî? niha piştî valabûna gelek gundêñ Kurdistanâ Tirkîyeyê, gelek gundî mecbûr bûn birevin û herin bajarêñ mezin ên rojava-yê Tirkîyeyê. Gelek guvaştin û sengî li ser wan hene ku ew xwe asîmîle bikin, yanî xwe di nav civaka Tirkîyeyê de bibişêvin. Eger ew zû hişyar nebin, bi lez bizavê nekin û rê li ber wendabûna zimanê kurdî negirin, di nav deh salan de, eynî tişt mimkin e ku li ber çavêñ me, bê serê zimanê kurdî jî.

Mustafa Aydogan: Ji bo vê yekê, divê metodeke çawa bê bikaranîn?

Yanî, divê kurd çawa bikin? Gelek kes hene ku dixwazin li zimanê xwe bi xwedî derkevin û rê li ber wendabûnê bigirin, belkî rêtê lêbixwedîderketinê, metodê xweparastinê ji bo wan pir ne diyar in. Di vî warî de, belkî gelek kes hebin ku nizanin, bê divê mirov çawa bike.

Maykil Çayit: Gelek tişt hene ku mirov dikare bike. Divê ku mikov bi zarokên xwe li malê bi tenê bi kurdî bi peyive. Bi tenê bi kurdî! Ez nikarim ji te re bibêjim ku çend hevalên min ên kurd ên welat-parêz û neteweperwer hene ku li xwe mikur têr ku zarokên wan bi xwe bi kurdî baş nizanin. Yanî filankes bi jina xwe re bi kurdî dipeyive, lê gava bi zarokê xwe re dipeyive, bi tirkî dipeyive. Ev yek, li ser hebûn û paşeroja zimanê kurdî gefeke gelek mezin pêk tîne. Dirûşma min ev e: Zimanê ku zarok pê nepeyivin, zimanekî bêpaşeroj e. Li dawiyê, ez ê bibêjim ku parastina zimanê kurdî ne li ser hikûmeta Tirkîyeyê, ne li ser hikûmeta Emerîkayê, ne li hikûmeta Sûriyeyê, ne li ser ya Iraqê û ne jî li ser ya İranê falan dimîne. Li ser kurdan bi xwe dimîne. Eger kurd dixwazin zimanê xwe biparêzin, ev yek di destê wan de ye. Her roj, her gava ku ew devê xwe vedikin, ew dikarin zimanê kurdî bi kar bînin, nemaze di perwerdekirina zarokên xwe de. Yan jî ew dikarin rêteke hêsanter bigirin ku dê wan ne bi tenê ji paşeroja wan, lê herweha ji boriya wan jî bi dûr bixîne, Ev yek tiştekî wisa ye ku divê ku her kurd ji bo xwe hilbijêre, ji bo xwe biryarê bide, ka ew dixwaze ci bike. Radyoya Dengê Emerîkayê, çend kanalên televîzyonê hene. Lê ne ku ev bi tenê, kurd li hemî deverên Tirkîyê, nemaze li Tirkîyeyê lê li gelek deverên Iraq, İran, û Sûriyê jî hene. Kurd dikarin bi hev du re bi zimanê xwe bi peyive. Ez dibêjim; li Tirkîyeyê kujek nemaye ku kurd lê nebin, vêca mirov gava ku solên xwe pêlavên xwe dide boyaxkirin, dikare bi kurdî bi peyive. Gava mirov ji bo ku tiştekî bikire, dihere dikanê - însaleh cixareyê nekire, lê tişten saxlemtir bikire- dikare bi kurdî bi peyive.

Mustafa Aydogan: Xuya ye, tu ne bi tenê di taswasa zimanê kurdî de yî, herweha di taswasa siheta kurdan de yî jî.

Maykil Çayit: Belê. Gava ew ji bo kirîna tiştan diciñ dikanê, dikarin bi kurdî bi peyivîn û kirîna xwe bi kurdî bikin. Divê ku mirov şanaziya xwe bi zimanê xwe nîşan bide. Berî hemî tiştî, divê ku mirov vê şanaziyê, vê serfiraziyê û vê serbilindiyê di dilê xwe de his bike.

Mustafa Aydogan: Ne xwe, divê kurd beriya her zimanî, bi kurdî bixwîne, bi kurdî binivîsîne, bi kurdî bifikire û fikirêñ xwe bi kurdî bîne zimên. Ev niqteya herî girîng e. Ji axavtina jî diyar e ku di vê qanaxê de û di vî warî de, ihmalkariya herî piçûk, pêşeroja vî zimanî di-

xe talûkeyê. Ji ber vê yekê, ger bi dilê te jî be, ka em ji wê niqteyê herket bikin ku kurd dê li gora balkêşî û pêşniyarên te li zimanê xwe bi xwedî derkevin û ji ber vê yekê jî em ê suhbeta xwe li ser rast bikaranîna zimên û hin şâsiyên di vî warî de, yêñ bérbiçav, bidomînin.

Wek tu jî dizanî ku mirov di suhbeteke weha de nikare li ser heritişte di dil de heye, bipeyive. Lê ji van çend hene ku girîng in û di pêvajoya îro de, ji aliyê bikaranîna zimên ve balkêş in. Li ser gelek şâsiyên di nivîsên bi kurdî de, me gelek caran suhbet kiriye. Lê ger tu bixwazî, bi qasî ku di çarçoveya vê suhbetê de hilê, em piçekî li ser çend şâsiyên ji wan şâsiyan bisekinin û hewil bidin ku qaîdeyên di vî warî de hene, diyar bikin.

Maykil Çayit: Berî hemî tiştî, ez dixwazim bibêjim ku li gora min, divê kurdên Tirkiyeyê itîraf bikin, qebûl bikin ku bê çend di bin tesîra zimanê tirkî de ne. Gelek kes naxwazin vê yekê eşkere bikin. Loma jî încar dikin û dibêjin; na, ev pûç e. Lê ez dibêjim; na, ev ne pûç e. Gava em kovar, rojname û kitêbên ku heta niha hatine çapkîn dixwînin, em dibînin ku peyiv, hevok û struktur yekser ji zimanê tirkî hatine wergirtin. Ez jî dizanim û tu jî dizanî ku bi kurmancî peyveke çêtir heye. Ev delîleke gelek li ber çav e ku ev kurdên hanê ne bi kurdî, lê belkî bi zimanekî din, bi zimanê tirkî difikirin. Ji aliyekî ve, em dikarin bibêjin, ev tiştekî xwezayî ye, tiştekî tebîî ye. Lê ji aliyê din ve, divê ku em fêm bikin, bê talûke û xeterên vê yekê ci ne. Eger kurdên Tirkiyê dixwazin ku kurdên Sûriyê, ên Iraqê, ên Iranê û ên Ermenîstanê ji zimanê wan fêm bikin, divê ku em bi zimanekî kurdî yê wisa bipeyivin û binivîsin, da ku kurdên welatên din bikaribin bi hêsanî tê bigihêjin. Ji ber ku kurdên Sûriyeyê, Iraqê, Iranê û Ermenîstanê bi tirkî nizanin, eger kurdên Tirkiyeyê dê peyvîn ji tirkî wer-gerandî bi kar bînin, wek mînak; kurdên Iraqê fêm nakin.

Mustafa Aydogan: Yanî di warê hilbijartina gotinan de, divê mirov hîn bêtir bi hûrbijarî hereket bike. Û berî ku mirovên kurd hawara xwe bibin zimanên biyanî, divê xwe li devokên kurmancî yênda bigirin û di warê peyvan de ji xizneya zimanê xwe istifade bikin.

Maykil Çayit: Belê. Bes berî hemî tiştî, divê ku hayê mirov ji vê fenomenê, ji vê diyardeyê hebe. Û ez dibêjim piraniya kurdên îro nizanin, agahdar nînin ku ew vê yekê dikin. Ez dibêjim, gelek kurdên ku zimanê kurdî di xwendingehê de ne xwendibin, hay jê nîne ku zimanê wan ê perwedekirinê tirkî ye û ew bi tirkî difikirin û gava ku ew hevokan dadirêjin, darêştina wan, ya kurdî nîne, ya biyanî ye. Belkî ji zimanê tirkî ye. Û tiştekî xerabtir jî ev e ku mirovê ciwan, belkî nizanin ku di wextê

xwe de, rêyeke din hebû ku mirov van tiştan bîne zimên yan diyar bi-ke. Dê û bavêن wan dapîr û bapîrêن wan belkî hê jî ji van tiştan agah-dar in. Divê ku em rêza dapîr û bapîrêن xwe bigirin û ji bo parastina van tiştan, wan wek jêderekî herî girîng bibînin. Digel wan bi awayekî çeleng bipeyivin û fikirêن wan û peyvêن wan bipirsin û tomar jî bikin.

Mustafa Aydogan: Pir eşkere ye ku gelek ji kurdêن ku bi kurdî dî-nivîsînin, îmkanêن dewlemendiya vokabulara kurdî bi qasî ku tê xwestin, nikarin bi kar bînin. Gava misteweya zanîna wan a şexsî di vî warî de têrê nake, gelek caran ew ne di misteweya xwe de, lê di zi-mêñ de, li kêmanîyan digerin. Teşhîsa şaş rê li ber çareserkirineke rast digire û ji ber vê yekê, rêya herî hêsan tê hilbijartın. Loma jî di-vê mirov ji bo bikaranîneke bi rêkûpêktir hin pêşniyarêن rênîsander pêşkêş bike.

Maykil Çayit: Eger ew bikaribin nivîsarêن nivîskarêن mezin bix-wînîn û li gora uslûbêن wan binivîsînin, dê pir bi fêde be. Yanî ger mirov nivîskarêن weha ji bo uslûba nivîsîna xwe jî bike mînak, ev yek dê gelek baş be. Wek mînak; Erebê şemo. Herçend e ku esla wê wenda bûye û ya iro di destê me de, wergerandineke ji wergera rûsî ya ku ji wergera eslî ya kurdî be jî.

Mustafa Aydogan: Şivanê Kurd?

Maykil Çayit: Belê, Şivanê Kurd. Gelek ji nivîsarêن kurdan li Sû-riyê û li Ermenîstanê berdewam bi zimanê xwe dînivîsînin. Dîsa jî ez nabêjim ku nivîskarêن baş ji Kurdistana Tîrkiyê derneketine. Ni-vîskar hene. Kovar jî hene, wek Nûdem, Çira, Berbang û Pelîn bi xwe û hwd. Lê ez nikarim bibêjim ku hemî nivîskarêن ku ji bo wan kova-ran dînivîsînin, mînakêن baş pêk tînin. Gava ku mirov dînivîse û ga-va ku mirov dîpeyive divê ku mirov hîzir bike, divê ku mirov bifiki-re: "Gelo ev tiştêن ku min anîha gotin, li bin tesîra zimanekî din in, an na". Divê mirov haydar be ku ihtîmalek heye, ez ji eslê zimanê xwe bi dûr ketibim.

Mustafa Aydogan: Tu dizanî ku di gelek minaqeşeyêن li ser zayen-da gotinan de, gelek kes dibêjin ku ev pirs ne pir muhîm e. Li gora ku ew dibêjin; a muhîm ev e ku mirov bi zimanê xwe bîpeyive û fikirêن xwe bi zimanê bîne zimên. Ü herweha li gora idîaya wan, pêvajo weha diyar dike ku nêr û mêtîya di kurmancî de heye, ber bi rabûnê ve diçê. Ji ber vê yekê, ew girîngiyeke bi qasî ku tê xwestin, nadîn ferqa navbera nêr û mêtîya gotinan. Hin dibêjin; ev ne tiştekî ew qasî girîng e ku divê mirov serê xwe pê biêşîne. Gelo tu li ser vê yekê çi difikirî?

Maykil Çayit: Bi dîtina min, ev yek kifş e. Zimanê kurmancî zimanekî wisa ye ku hemî navên tê de, yan nêr in, yan mê ne. Zimanê tirkî wisa nîne. Zimanê tirkî ji xwe, ne zimanekî Hindo û Ewrûpayî ye. Di piraniya zimanên Hindo û Ewrûpayî de, ev diyardeya hanê heye. Bi elmanî heye, bi fransî heye, bi rûsî heye, bi yûnanî heye, bi latînî hebû, bi sanskrîtî hebû. Bi zimanên Hindistanê yên nûjen wek hindî, li Pakistanê û Bengladeşê jî heye. Bi kurmancî û dimilî jî û heta bi hewramî jî her maye, heye. Mirov nikare bibêje; "**desta min**". Ev çewt e, ne rast e. Ji ber ku peyva "**dest**" nêr e. An "**keçikekî xweşik**" çenabe. Ji ber ku bi qasî ku ez dizanim "**keçik**" mê ne. Ev ji ber wê yekê ye ku tesîra zimanekî din li ser kurdî heye. Ev jî saxlemiya zimanê kurdî dixe xeterê.

Mustafa Aydogan: Di avakirina atrîbutan de pirseke din heye ku bi zayendê ve elaqadar e. Gava ku mirov gotinekê bi gotineke din ve girê dide, li gora zayendeyê dîtewîne.

Maykil Çayit: Ez dibêjim, ger tu di vî warî de, çend mînakan bide, dê bêtir zelal bibe.

Mustafa Aydogan: Ger ez gotina "**komele**" yê wek mînak hilbijêrim, ez ê bibêjim; "**komeleya me**". Ev di gotina "**rojname**" yê de, bo nimûne; "**rojnameya min**" û di a "**bername**" yê de jî "**bernameya min**" e. Wek ku tu jî dizanî, di nivîsandina kurdî de gelek kes leksemê wek bingeh wernagirin, di avakirina atrîbutan de, vokala leksemê (lexem) ya dawiyê dixwin. Bo nimûne: Ji berdêla "**komeleya min**", "**komela min**"; ji berdêla "**rojnameya min**" jî "**rojnama min**" tê nivîsandin. Li gora te, divê mirov di vî warî de, çi wek bingeh werbigire?

Maykil Çayit: Zimanê kurdî zimanekî wisa ye ku ji develekê hehta devereke din, tiştên wisa tênguhertin. Ez nikarim bibêjime te ku yek ji wan rast e û yek ji wan ne rast e. Li hin deveran, wek mînak li Hekariyan û li Behdînanê li Kurdistanâ Iraqê, wek qanûn, ew ê bibêjin; "**bername min**", "**rojnama te**", "**komela wî**". Ew nabêjin; "**bernameya min**", "**rojnameya te**". Lê li Bakur, bi giştî dibêjin, "**bernameya min**", "**rojnameya min**". Divê ku mirov biryarê bide, bê mirov ji bo standardkirina zimên dixwaze kîjan deverê wek bingeh werbigire. Di vê qonaxê de, bi dîtina min ew qasî girîng nîne. A ji bo min girîng ew e ku gotina "**bername**" yê wek navekî nêr bi kar neyê. Bila mê be, wê gavê ger ji bo wî rehettir be, li şûna "**bernameya min**" bila bibêje; "**bername min**".

Mustafa Aydogan: Baş e, gelo wê gavê, di vî warî de, ji aliyê analîza morfeman ve problem dernakeve?

Maykil Çayit: Ez tê digihêjim, bê mebesta te bi vê çi ye. Eger mirov peyva "rojnama nû" bibîne, em weha bihesibînin ku mirov nizanibe, bê ka peyva esası "rojnam" e, an "rojname" ye, wê gavê awa-yê nivîsandina wek "rojnama nû" dê ji bo zanîna forma bingehîn alî-kariyê pê neke. Gelo forma bingehîn "rojnam" e, an "rojname"? Yanî sînorê navbera morfem û ïzafeyê ne xuya ye. Ez dikarim bibêjim ku ez çi bi kar tînim. Ez bi xwe ji bo herdu nimûneyan, forma "ber-nameya min" û ya "rojnameya nû" bi kar tînim.

Mustafa Aydogan: Te di nav axavtina xwe de, tiştin li ser syntak-sê, hevoksaziyê jî gotin. Di hevoksaziya ku iro di tekstan de diyar di-be, gelek caran tesîra zimanên din xuya dibe. Gotin di nivîsan de, bi awayekî weha li dû hevdu têr rêzkirin ku awayê rêzkirinê ne li gora hevoksaziya kurdî ye. Bi vî awayî, ji hevoksaziya kurmancî bi dûr di-keve. Gelo li gora te, divê kurdêñ bi kurdî dinivîsînin, çi bikin, di çi de israr bikin? Gelo ev ji aliyê bi kurdî fikirandinê ve, xeterek e, an na?

Maykil Çayit: Ez dibêjim ku ev xetereke mezin e. Eger xwendin-gehek, yanî sîstemeke standardkirî hebûya û hemû kurd xwendiyêñ eyînî pêzanînan bûna, ev yek dê gelek alîkar bûya. Lê di eynî wextê de, ez naxwazim ku kurd kor korane hemû jêder û kitêbêñ ku heta niha hatine çapkirin wek Qur'an, yan Tewratê qebûl bikin û bêyî ku binirxînin, lê bikolin, yan pirsîyanan li ser wan bikin, li dû wan biçin. Bo mînak; rêzimana Lescot û Celadet Bedirxan kitêbeke gelek girîng e. Lê ew kitêba hanê di destpêka vê sedsalê de hatibû nivîsandin. R. Lescot bi xwe kurd nîne. Ev zimanê wî yê zîkmakî nîne. Celadet Be-dirxan jî ez dibêjim li Stenbûlê mezin bûye. Lê dibe ku gelek tiştêñ ku wan wê gavê gotibûn, iro cîhê minaçeşekirinê bin. Zimanê kurdî zi-manekî gelek dewlemend e û zimanekî gelek balkêş e. Ez dixwazim xwendevanan pal bidim ku ew bala xwe bidin zimanê xwe û zimanê kurdêñ deverên din û li ser dewlemendiya vî zimanî, kevnahiya vî zi-manî bisekinin. Ji ber ku ev tiştêñ hanê di rastiyê de, ji bo hemû kur-dan cîhê serfiraziyê ne, cîhê şanaziyê ne.

Mustafa Aydogan: Ger tu bixwazî, em ê bêñ ser pirseke ji wan pir-sêñ bingehîn ku iro jî di civata kurd de di nav kesêñ ku bi kurdî di-nivîsîne de, bi awayekî xurt tê minaçeşekirin. Di vî warî de, fikirêñ cuda hene. Ew jî pirsâ ergatîvî ye. Li ser vê pirsê, gelek kes ji devokê gundê xwe hereket dike û li ser wê bingehê dixwaze bipeyive û bini-vîsîne. Di civîna kurmancî de, te bi xwe jî li ser vê pirsê tiştek amade kiribû ku di hejmara Kurmanciyê ya 24an de hat weşandin. Ji ber vê

yekê ez dixwazim ji te bipirsim; ji bo ci te berî hertiştî xwest di warê ergatîvê de, tiştekî amade bike û pêşkêşî civîna kurmancî bike? Girîngiya vê ji bo te tê ci mahneyê?

Maykil Çayit: Ji ber ku ev yek ji berbiçavtirîn delîl an belgeyên te-sîra zimanê biyanî li ser zimanê kurdî yê iro ye. Çima em dibêjin "**Ez hatim**" lê "**Min dît**"? Em nabêjin "**Ez dîtim**" û em nabêjin "**Min hat**". Çima em dibêjin "**Tu çûyi**", lê "**Te girt**"? Em nabêjin "**Tu git-tî**" û nabêjin "**Te çû**". Çima di zimanê kurdî de û di rastiyê de, di zimanê Îranî de, di zimanê Arî de bi giştî -ji bilî zimanê farisî ku berê bi sedan salan ev cudahiya hanê wenda kiribû- ev yek heye? Di navbera lêkerên transîtîv û lêkerên intrânsîtîv de ferqeke gelek mezin heye. Ev cudahiya hanê ya navbera lêkerên transîtîv û intrânsîtîv ji xusûsiyetên zimanê Îranî, zimanê Arî ye. Bi dimilî an zazakî hê jî heye, heta bi soranî jî hê heye.

Mirov dibêje:

Ez hatim

Tu hatî

Ew hat

Em hatin

Hûn hatin

Ew hatin

Ev lêkereke intrânsîtîv a tipik e.

Lêkerên wek çûn, revîn û kenîn jî weha ne. Lê gava ku objekt (bi tirkî nesne) hebe, em bi awayekî din ditewînin. **Îro ez sêvekê dixwim**. "**Ez**", subjekt e. "**Sêvekê**" objekt e. "**Dixwim**" jî lêker e. Ne wisa? niha di dema bîhûrî de, "ez" dibe "**min**", "**sêvekê**" dibe "**sêvek**" û "**dixwim**" dibe "**xwar**". Lê divê ku "**xwar**" li gora objektê bête tewandin, ne ku li gora subjektê. Vêca em ê ci bibêjin? Em ê bibêjin; "**Min sêvek xwar**". Bi awayekî dîrokî, mebest pê ev e; ji aliye min ve sêvek hat xwarin. Eger ez pirxur bim, belkî ez ê ji sêvekê zêdetir bixwim. Îro em ê bibêjin "**Ez du sêvan dixwim**. **Ez sê sêvan dixwim**". "**Sêv**" dibe "**sêvan**". Lê di dema bîhûrî de, dîsa em ê bibêjin; "**Min du sêv xwarin**". Ne ku "**Min du sêvan xwar**" ku li gora syntaksa tirkî ye. Lê li gora syntaksa kurdî, divê ku "**xwar**" an "**xwarin**" li gora objektê, bête tewandin. Ji ber ku eger em bi awayekî dîrokî li vê yekê binihêrin, me'na ev e: Ji aliye min ve du sêv hatin xwarin.

Mustafa Aydogan: Wek tu dizanî, ev tevlihevî bêtir gava di dema bîhûrî ya lêkerên transîtîv de, kesê sêyem plural, yanî "**wan**" wek subjekt bi kar bê, çedibe. Di nivîsan de, ew tiştên ku mirov ji sedî sed

jê ewle bin, dibilin mijarê rexneyê. Ji ber vê yekê, ez dibêjim; ev pirseke me ya girîng e.

Wek te bi xwe jî got; lêkerên transîtîv di demabihurî de, li gora subjektê natewin. Ji ber ku di vî halî de, subjekt ji grûpa tewandî tê hilbijartin û lêker tu carî xwe li gora perçeyên hevokê ên tewandî natewîne. Lêker di halê weha de, li gora objektê, objekta netewandî formê werdigire. Yanî ez dibêjim; lêker ji bo formwergirtinê, di hevokeke kurdî de, li beşa netewandî digere û ew li ku peyda kir, li gora wê şikil dide xwe. Ger tu bala xwe bidiyê, di demabihurî ya lêkerên transîtîv de, objekt hertim ne netewandî ye. Ji ber ku objektek heye ku di kurmancî de -bi hemû lêkeran re û ji bo hemû deman- hertim tewandî ye. Loma divê em vê niqteyê piçekî din zelal bikin. Wek min got; di hin halan de, di demabihurî ya lêkerên transîtîv de, hin sedem çêdibin ku objekt bi xwe jî divê bitewe. (*Qesda min jî û ya te jî li vira ne objekta datîv e. Ji ber ku ji xwe, min berê jî got ku ew di kurmancî de hertim tewandî ye.*) Bo nimûne; ger prepozisyonek, yanî daçekek jî bê pêsiya navderekê, wê gavê divê ew navdêr bitewe. Ji ber vê yekê, di halê weha de, lêker forma xwe li gora yekhejmariyê di guhêre. Gava ku em bibêjin; "**Min du mirov dîtin**", lêkera "**dîtin**" ê li gora objekta netewandî, yanî li gora gotina "du mirov" forma xwe digire. Lê gava sedem çêbû û objekt hat tewandin, wek "**Min li du mirovan xist**", wê gavê lêker di peydakirina beşê hevokê yê netewandî de, li beşekî rast nayê ku xwe li gora wî biguherîne. Lê di pirtûka Lescot û Celadet Bedirxan de, herdu sedemên ku têni diyarkirin, bi subjektê ve elaqadar in û ji ber vê yekê, destûra ji vê qaîdeyê bidûrketinê tê dayin. Gelek kesen ku ji berê de, vê yekê şaş bi kar tînin, gava di vî warî de pirtûka Lescot û Celadet Bedirxanî dixwînin, tiştên di wira de hene, wek argûmentên xweparastinê bi kar tînin û di nivîsandina bi wî awayî de israrê dikan.

Maykil Çayit: Ev rast e. Wekî din jî divê ez bibêjim; cihê daxê ye ku mirov dikare ji Kemal Badillî jî nimûneyên şaş peyda bike. Ew dibêje; "**Min dêr şikenand**". Ev ne rast e. Divê mirov bibêje; "**Min dar şikenand**". Hem "**min**" û hem jî "**dêr**" bi hevdu re nabin. "**Ez**" dibe "**min**" û "**dar**" jî dibe "**dêr**". Weha çenabe. Di halê weha de, yanî di demabihurî ya lêkerên transîtîv de, gava ku subjekt û objekt bi hevdu re hebin, mirov nikare herdulan bi hevdu re bitewîne. Ji derveyî sedema ku bîstikeke berê, te jî behs kir ku prepozisyon tesîrê li objektê bike, ev yek wisa ye.

Mustafa Aydogan: Min xwest tu bêtir li ser wan hevokan rawestî

ku "wan" subjekta wan e. Bo nimûne; "**Xwarin xwarin**", "**Ji min re tiştek gotin**" nimûneyên weha rast in, an na? Gelo rast e ku mirov di van halan de "**wan**"ê bi kar nîne? Ez dixwazim nimûneyeke din jî bîdim: "**Min sêvek xwar**" û "**Deh hezar kesan jî sêvek xwar**". Tu jî pê dizanî ku di gelek nivîsan de, "**Deh hezar kesan sêvek xwarin**" jî tê nivîsandin.

Maykil Çayit: Belê, ez dizanim. Ji bo çi mirov "**wan**"ê bi kar nayne? Divê mirov wê bi kar bîne. Ger mirov "**wan**"ê bi kar neyne, ez dibêjim ku ev nimûneyeke fikirandina bi tirkî ye. Ev ji bo zimanê kurdî tiştekî tebîî nîne. "**Wan sêvek xwar**" a rast e. "**Wan sêvekê xwarin**", yan "**Sêvekê xwarin**" çenabe. Yanî li vê derê, hem subjekt tewandî ye û hem jî objekt. Bi dîtina min, ev li ser zimanê kurdî gefa herî mezin e. Lê dîsa ez dixwazim vê yekê zelal bikim ku ez li vira behsa zimanê nivîskî, zimanê standardkirî dikim. Eger mirov di axavtina xwe ya rojane de, wisa bi kar bîne, li gora dîtina min, em nikarin mirovan mecbûr bikin ku zimanê xwe yê axavtinê biguhêrin. Ev ji qeweta me der e jî. Eger ev taybetmendiyên devoka wan be, bo min a girîng ew e ku zimanê kurdî wek zimanekî zindî bimîne. Ez naxwazim, ji bo serrastkirina tiştên wisa bi awayekî nebûyî hewil bidim. Ji ber ku çenabe. Ez dibêjim; ji bo perwerdekirinê, ji bo nivîsinê çenabe ku ev şâşiyê hanê di kovar, rojname û kitêban de bêne bikaranîn. Lê divê ku kurd bêne perwerdekirin û ji ber ku xwendingeh heta niha tune bûn, ez fêm dikim, çima ev pirsgirkên hanê hene. Lê dîsa divê em di gava pêşîn de, mirovan agahdar bikin ku di navbera qanûnên rêzimanê û awayê ku gelek mirov di axavtina xwe ya rojane de bi kar tîne de, mecal ji bo ferqbûnê heye.

Mustafa Aydogan: Ger tu newestiyayî be, em suhbeta xwe li ser réziman û rastnivîsandinê bidomînin.

Maykil Çayit: Na, kerem bike. Tu dizanî ku di civînên kurmancî de, tevî ku rojê saet ji heyşt û nîvan, heta heyştê êvarê em li ser pir-sen zimên minaqeşe dikin jî em dîsa nawestin. Ji ber ku divê ev kar bê westan bête domandin.

Mustafa Aydogan: Wê gavê, ez dixwazim li ser rastnivîsandina hoker û rengdêran, yanî adverb û adjektîvan (zerf û sifatan) tiştekî bipirsim. Di vî warê nivîsandinê de, ev wek pirsekê xuya dibe. Yanî hoker û rengdêr di hevokan de tev li hevdu dibin. Ger tu bala xwe bidî du nivîsên cuda, tu ê du awayên cuda bibînî. Tu lê dinihêrî ku di nivîsekê de, hoker cuda hatiye nivîsandin, lê di nivîseke din de bi hevdu re hatiye nivîsandin. Ev ji bo rengdêrê jî her weha ye. Ev herdu ni-

vîsêñ ku ez behsa wan dikim, dikarin nivîsêñ eynî mirovî bin jî. Di vî warî de hin qaîde hene. Lê wek her pirsê, em di vê niqteyê de jî guh nadin qaîdeyan. Gava ez dibêjim; "**em**", ez xwe jî tê de dihesibinîm.

Maykil Çayit: Ger tu di vî warî de hin nimûneyan bidî, bi a min, dê zelaltir bibe.

Mustafa Aydogan: Bo nimûne: "**Ez çayê bi şekir vedixwim**" û "**Ez çaya bişekir vedixwim**".

Maykil Çayit: Di nimûneya "**Ez çayê bi şekir vedixwim**" de, "**bi şekir**" adverbek e û di nimûneya "**Ez çaya bişekir vedixwim**" de, "**bi-şekir**" rengdêrek e.

Mustafa Aydogan: Gava mirov ji aliyê rastnivîsandinê ve lê hûr bibe, gelo divê mirov di nivîsandinê de bi awayekî diyar bike ku ev hoker e û ya din jî rengdêr e, an fonksiyona ku ew di hevokê de dileyize, bi tenê têrê dike û ji ber vê yekê jî ne zêde girîng e?

Maykil Çayit: Bi qasî ku ez dizanim, ez ê di vê nimûneyê de, ho-kerê wek du peyvîn cuda binivîsinim: "**bi şekir**". Ez çayê çawa vedixwim? Bi şekir. Lê gava "**bi şekir**" wek rengdêrekê bê bikaranîn, yanî wek bi tirkî dibêjin "**şekerli**", ez ê wê yekê wek peyivekê binivîsinim. "**Ez çaya bişekir vedixwim**". Wek "**Ez çaya germ vedixwim**".

Mustafa Aydogan: Gava ez nivîsêñ bi kurdî dixwînim, ez dibînim, du gotin hene ku hem ji aliyê rastnivîsandinê ve û hem jî ji aliyê rêzimanê ve, bi awayenî cuda cuda tên nivîsîn. Yek jê "**hemû**" ye û ya din jî "**herkes**" e. Ji xwe diyar e ku "**hemû**" bi hevdu re tê nivîsandin, lê di warê forma lêkerê de, herkes bi awaye xwe dinivîsîne. Lê ji bo gotina "**herkes**" ê ev problem hem di warê rastnivîsandinê û hem jî di warê rêzimanê de, diyar dibe. Yanî divê em gotina "**herkes**" ê di hevokan de cuda binivîsinin (her kes) an bi hevdu re (herkes) binivîsinin? Gava "**herkes**" subjekt be, forma lêkerê dê çawa be?

Maykil Çayit: Ji xwe, wek te jî got, li ser rastnivîsandina peyiva "**hemû**" yê pirs nîne. Lê li ser forma lêkera ku "**hemû**" subjekta wê ye û netewandî ye, pirs heye. Bi ya min; peyiva "**hemû**" an hevmaneyâ wê "**gîsk**", peyiveke pirhejmar e. Ji ber vê yekê, di halê netewan-dî de, divê lêker jî forma xwe li gora pirhejmariya wê werbigire. Bo nimûne; "**Hemû wisa dibêjin**" lê "**Hemûyan wisa got**", ne ku "**He-mûyan wisa gotin**".

"**Herkes**" divê wek peyvekê bête nivîsandin. "**Herkes**" yekhejmar e. Gava mirov wê wek subjekt bi kar bîne, divê mirov forma lêkerê

ji bo subjekta netewandî û li gora yekhejmariya peyiva "herkes"ê bi-guhêre.

Mustafa Aydogan: Wek tu dizanî, qaîdeya di warê daçekan de heye, ev e: Daçek bi xwe natewe, lê bê pêşıya kîjan navdêrê, wê ditewîne. Lê di nivîsan de, tevliheviyeke mezin heye. Tew di "**circumposition**" an (di.....de, di.... re û hwd) de, ev pirs hîn bi xurtî derdikeve pêşiya me. Bo nimûne; gelo "**Ez destê xwe di dîwêr de didim**" an "**Ez destê xwe di dîwêr didim**" rast e? Herkes çawa fêr bûye, weha dini-vîsîne û awayê fêrbûna xwe ji xwe re dike qaîde. Gelo te bi xwe di nivîsên bi kurmancî de, tiştin bi vî rengî tesbît kirine?

Maykil Çayit: Ev pirs gelek caran ji deverekekê heta devereke din tête guhertin. Ji bo radyo, televîzyon û rojnameyan, ez bi giştî dibêjîm çend ji me bê, divê em zimanekî standard bi kar bînin. Wek mînak li bakur, Serhed, Qers , Agirî û Rewanê, ji berdêla ku mirov bibêje "**di vî bajarî de**", mirov ê bibêje; "**vî bajarî de**". "**Di**" dikeve.

Mustafa Aydogan: Yanî besê "circumposition" ê yê pêşî dikeve. Lê li hin deveran jî besê dawiyê nayê bikaranîn. Bo nimûne; ji berdêla "**Ez destê xwe di dîwêr de didim**", mirov dibêje; "**Ez destê xwe di dîwêr didim**".

Maykil Çayit: Ev weha ye. Ez dibêjîm ku ji bo saxlemiya zimêni di-vê ku hemî nivîskar û hemî zarok bêne perwerdekîrin da ku ew "**Di vî bajarî de**" bi kar bînin. Ji ber ku "**Di**" bi serê xwe bes nîne û "**de**" jî bi serê xwe bes nîne. Li malê ci bi kar tînin, bila bînin. Lê ji bo zimanê standard, ev ne wisa ye. Ev diyardeya hanê, di hemû zimanîn de heye. Bi îngilîzî jî ya'ku ez dibêjîm, ez nanivîsînim. Ferq di navbera zimanê kolankî û zimanê nivîsîn û xwendinê de heye.

Mustafa Aydogan: Di vî warî de, yek ji wan problemên din jî ev e; navdêra ku bikeve nava "circumposition" ê divê bitewe. Bo nimûne; "**di bajar de**" ne rast e, lê "**di bajêr de**" an "**di bajarî de**" rast e.

Maykil Çayit: Ger em gelek îstisnayan çebikin, ziman dê dijwartir bibe. Ji ber vê yekê, divê em vê yekê li gora qaîdeyan bi kar bînin.

Mustafa Aydogan: Tu tiştin din hene ku te bi xwe ew tesbît kirine û tu dixwazî bi minasebeta vê suhbetê ji bo xwendevanê Pelînê behs bikî?

Maykil Çayit: Belê, hene. Bo nimûne; mirov hene ku ji berdêla "**tiştekî din**" dibêjin; "**tiştek din**". Ev tesîra tirkî ye. Ji ber ku di tirkî nîr û mî tune ye. Ji ber vê yekê, gelek kurd nizanîn, ka di rastiyê de

"tişt" nêr e, an mêt ye. Ez dibêjim, ev ji bo bi rêkûpêktirkirina zimên ne baş e.

Mustafa Aydogan: Tu dikarî qaîdeya di vî warî de formule bikî?

Maykil Çayit: Bi giştî, ger rengderek piştî vê gotinê -yanî "tiştek"-bê, divê ku "î" bo nêr û "e" bo mêt bê nivîsandin. "Tiştek din" çenabe û "gavek din" çenabe. Divê mirov bibêje; "tiştekî din" û "gaveke din".

Mustafa Aydogan: Mebest ji vê ew e ku divê di atrîbutê de zayenda navdêr diyar be.

Maykil Çayit: Belê. Yanî divê ku kurd êdî wek tirkan nefikire. Bi tirkî nêr û mêt tune ye. Eger kurd tirk nebin, divê di vî warî de jî fiki-randina wan ji ya tirkan cuda be. Berî heftê û pênc salan an berî sed salan, ev di nav kurdan de tebîb bû. Di nav kurdên Iraqê de, ev tiştê hanê her zindî ye û ergatîv jî her bi awayekî rast û durust bi kar tê.

Mustafa Aydogan: Te got, gava navdêrek bi rengderekê ve bête girêdan, divê zayenda wê diyar be. Bo nimûne; "nivîseke baş", "çavekî xweşik". Lê ez dibêjim, ne bi tenê bi rengdêran ve, herweha gava navdêrek bi pronav û navdêran jî tê girêdan eynî qaîde derbas dibe.

Maykil Çayit: Belê. "Hevalekî min", an "hevaleke min", lê ne "hevalek min".

Mustafa Aydogan: Wek ku em pê dizanin tu li ser ferhengekê di-xebitî. Min bi xwe ferhenga te du sal berê dît. Û di her civînê de, ez hem ji te dipirsim û hem jî dîsa li wê dinihêrim, bê hela ka ci qas fi-reh bûye. Xuya ye ferhenga te her berfirehtir dibe. Ew qasî berfirehtir dibe ku tu bi xwe jî nema dizanî, bê ew ê kengî biqede. Lê ji bo xwendevanan ev tişt ne diyar e. Ji ber vê yekê, ez dixwazim tu ji bo xwendevanê Pelînê piçekî behsa ferhenga xwe jî bikî. Tu ferhengeke çawa amade dikî? Te kengî dest pê kir? Anîha di kîjan qonaxê de ye? Li gora te gava ev ferheng biqede, dê ci tesîrê li kesên ku bi kur-mancî dixwînin û dînînin bike?

Maykil Çayit: Ez nikarim ji niha de bibêjim, ka dê ci tesîra wê çê-bibe. Lê ez dixwazim bibêjim, di destpêka hînbûna zimanê kurdî de, ji ber ku ji bo min, kitêbên rast û durust tune bûn, min xwe bi xwe fêrî zimanê kurdî kir. Min dest bi berhevkirina peyivên kurdî kir û ev ji bo hînbûna zimên, wek metodekê bi kar anî. Piştî hingê, min dît ku ev projeyeke hêja ye û çêdibe ku bibe ferhengeke berfireh.

Mustafa Aydogan: Yanî gava ku te dest pê kir, ne bi armanca ku tu ferhengekê amade bikî, lê bi armanca ku tu fêrî kurdî bibî, te dest pê kir.

Maykil Çayit: Belê. Ji ber ku heta hingî bi îngilîzî tişt tune bûn. Ferhengê kurdî-rûsî, kurdî-frensî, kurdî-erebî, kurdî-tirkî hebûn, lê ferhenga kurdî-îngilîzî tune bû. Hemî tiştên ku min peyda kirin, min ew bi xwe wergerandin îngilîzî. Min got, heyf e ku bi tenê ez fêde ji van tiştan bibînim. Di wan rojan de, li ser kurdan bi zimanê îngilîzî, gelek kêm tişt hebûn. Lîiro rewş hatiye guhertin. İro bi îngilîzî gelek tişt hene. Dîsa jî piraniya lêkolînê zimanzanî ên li ser kurdan, ne bi îngilîzî ne. Bi rûsî gelek tiştên hêja hatine weşandin. Bi tirkî jî gelek tiştên girîng hene. Eger yek bixwaze fêrî zimanê kurdî bibe, mirov nikare jê bixwaze ku ew berê fêrî tirkî, erebî, rûsî; frensî û almanî bibe û piştî wê, hînî kurmancî bibe. Beriya bîst salan, rêyeke din tune bû. Vêca min biryar daye ku ez ê hemî lêkolînê xwe bi zimanê xwe, bi zimanê îngilîzî binivîsînim. Ne ku ji ber ji bo min hêasantir e, lê ji ber ku zimanê îngilîzî zimanekî navneteweyî ye. Ji bo ku ez bala dîn-yayê bikişînim ser kurdan û ser rewşa wan, min biryar da ku ez ê ne bi tenê lêkolînan binivîsînim, ez ê tiştên girîng jî werbigerînim îngilîzî. Ez nikarim rewşa siyasî biguherînim. Ez yek kes im. Ev yek ji qeweta min der e. Lî wek min got, ez dikarim tiştên girîng, ci ji tirkî be, ci jî ji kurdî be, werbigerînim îngilîzî. Ez ê tiştên ku bi awayekî din bi îngilîzî berdest nebin, werbigerînim. Heta derecerekê min wisa kiriye jî.

Ez hêvîdar im ku ferhenga min hem ji bo hînbûna kurdî û hêm jî ji bo dîroka zimanê kurdî, dê bi fêde be. Heta niha, herkes di gelîyekî de xebitiye. Ger tu li ferhengê kurdî mîze bikî, tu ê bibînî ku bo nimûne, yek xelkê Qersê ye û bi tenê li ser devokêni Serhedan diseke. Yekî din jî li ser devokê Hekariyan. Divê ku di navbera wan de peywendiye hebe. Bo nimûne; eger li Qersê filan peyv bi kar tê, dîvê mirov lê binihêre ka li Mêrdînê, beramberî wê ci bi kar tê. Eger eyñî peyiv be, baş e. Lî eger peyiveke din be, kî dê bizanibe? Vêca ger ez peyivê hevme'na wek mînak bidim, gelek girîng e ku mirov bizanibe wek mînak gezî heye, bermalk heye, sicink heye, sivnik heye, kînoşe heye, melkes heye, li Dersimê jî hevlik heye. Hemî bi tirkî; "sü-pürge" ye.

Ez hêvîdar im ku ferhenga min dê, ji bo avakirina pirêni wisa ên di navbera deverêni cur bi cur de, bi fêde be.

Mustafa Aydogan: Beriya du salan gava ku tu nuh beşdarî civîna kurmancî bûyî, tu di derheqê ferhengê de ci difikirî? niha piştî du salan, ji aliye xebata te ya li ser ferhengê ci tesîr li te çêbû?

Maykil Çayit: Ferq ev e: niha civatek heye, grûpeke însanan heye

ku ez dikarim bi wan bişêwirim. Heger ez ne piştrast bim, gelo me'na-ya filan peyivê çi ye, gelo di navbera du peyivên ku ez wek sînonîman werdigidirim de, ferq heye, an na, ez dişêwirim. Ji ber ku çê dibe ku ne wisa bin. Mirov hene ku çi bi rêya komputerê, çi bi rêya telefonê, çi rû bi rû ez dikarim bi wan bişêwirim. Vêca karên min êdî bi tenê li ser şirovekirina min namîne. Ez hêvîdar im ku dê projeyeke bi rêkûpêktir be, ji ber ku hemî jêder her ji destpêkê de kifş bûn, min ew eşkere dikirin. Lê niha, ji bilî kitêban, mirovên zindî jî hene ku ez dikarim wan wek jêderan bi kar bînim. Ü eger tiştek hebe ku min bi awayekî rast û durust fêm nekiribe, ez dikarim bidim zelalkirin.

Mustafa Aydogan: Gelo tu bi awayekî giştî, li ser xebata kurmancî çi difikirî? Tu dizanî, pirtûka bi navê "**Kurmancî**" ku ji bîst hejmârên kurmancî pêk hatiye, hat çapkîrin û weşandin. Ew ê bikaribe çi tesîrê li kesên kurmancîaxêv bike?

Maykil Çayit: Weleh, ew kitêba hanê dewlemendiya zimanê kurdî derdixîne ortê. Gelek gelek mezin e û cîhê şanaziyê ye. Ez hêvîdar im ku ew kitêb dê gelek kurdan heweskar bike, da ku ew li dapîrên xwe, bapîrên xwe, gundên xwe û parastina xwe vejerin û bo nimûne, bi komkirin an berhevkirina idyomên kurdî peyivên bi çandiniyê ve girêdayî û hwd ve mijûl bibin. Ez xwe bextewar dizanim ku ez ji bo besdariya van civînan hatim ezimandin. Ez dibêjim, ji bo dîroka zimanê kurdî, rola wê dê gelek mezin be.

Mustafa Aydogan: Kek Maykil, dil heye ku em gelek tiştan suhbet bikin. Lê suhbeta me hêdî hêdî sînorê kovarekê derbas dike. Ji ber vê yekê, ka em pirsên din jî ji suhbetên din re bihêlin.

Bi hêviya ku suhbeta me bi kêrî xwendevanê Pelînê bê û suhbetên pêşerojê gestir bin...

Maykil Çayit: Ez spasî Pelînê dikim û hêvî dikim ku hejmara kovar û rojnameyên kurmancî li welêt û li Tirkîyeyê zêdetir bibe û kurd li kurmanciya xwe ya şêrîn bêtir bi xwedî derkevin.

Pişka Kurdî ya Dengê Emerîkayê

Her roj: Se'at 16.00-17.00 (Greenwich meantime)
(Zivistanî têne guhertin)

Frekansên Havînê:

19.3	Kilohertz 15525
19.8	15170
25.1	11975

Rojîn Xewn

qirdêñ zarê

yek

Peykerê te çêdikim ji qirîstalan
li cemsaran
lêvên xwe dişemîtîne bêbextî
li ser dekêñ te yên qeşagirtî
xazî, coşeke zarokatiyê
bîranînêñ min diçin li derveyî gund pal didin

Dubare

çawa ez ê bajêr
di nava porê te de
nefetisînim bi qahr
keçêêê!..
ruyê xwe ji min neguhere
porê keçêñ jîndar
di nav lingan de dimîne
neguhere...

Sisê, çar, pênc

her roj li ser meytê xwe şînê datînim
emirquṭî dibe
erdnîgarî, xortêñ çardeh salî
tenêbûn tenêbûnê dibersîvîne
ruyê xwê diqelêsim...

Şes

kulên min diherikin îro kulên min
sal êş, werz li hemana
şikartêñ te bila baranêñ çelesrîn bin
xazî, coşeke zarokatiyê
bîranînêñ min diçin li derveyî gund pal didin...

Îbrahîm Seydo Aydogan

Tu kî yî...

1.

Rojekê zilamekî kal hat û li ber dîwarekî rawestiya. Li ser tütikan rûnişt. Herdu destên xwe dan ber ruyê xwe û ponijî. Bîstikekê weha kûr fikirî û pê re serê xwe bi xemgînî kil kir. Dû re destên xwe di kê-leka çongên xwe re bera xwarê dan. Bi vî awayî bêhna xwe berda. Xuya bû ku ji rîyeke gelek dûr dihat. Çavêñ wî hê li rîyê bûn.

Xortekî nûgihiştî. Emrê wî çardeh. Bejin zirav. Çavêñ wî gir û reş. Ruyê wî xweşik. Westiyayî. Xwe da kêleka kalo û rûnişt

Çavêñ kalo li rîyê. Çavêñ lêwik li kalo.

Kalo rabû, li dora xwe nihêrî. Lawik jî rabû. Der û doreke fireh. Bêsînor. Ji dûranê, çiyayêñ bi heybet xuya dibûn.

Dinya sar. Dinya, di destê seqema dijwar de ne di tu halî de...

Kalo serê xwe rakir û li ezmên nihêrî. Bi xemgînî. Bi çavêñ melûl. Bi çavêñ mişt hêşir.

Rê dûr e. Rê dirêj e. Hê gelek heye...

Kesereke kûr kişand. Serê xwe bi kerb hejand û bera ber xwe da. Dû re mijangên xwe bilind kirin û di bin wan re dîsa li rîyê nihêrî.

Mîna ku mirov li dewsa birîneke kevn binihêre.

Mîna ku mirov

Di pey hezkiriyekê re binihêre...

Da ser rîyê û meşîya.

Lêwik jî da dû...

Du şev û du rojan meşîyan. Di nav çend gundêñ din re jî bihûrîn.

Li her gundekî çend xortêñ din bi dû wan diketin. Li her gundekî çîrokeke din li çîroken wan zêde dibû.

Li her gundekî pirtir dibûn...

Du şev û du rojêñ din jî meşyan. Di nav gelek gundî re bihurîn. Gelek xortêñ din xwe da tengala wan. Gelek dilêñ din jî tev li wan bûn. Û carekê jî nesekinîn û bêhna xwe venekir. Li dû xwe nenihêrî. Her meşyan...

Zilamê Kal li pêşiyê. Xort li dû wî.

Ba li wan rabû.

Baran bariya, şil û pil bûn.

Berfê dayê. Heta çongê di nav re çûn.

Nesekinîn. Her meşyan...

Rê dûr e. Rê dirêj e. Hê gelek heye...

Zilamekî kal, porşpî, rîhdirêj. Bêdengiyeke kûr.

Li pey wî bireke xort...

Meraqa her gundê ku ew tê re dibuhurîn, bêtir dibû.

Du şev û du rojêñ din jî meşyan. Westiyan. Hemuyan berê xwe da daristanekê. Li daristanê, li sitarekê geriyan. Giriyan.

Tava heyyê dawerivîbû ser ruyê çemê zirav. Li wan temaşe dikir.

Xişe xişa pelan bû...

Zilamê kal li wan zîvirî.

"We xêr e?..."

Kortekî nûgîhîştî, di çax û benga xwe de. Umrê wî çardeh. Lê situxwar, melûl, xemgîn û westiyayî.

"Tu kî yî?..."

Zilamê kal keserek kişand, serê xwe bera ber xwe da, berê xwe guhert. Hêdîka li dû xwe zîvirî û meşya...

2.

Zilamê kal dimeşya. Xort li dû.

Di gundan re dibuhurîn. Li kilam û stranêñ dengbêjan guhdarî dikirin. Pîrekan ji wan re dilîrand.

Li qiraxa her çemî disekinîn. Çem disekinî. Straneke xweş çawa bisekine, ew jî weha. Rê vedikir ji wan re. Di ser çêm re derbas dibûn. Çem dîsa diherikî. Straneke xweş çawa dest pê bike û biherike, ew jî weha...

Li ser rîyê gelek kes tev li wan dibû. Kesên rîwî.

Hin ji wan wendayî. Hin ji wan derketî. Hin ji wan qewirandî. Û hin ji wan revok...

Rojekê dîsa li ber çemekî sekinîn. Zilamê kal li wan zîvirî. Nihêrî.
"We xêr e?..."

Xortekî nûgihiştî. Çardehsalî. Por gijolî. Rûxweşik. Westiyayî.
"Tu kî yî?..."

Zilamê kal li wî nihêrî, serê xwe bi kerb kil kir. Dîsa berê xwe da
aliyê rîyê û meşıya.

3.

Dem di ber çemekî re diçû. Dem nezan.
Hemû demsalên umir li deverike nenas diman.

Zilamê kal dimeşıya. Xort li dû. Îdî êvaran disekinîn. Xwe dida
bende sibehan. Xwe dida bende bersîvan. Yek ji wan jî nedipeyivî.

Kalo tevî bira xortan xwe li daristanan digirt. Nêzîkî çeman rûdi-
niştin. Yekî ji wan agirekî gur dadida. Li dora êgir kom dibûn. Tînê
dida dilên wan. Tînê dida dora wan. Teyr û tilûran xwe li dora agi-
rê wan digirt. Pelçîmok, başoke, quling, kund û kevokan jî...

Ci bêdengiya êvarê, çemê dorê, dûrik û kilamên ku di guhêñ wan de...

Zilamê kal li wan nihêrî. Wan jî li wî nihêrî. Ji ber sermayê di ha-
lekî xerab de bûn. Westiyayî. Bê xew...

Dilê wî bi wan şewitî. "Vegerin malêñ xwe, lawo."

Û deng ji yekî jî derneket.

Şewqa êgir xwe da ruyê wan. Çavêñ wan dibiriqîn. Weke ku ne li
ser hişê xwe bûn.

Giş dişibiyan hevdu. Yek jî nedîşibiya yekî din.

Weke hev rûniştibûn. Weke hev dinihêrîn. Li pey eynî tiştî bûn. Ji
bo eynî tiştî bi rê ve ketibûn, Qesda eynî deverê kiribû. Hemuyan ey-
nî tişt miraq dikir.

"Tu kî yî?..."

Zilamê kal fikirî. Li ruyê wan yek bi yek nihêrî. Bîstikekê li dengê
çêm guhdarî kir. Serê xwe rakir. Li êvarê temaşe kir. Li bêdengiya
wê. Li tarîtiya wê...

Dû re dîsa li wan zîvirî. Ruyê wî tabloya kerbê. Dengê wî lerzokî.
"Hûn ci navî li min bikin, ez ew im..."

Xortekî nûgihiştî. Çavêñ wî tije miraq. Di dilê wî de heyecana hîn-
bûna tiştékî nû.

"Çawa?..."

Zilamê kal serê xwe kil kir, zîvirî û dîsa meşıya. Xortan da dû.

4.

Şev û roj li pey hev... Meşîyan.

Roj bûne meh. Meh bûne demsal. Demsal giş li dû mane.

Meşîyan. Nepeyivîn.

Di gundan re derbas bûn. Ne çol hiştin ne jî beyar. Xwe ji serê ci-yayên biheybet bera xwarê da. Di deştên fireh de bêhna xwe veda. Deştên ne serî xuya ne jî binî...

Ketin nava şerê eşiran. Yekî ji wan jî guh neda şer.

Bêrîvanan şîr û nivîş ji wan re kirin taştê. Kevaniyan nanêñ şike-va pêşkêşî wan kirin. Lê yekî ji wan jî lê nenihêrî.

Zewade bi devê wan nebû.

Çem bi çem. Daristan bi daristan. Welat bi welat...

Meşîyan...

Zilamekî kal û birek xort.

Newal derket pêşîya wan, nesekinîn. Xwe lê xist.

Tofan rabû. Guh nedayê.

Meşîyan...

Şev û roj li pey hev.

Meşîyan. Westiyan. Bes vê carê negiriyan.

Her yek ji gundekî bû. Giş bi zimanekî dipeyivîn.

Her yek bi zimanekî.

Peyv ji bîr kiribûn...

Li qiraxa çemekî din sekinîn dîsa. Tarî dikete erdê. Dinya sar. Dinya cemidî.

Yekî agirek dada. Agirekî gûr. Li dorê civiyan. Hemuyan bi hev-du re bala xwe da zilamê kal.

Zilamê kal. Zilamekî biyanî. Rêwiye. Rêwiye kî li vê çolê. Rêwi-ye kî ecêb. Li çêm guhdarî dikir û diponijî.

Hêdîka di ser milêñ xwe re zîvirî. Li wan nihêrî. Gişan di bin ron-ahiya ku ji êgir difûriya de serê xwe bera ber xwe dabû. Nedipeyivîn. Gava zilamê kal li wan zîvirî, wan jî serê xwe rakirin û li wî nihêrî. Çavêñ wan ên sor bi şewqa êgir dibiriqîn. Çavêñ wan ên xemgîn... Mîna ku li ber wî biggerin lê dinihêrî...

Zilamê kal. Ecêbmayî. Heyirî. Dilekî bi meraqan mişt. Deng ku-bar, lerzokî, westiyayî; mîna ku ji kûrahiya bîrêñ bêbinî were...

"Hûn kî ne?..."

Kesî bersiv neda. Li ruyê hev nerîn. Serêñ xwe bera ber xwe dan.
Hemuyan fedî kir. Hemû ponijîn.

Zilamê kal dîsa got:
"Hûn kî ne?..."

Xort hêdîka rabûn û meşîyan. Serî di ber de. Belav bûn û bi dûr ketin. Her yek bi rêyêkê de çûn û hêdî hêdî di nava perdeya tariyê de wenda bûn.

Giş dişibîyan hevdu...

Zilamê kal di pey wan re dinihêrî. Weke ku li xortaniya xwe bini-hêre. Dîsa serê xwe kil kir. Hêşir bi çavêñ wî ketin.

Dilê wî bi wan dişewitî...

Her yek bi zimanekî dipeyivîn.

Giş bi zimanekî...

Her yekî berê xwe bi deverekekê ve kir. Her yekî da ser riyekê. Belav bûn û çûn...

E. Mîran Janbar

Reqsoreqso

Keriyek bûn
Perîk tenîkirî
nikil mevredkirî
di nav asîmanê berevajî de
diçûrisîn
disincirîn
Li hev dinihêrtin çavêن şolî
dilên qehrokî
hevdu çovînokî dikirin
diqermeçandin
bû meretoneke bêsinor
xwêdanêن hevdu jahrî dikirin

birek bûn
Yek ji yekî bihêrstir...

bi teqîneke atomîk
dil pengizî berî her tiştî
ziman fetisî
mejî tevizî
dîsa jiyan hate fesilandin
bi awazê dema quşiyayî
dîsa destavêtina xewneke qîz
pelandina bedeneke qutifî
hişçûyineke reqsoreqso
û şiyarbûneke tune
di nav bêjeyên hinekirî de

pir bûn
yek ji yekî xemgîntir...

Şahînê Bekirê Soreklî

Do êvarê

Do êvarê di serê wî de raman li nav hev û din ketibûn, xewê xwe ji çavan dizîbû û bêhna wî teng bûbû. Çû der da ku li stêrkan bigere. Hat bîra wî çawa di zarotiya xwe ya gundî de di tarîtiya şevê de li asîmên seyr dikir û bi dîtina stêrkên bêjimar re rêzgirtina ji xuristê û gerdûnê re di dilê xwe de hest dikir, bêhna wî fireh dibû û hêviya ji xwedê di kûrahiya hebûna wî de geş dibû.

Li vî bajarê mezin asîman miqrîs e; stêrkên tê de, xwe wek stêrkên asîmanê gundan eşkere nakin. Zor kêfxwes bû dema çavêن wî stêrkeke kenok li jor bi cîh kir û bi dilşadî ew jî bi wê re keniya.

Roja din, di hevpeyvîneke radyoyê de bihîst ku stêrka do êvarê ji mîj ve miriye. Zanyarekî gerdûnnas digot, milyonek salêñ ronahiyê diviyabûn da ku şewqa stêrkê li ser erdê xewan bibe, lê heye ku ew ji hezaran sal û vir de nema zindî be.

Do êvarê pîreke heftê û çar salî ji bo bîst dolaran li bajarê mezin hat kujtin. Berî bimire dilê wê bi wê şewitî, û wê gote xwe, “xweziya bêyî zaro bimama; xweziya berî pîrbûynê bimirama.” Roja din laşê wê di termxaneya bajêr de bêxwedî ma.

Do êvarê keçekê sêzdeh salî li bajarê mezin ji diya xwe ya bêmîr mayî reviya. Roja din derya vereşîya û laşê wê yê vemirî avêt nav zînarân, laşekî ciwanekê bi encama tahdelêkirina cinsî û lêdanê hatiye hingavtin. Du hefteyên din, heye ku bi çar heyvan şûn ve du xortêñ serserî dê bêne girtin, bi tawana tahdeyên cinsî û kujtina zarokekê. Çar parêzger ê werin hawara wan: “Herdu xort ne gunehbar in; zaroatiya wan yeka bêyî bextewarî bû; iroj bê kar û bê xwedî ne; tawan ya civatê ye,” ew ê bibêjin; û laşê keça sêzdeh salî ê di gorê de ji bêhêvîtiyê xwe bide kurman.

Do êvarê kesekî serxwes li başûrê bajêr agir berda dehlan û roja din dûyê darêñ hatine kujtin asîman reş kir.

Û do êvarê sê hezar û neh sed û şest û çar leşger û şervan û gerîla û mucahid û leheng û ajan û qacaxîker û ewên din li cîhanê hatin kujtin. Bi encama kujtin û hevkujtina wan çarsed û pêncî bûk û jin bîh man, hezar û du sed û heftê û heyşt zaro sêwî man û bîst û çar hezar û sê sed û çardeh penaberên din bi çolê ketin. Bîst û çar ji wan ê dû re li gel heft hezar û çar sed û sîh du kesen li ser navê wan bûne penaxwaz bidin şopa xewnêñ ewropayî, wek penaberên siyasi.

Leşger û şervan û gerîla û mucahîd û leheng û ajan û qacaxîker û ewên din yên do êvarê hatine kujtin dê di nav rojên hefteyekê de di quncikêñ rûpelên rojnamene de bibin jimar û jinebî û zarokêñ li dû wan manî dê bêne jibîrkirin, yan tenê ji aliyê penaxwazan de wek egera bidestxistina penaberiyê bêne bîranîn. Rêxistina Cîhanî ya Penaberan ê bîst û çar hezar û sê sed û sêzde penaberên din, kêm-zêde, li ser hejmara di listeyên xwe de zêde bike. Hukûmet ê gerîlayan wek terorîst, gerîla hukûmetan wek faşist, cendirme dê qacaxîkirian wek eşqiya û qacaxcî cendirmeyan wek mîrkûj bi nav bikin.

Do êvarê bi sed hezaran dergûşen nû ji dayan bûn û bi sed hezaran pîr û kalêñ ku rojekê dergûş bûn mirin. Kêf û xweşî li aliyekî, eş û kul û keser li aliyê din di nav çerxa felekê de heliyan.

Do êvarê gundiyyê zarok ku nuha bûbû peyayekî bajarvanî berî biçe razê li wêneyê gundê xwe geriya, wêneyeke qermiçî û gewravîn, û dema ew dît agir di destêñ wî de bi wêneyî ket.

Roja din dilê wî nema dixwazt li bajarê mezin bimîne, lê ne jî dixwazt li gundê agirpêketî vegere. Cîhan di çavêñ wî de ew qas teng bûbû, cîhekî ku meraqa jiyanek xweşbext di dilê wî de gurr bike nemabû. Ew neçar ma li benda êvara din bimîne, û dema hat wî dîsan li jor seyr kir. Stêrkan koç kiribûn, asîman digiriya û bêhna dû ji hêstirêñ wê dihat, dûyê darêñ hatine şewitandin. Hat bîra wî ku heta bi xurist û gerdûna bêsinor û bêdawî bin jî para xwe ji bedkiriyaren mirovan girtibûn û ji wan nefret dikirin. Gundiyyê bajarvanî jî giriya, li ser stêrkêñ zarokatiyê, stêrkêñ ku di asîmanê êvara wî û mirovahiyê de wenda bûbûn.

Barana Baravî

guldesteyeke helbestan

1.

Bû dilxwazê ramûsanekê li ser sînga yarê
awirek lê gerand
di deryayên çavêن wê de
wenda bû
û nema xwe ji derveyî çavêن wê didît.

2.

Ew hêviya kevin
bû kilît
û di dilê wê de asê ma...

3.

li ramanekê digeriya
sê çar rê di mejiyê xwe de vekirin
û kûr di wan de meşî
ta ku li rehêن çavêن xwe rast hat
û li wir... di çavêن xwe de
sed raman dîtin...

4.

Rengê buharê ji ruyê wê difûriya
dema te ew bîhn kir
bi şax û pelên xwe ve
bi alî te de dixiliya
vê care
tu jê re bûyî
mîna tavê
lê ji bilî wê rojê te ew bîhn nekir
xwe avêt vî rexî
wî rexî
li te gazî kir
tu nedîti
di cîhê cîh de çilmisi
ro bi ro pelên zer diweşîyan
û tu bi rîyeke nû de diçûyî...

Behram Dara

Sînor

Dara tûyê tik û tene mabû li wir.

Wê bi kû de biçûya.. Axê, sed rehên wê li noqa xwe pêçabûn: Sed reh... bi sedan rehên hûr, gir, stûr... û hinêñ müyî müyî... Ax; mifil mifil. Çend salî bû gelo li ser vê axê? Vê bêhnkê, ji tırsê taya mirinê girtibû qirikê, umr ji bîr kir! Agir bû ev. Bi agir re henek nedîbû! Jê û bi wir de didît; erdê reş dikir. Jê û bi wir de di devê êgir de qırş û qal, pûş û pelax, kêzîk û kurmik.. Çırke çirk dibihîst. Stirîbeloq ji qa-mê de hildiweşîyan. Zimanê êgir sor dikir. Rebenê heshesûkan bi ber-ên bi xwe ve giriyan... naliyan. Agir hêşirên wan dialastin, çavikê wan zik ï ziwa dikir. Agir bû ev. Ne henek menek. Genek bi qurincêñ xwe, iro li tevî gulen bi xwe ve berî bi bêhnikê bûbûn rijî. Di wê hînê de beqikêñ heşînk xwe neavetibûna ava cokê; kulî bi gurdkî ne-reviyabûna, dibûn dohn û diman li erdê...

Minminîkek netilitî wê kelikê. Me kêzikek hecê, ne hespikek fat-mayê... Gava ku agir dîtibû, çelikêñ qitikê bi sê dengan gotibû “Wey dayê!” Agir bû ev... Henek pê nedibû! Bi Cûdî ve hilperikibû. Gebar ew dîtibû. Çend qana westiyabû li Şîmalê? Ber êvarekê nebûbû kira-sek!.. Qîzekê li xwe nekiribû li ser bircêñ Diyarbekirê?..

Vê bêhnkê li daristanêñ Amazonê şewatê hê dom dikir. Û li vir, li pişt têlêñ sînorî, navbera Qamişlokê û Nisêbînê de agirekî bi ba re li dora wê dileyist. Çırke çirkê vedilist: Dû dibû telpek gilî, li hev difitî difitîlî û ber bi jor de diçû.

Wê ew bi kû ve biçûya? Axê, sed rehên wê li noqa xwe pêçabûn. Ne ku neda xwe. Dara tûye vê kelikê hêşirek bû. Bi dû peymanekê de li wê beyabanê mabû. Hingê navê Lozanê bihîstibû. Ji hingê ve kese-kî ne tûyek wê xwaribû ne jî kesekî gotibû “oxx...” li bin siya wê...

Ew hêşirek bû niha. Û nikarîbû biliviya. Pêşî agir bi qurmê wê ve hilkişıya. Bi dû re girt şaxêñ nizme. Xilolikêñ wê dişibîyan hêşirên gundêñ me. Li vir, li pişt têlêñ sînorî, agirekî tûyek hişk kir! Eskerekî li wê û êgir dimeyzand: Ji pişt têlan de ber bi tûyê ve tû kir!

Charles Baudelaire

Xemgîniya heyvê

Îşev heyv, ji her roj bêtir ketiye xewa şêrîn;
Wek bedewtiyekê, serî li ser balgîfan,
Ku bi destekî xwe yê xilmaşî û nermik
Pêşîrên xwe mist dide berî ku di xew re here.

Li ser pişta şînikî ya şepeyên nerm
Li ber ava, xwe bi xewxwesi dirêj dike
Û çavêن xwe li sipîbûna derdorê digerîne
Wek gulek ku bikişe ezman geş bibe.

Carina li ser vê gilovertiyê, tevî gewdê tiral
Hêsiran dirijîne bi dizî,
Helbestvanekî dilovan, dijminê xewê.

Kefa destê xwe dide ber van hêşirên sarbûyî
Ku çirûsk jê diçê mînâ tîfilê kevirê şekirokê
Û paşê wê dixe dil bêyî ku rojê pê bihesîne.

Ji Frensewî: Cemîl Denlî

Zerdeşt Nînowa

Navê mirinê tune

Tu dizanî bi ramanên xwe bileyzî yarê?
Her ku tu birevî ew li dû te ye, xelasbûna te tune
Rêpîvanên leyistikê ew nîşan dike
Mîna jiyanê.

Bahreke herî kûr di hundurê min de digirî û bi qêrînên min mezin-tir dibe. Dema ez bi ramanên xwe dileyzim ev bahra han dibe navenda mejiyê min. Ez li kûderê dinêrim, ji tariyê pê ve tiştekî nabînim. Tariyeke bêdawî... Mejîyê min li min digere, ez li mejîyê xwe digerim. Dîroka me werê tê nivîsandin. Kîjan pirtûkê vedikim, nivîskarê wê ne ez im. Ez dixwazim bibim nivîskarê pirtûka xwe. Her ku gorrek vedibe, ez ji hundur derdikevîm, mirineke bêveger dixwazim. Kîjan herba ku dijîm, ez dimirim!

Ev hevok giştik dibin pirs û çengelên xwe di qirika min de diçikînin. Dilê min tê pêşî, lê belê di nav mij û dûmanê de nikarê bersivê bide. Ger mirov bi sedema hebûna xwe nizanibe, hêşirên çavê mirov jî nayê alîkariya wî. Paradoks eşkere dibe, şexsiyet veşartî dimîne.

Dr. Frankl (psikologekî navdar e) cihekî pir fireh daye vê mijarê û bîr û baweriyên xwe bi esasî li ser vê bi pêş ve xistine. Ew dibêje ku herba jiyanê û mirov li ser benikekî zirav e. Dema mirov û bi giştî mirovahî ji bona xwe mahneyek peyda kir, neyarê wan çiqas xurt û dijwar bin jî, vê herbê wenda nakin. Nerînên xwe bi vî rengî tîne zi-mîn; “Weke ku hûn dizanin, ji Auschwitzê heta niha dîrokê xweş nîşan kir bê mirov dikare ci bike; Hîroşîma jî, kîjan aliyê mirovatiyê di talûkê de ye, derxist holê. Her ci qas di Auschwitzê de qîrkirin û zulmên herî giran hebûn jî dîsa mirov dikare bibêje ku mejîyê wan azad bûn. Ev yek dibû sedema berxwedanê ji bo wan. Lê belê girtiyek, heger baweriya xwe ji pêşerojê qut kiribe, ji bo wî mirin dest pê dike.”

Dîsa bawerî, hêvî û jiyan dibe sêgoşe di nav şîroveyên Frankl de. Bawerî û hêvî ji bo armanceke azad û tendurust pêwîst e, armanc jî dibe sedema jiyanê. Li ser vê yekê, Frankl, minakeke balkêş dide mirov. Ev dîalog di navbera Frankl û girtiyekî de derbas dibe.

Girtî: Ez dixwazim ji te re tiştekî bibêjim. Min xewneke ecêb dît û di vê xewnê de dengekî ji min re got, tu dikarî tiştekî ji min bixwazî. Tu dizanî min çi pirsî? Min jê re got ev herba han ew ê kengî ji bo min xelas bibe? Tu min fahm dikî? Ji bo min! Min xwest ez fêr bibim, ew ê wargeha me kengî bê girtin, êşen me ê ci wextê xelas bibin.

Frankl: Baş e, te kengî ev xewn dit?

Girtî: Di Sibata 1945an de.

Dema xewna xwe neqil dikir serê Adarê bû.

Frankl: Dengê di xewnê de got çi?

Girtî: Got, sîhê Adarê. Weke ku dixwest veşere.

Dema girtî qala xewna xwe dikir, hêviya wî hebû û bawer dikir kû ew ê rast derkeve. Lê belê roj derbas dibûn û nêzî sîhê Adarê, nû-çeyên herbê zêdetir dihat wargehê. Di bergehê de girtina wargehê xu-ya nedibû. Di 29ê Adarê de girtî lepira nexweş ket. Tiştên mîrwa wî jê re gotibûn, ew ê herb û êşen wî xelas bibûna, di wê rojê de girtî ket tayê û hişê xwe wenda kir.

Di sîh û yekê Adarê de mir.

Wendakirina hêvî û baweriyê bi wendakirina xwe yek e. Sedema mirina wî her çiqas wekî nexweşiyê dixuya jî mirov dikare bibêje mi-rina baweriyêñ wî mirina wî bi xwe re anî.

Mirovekî leyistika xwe ya bi ramanêñ xwe re xelas kiribe,

Di wê bahrê de nefetisîbe

û bi jiyana xwe armanceke azad li dar xistibe

Kesek nikare wî têxe girtîgehekê yan jî gorekê.

Girtîgeh û gor!

Kîjan jê mirin e, kîjan jê jiyan e? Armancek an tahmkirina hebu-na xwe jiyanê bi ci rengî dixemilîne? Bersîva van sewalan di nav lê-ven dîrokê de ji me re destê xwe kil dike û werê xuya dibe ku di pêşerojê de jî ew ê li bende me be. İro xweş derdikeve ber çavan ku girtîgeh û gor ne sembolêñ mirinê ne. Bi taybetî ji bo me kurdan û bi giştî ji neteweyêñ din re bûne sembolêñ têkoşînê.

Girtîgeh û gor... sembolêñ têkoşînê

û hêşirêñ çavan

Hêşirêñ min zêde dike gor/ Dilopêñ wê gir dike girtîgeh

Bahra di dilê min de bêtir mezin dibe

Dema ez dikim wenda bibim/ Dema ez dikim bifetisim

Qêrinêñ min deng vedide li bakûr

Hêşirêñ min têñ hawarêñ min

Dibin sembolêñ jiyanê ji bo min.

Demêñ Bihurî - 2 -

Li ber pencereyê ji germa royê ez mest bûbûm. Demsala zivistanê şûna xwe ji biharê re hiştibû. Li hundir bêdengiyek ku bi sistî dilivíya, hebû. Carna mirov ji xwe re dibêje ev kar jî tune bûya wê çiqas xweş bûya. Yanî tişteki bêlizûm. Çavêñ min her ji bîskê tûrek diavêt hundir û zûbizû xwe diavêt derveyî hundir. Ji ber ku, du çavêñ kil-dayî ez kiribûm hêsîr. Lê ez dîsan vedigeriyam hundir û ser çavêñ kil-dayî. Vê carê ji dev kenek difiriya û dihat li ser rûyê min datanî. Di tarîxa mirovatiyê de ev xwiy her berdewam e. Xort sed carî li keçikekê dinere lê gava keçik carekê li xort binere, pê re çerxa dinyê tê guherandin. Wê gavê heqê mirov çêdibe ku bibêje Xwedêyo, te çima dinya wiha ava kiriye!

Li ser maseya kar, ji betaliyê acizbûnek ketibû nava dilê min. Wek her roj, iroj jî bûbû êvar. Dîsa ez bi xwe re di galegalê de bûm. “Vê seetê mirov biçe mal, wê ci bike? A baş, ez telefonî hinekan bikim, belkî em pev re biçin sînemayê. Ev kûçikbava hundur ez nizanim ci-ma, pozê xwe bilind dike. Hinekî bi nermî binere, belkî min ji vê tenêtiyê xelas bike. Lê wer xuya ye ku ne di eynê wê de ye. Mirov li bajarê mezin bi tenêtiya xwe dijî. Bajar her çiqas mezin dibin, kes jî ew-qas bêkes, ango tenê dimînin.”

Nigên bê rota, di pêşıya min de dimeşin, tu ê bibêjî qey ew rêya xwe dizanin. Ya jî ew dixwazin ber bi wê taxa bajêr ve herin. Ci tişte ecêb, xelk dixwazin seetek berî seetekê ji kar derkevin, lê ez? Hemma va ez derketim û bû ci? Vê seetê ezê herim ku û bi kê re sohbete-kê bikim ya jî bi kê re wextê xwe derbas bikim? Mîna vê helbestê: “Dil ne çayê dixwaze û ne jî cayxanê, dil sohbetê dixwaze çay baha-ne.”

Ev sikakêñ ku em her roj silavê didin hev, ez wer bawer im êdî ji min aciz bûne. Şoprêkê vê taxê, bi hatina nigên min, tu ê bibêjî qey xwe digivêşin ser hev û ji hev re dibêjin; “va ye dîsa ew hat”. Herhal pira kevnare jî tişteki din dibêje; “her ro du ro ev diçe kû”? Min di

ber xwe de dixwest bigota; "ma law hûn bê can in û îhtiyaca we ji hevalan dibe ku tune be, lê ez?" Ev fikir bi tenê di mejiyê min de dîmîne û naherike ser zimanê min. Bi rastî jî ziman, tiştekî wiha ji mejî napê.

Mirov gava ku nuh diçe bajarekî, berî her tiştî elektrikê wî bajarî bala mirovan dikşîne. Lê vê gavê ez dibêjim qey tu tişt bala min na-kişîne ji bilî bêdengiya tenêtîyê. Niha ber êvarê ye û ne şewq û ne jî rengê elektrîkên bajêr ku diçurisin bala min dikşîne. Wek siya pêjnekê ez di sikakan re derbas bûm. Di wê navberê de hêdî hêdî ez ber bi réya Îstiklalê ve diçim. Gavek li dû gava dinê ez xwe dikişnim nav qelebalixa însanan. Di vê réya ku wasite tê re çûn-hatinê nakin wek hercar dîsa qelebalixa însanan bala min dikşand. Di nav vê qelebalixa de ez xwe dixim nav hezar pîzrûkên xwe û jana tenêtîyê min diricifîne. Ji mecbûrî ez xwe teslîmî bîranînan dikim. Her ji bîskê kenê sibê zû tê bîra min, lê vê carê nayê ser rûyê min, bi tenê tê xwe li ser mejiyê min datîne û min dike hêşîrê xwe.

Di tarîxa mirovatîyê de ev xwiy her berdewam e. Xort sed carî li keçîkekê dinere; lê gava keçik carekê li xort binere, pê re çerxa dînyayê tê guherandin. Wê gavê heqê mirov çêdîbe ku bibê-je Xwedêyo, te çîma dînya weha ava kîriye!

Laşê min ji tilikên nigan heta mûyê serê min, di nav tenêtîya jiyanê de xweziya xwe bi bîranînan tîne. Ku ji cergiya tê bîra min û heta niha ez ji bîranînan hez nakim jî..

Derengê şevê bû, bi gotinek din, şev qar bûbû. Lîvek li ser lîvekê dinaliya. Li wî bajarê bi birc û sûr, di binê xaniyekî de keçikê digot:

- Ez naxwazim ji te hez bikim, yanî aşiqî te bibim.

Ji alîkî jî bi tiliyan porê min şeh dikir. Ricifek diket laşê min û xwe ji jor ta jêr di hundirê min de dilivand. Bersiva min hazir bû:

- Ji xwe ez jî vê yekê naxwazim. Ji bo min jiyanek weha jî ne lazim e.

Pê re rengê keçikê diqulipî, şevreşıya tarî jî jê re starî nedikir. Lê deng nedikir û her porê min şeh dikir, tiliyên xwe di nav re radikir û ew mist dida. Wê jî dizanîbû ku ew dixwaze ez pê dakevim, lê dev carnan derewan dike, nagere û dil bê bersiv dihêle.

Şev qar bûbû lê jiyan li wî bajarê bi sûr qar nebûbû. Berî keçik dest bi peyvê bike, bala min li ser bajêr bû. Di ser hatina min ï vî bajarî de hîn çend roj derbas bûbûn ya nebûbûn, min xwe di nav têkilîyên bi vî rengî de dîtibû. Wek carna hinek ji mirov re bêjin di dawiya işê bi ecele hatiye kirin de, mitleq meseleyek ne bi dilê mirov derdikeve holê.

Keçikê got:

- Ez dixwazim ji vê rojê û pê ve dawî li vê têkiliyê bînim.

Bi bersiva wê heyecanek xerîb bi min re çêbû, lê deng ji min dernediket û min çavê xwe bera bahra valahiyê dabû. Min di wê bahra ji bîranînan pêk hatibû de gelek carî bergehek ku dikarîbû wekî nîv-qederek bihata hesibandin, didît. Wekî her mirovî min jî gelek carî serê xwe bi meseleya ferqiyetên ku di navbera eşq û daxwazên laş de hebûn, diêşand. Bê yî irada mirov gava qala tiştên weha dibe, vê re mînakek ji wan ferqiyetan tê bîra însên. Her çiqas min nav li têkiliya bi wê keçikê re nekiribû jî, bi kêmanî birtyara vejetandinê ji ber helwesta min bû. Di nav wê bîranînê de min xwe bera nav bîranîneke din da:

Berî vê şeva ku ez bi keçikê re derbas dikim bi demekê bû, li ci-hekî, yekê iltifatek ji min re kiribû, min jî ew bê bersiv nehiştibû. Wê kesê li ser evînê şîrî dînîvîsandin. Li cihê karê xwe deftera xwe yî şîran anîbû cem min û bi dizî ji min re çend şîrîn xwe xwendibû. Bi gotinên xwe li ser çavên min şîrî rês kiribûn û xwestibû ku ez jê re mebestekê ji bo şîrîn wê ava bikim. A rastî hinekî pê kêfa min jî hatibû. Min xwe bi xwe digot, çima nebe? Yanî ez bûbûm mebesta wê ya helbestan û di nava dilê wê de min bizotek hiştibû. Lê niha ez tê derdixim ji delva ku min jê re mebestek ava bikira, wê xwe kir mebesta min û di vê şeva tarî de min meşxûl dike.

Yanî li wî bajarî hîn çend rojên min nebûbûn, belayek li ser yeka dinê hatibû. Çawa hatina min werê nuh bû, tarîxa çûna min jî werê zû bû. Berî ez ji bajêr herim û ji keçikê vejetim bi rojekê, ji xwe hevdûdîtina me jî ketibû roja çaran, ji min re ev gotibû:

- Çima tu weha zû ji min diqetî? Lê heger ku tu ê biçî jî, lazim e ku berî tu herî min bibînî ya jî telefonêkê ji min re vekî. Ez ê wê ga-vê ji te re tiştekî bibêjim.

Min ev gotina wê ya di buxçika wê de pir meraq kiribû û min xwest ku ez hîn bibim. Lê wê got gava tu çû incax ez ji te re bibêjim. Dotira rojê min telefonî wê kiribû, lê ne musaît bû ku ji min re wê peyvê bike. Ji min re got rojek dinê telefon bike. Roj ew roj e, ne min telefon kir û ne jî ew gotina ku wê ji min re bigota, ez hîn nebûm. Her ku navê wî bajarî derbas dibe ya jî rîya min pê dikeve, ew gotin tê bîra min.”

Erê, lê min ê ci bikira ku bîranîn bahra mirinê ne, lê dîsa ez vege-riyam bîranîna xwe yî ewil. Ü niha di vê şevreşîya hanê de ez û keçikê li ba hev, bi destpêlkê dipeyivîn. Bê ruh û bê his. Wek ku keçik

li benda min û bersîveke erêni bû, lê nîherî ku di bahra bîranînan de ez xwe li avê dixim, wê gavê ji min re ev got:

-Tu zanî, tu bê hîs û bê ruh î.

Ez wê gavê li ser vê peyvê pir nesekinîbûm. “Bê hîs û bêruh” bûn çiqas peyvek giran e ji bo mirovan.

Lê heta kû? Bê bersiv min ev pirs ji xwe dikir. Dil dixwest bîbersivanda. Lê min werr hîs dikir ku di hişê min de ci agahiyên hebûn, ji mejî bar dikir. Li dû xwe jî pûsûlayek weha dihişt:

Dem bîhurîn, Em man li şû-na waran.

Di nav tenêtiyê de nigên min ez dibirim okyanûsa mirovan, lê laşê min ji ber tenêbûnê dilerizî. Her çiqas min ji qederê û ezabê hin tiştan pir bawer nedikir jî, dîsa wekî ji insen re xof çedibe û carna sebebê vê tenêtiya xwe bi meseleyên weha ve girê dide.

Rêyeke bişewq, afişen sînemayan û elektrîkên rengo rengo, bê hemdê mirov, reşayî dianî ber çavan û li ser çavan rewrevok çedikirin. Û niha min xwe jî ji van rewnero-vakan yek dihesiband. Lê heta kû? Bê bersiv min ev pirs ji xwe dikir. Dil dixwest bîbersivanda. Lê min werr hîs dikir ku di hişê min de ci agahiyên hebûn, ji mejî bar dikir. Li dû xwe jî pûsûlayek weha dihişt:

Dem bîhurîn, Em man li şûna waran.

Tirsa min ne tenêtiya vê êvarê bû û belkî jî ne bîranîn bûn. Sibê û dusib gelo ê çawa bûna, bi rastî ya ku ez aciz dikirim, ev bû. Ji bo wê gavê êdî ji bo min ferq di navbera roj û şevan de nemabû, ji bilî germ û serma mewsîman.¤¤

Kostantînos Kawafîs

(1863-1933)

Rênas Jiyan

Di helbesta cîhanê de cihekî karîger û cihêreng digire helbestvanê İskenderiyeyî ku bi eslê xwe Girekî ye. Di helbestên wî de her çi qas hindikahiya hêmayan şenber be jî, hest, dîrok û zanîn bi awayê giyan, goşt û neynûkê bi hev ve yekgirtî ye. Mîna arkeologekî mijarêن xwe vedikole û li bêqusûriyê digere. Sembolên bi kar anîne bi giyan û şibandinêن xwe kelijandine. Dekor di helbesta wî de jê re bi qasî hêma û sembolan girîng e. Piraniya babetên xwe ji mêtûyê hilbijartîye, ew bi xwe jî di mêtûyê de kûr e.

Bengînê ziman, çand û dîroka Girekî ye. Kavafîs, Erotîzm bi awa-yekî sayî raxistiye ber çavan.

Her çiqas heftesalî diçe ser dilovaniya xwe jî, Seferîs dibêje “ber-hemên bedewtirîn ku wî ê hê biafirandana hebûn, nîvco man”. Kavafîs bi xwe jî dibêje “hîn bîst û pênc helbestên ez ê binivîsim heye”, lê dîsa jî di helbesta nûjen a Girekan de bêhempa ye. 1904an de pirtûka xwe ya ji çardeh helbestan pêk tê diweşîne. Ew pirtûk her çi qas ji bo rexneyan nayê şandin jî, ji rexnegiran re, bi dengbînî dîsa jî tê pêşwazîkirin. Di 1910an de li eynî pirtûkê duwanzdeh helbestên din ji zêde dike û careke din diweşîne û ji bilî vê pirtûkê tu pirtûkan na-wesîne.

Di nav helbestên wî de, helbesta wî ya bi sernavê “bajar” helbesta wî ya herî navdar e, di herikandin û hûnandina ristan de ya herî rengîn, cîhewaz, lîrîk û xwerû ye ku ev helbest panzdeh salan li ser maseya xwe ya xebatê hiştiye û dû re qedandiye.

BAJAR

Te got, "Ez ê herim welatekî din, zeryayeke din.
helbet ji viya çêtir wê bê dîtin bajarekî din.
Qey qeder e wî, dest diavêjime ci, bi pêsiра min ve dizeliqe;
û tu yê bibêjî qey meytekî veşartî ye.dilê min.
Li vî bajarê beyar wê hê pîr bimîne hişê min.
Ruyê xwe çawa diguherim, li kûderê dinihêrim,
derdikevin pêşberî min xopanên reş ên jiyana min,
Salên xwe malmîrat kirin min ew belasebeb kambax kirin"

Tu ê welatên nû nebînî, wekî din deryayan
tu ê nebinî.

Dev ji te bernade ev bajar li eynî kuçan
tu ê bigerî. Li eynî taxan tu ê pîr bibî.
Li eynî malan tu ê por sipî bikî.

Cîhê tu ê heriyê û lê vegeŕî ev bajar e, yekî din hêvî neke
tu keşti, tu rê nîn e ji te re

Li van quncikêن piçûk
li van deran tu xwe malxerab bikî
li hemû deverên cîhanê tu ê malxerab bimînî

Ciwanê Abdal

Cîhê Zarokêن Cinna

(Xan - Kaniya D ROZ)

I- Berê şevê

- Bi rastî ev kar ji me re divê ku em bikin, nema wilo dibe, divê em xwe biguherin, a wa lê dikin û ava dikin bi rengekî nûjenî, qene di guhê ga de razayî me ez..!

Narot li ser cihê xwe pal daye, cixareyê dimêje û bi dûyê wê jî dilize, ji devê xwe ilor dike, giloveran çê dike; gilover her ku dihere, mezin dibe... heta dawî ji hev diperçive û hundur tev mişt mij û moran dike.

Diponije bi mijâ xwe re, bi vî awayî diramiya bi jina xwe re, Torne, ya nuha zarokan bi zor dike xewê, geh bi tirsandinê, geh bi rûtirşî; hûr û pir in di ser serê hev re ne... serê xwe hil da û li mîrê xwe vegerand:

- Çima tu ê serê xwe biêşînî û serê me jî, kar û xebata xwe tu ê bîhêlî û bi destê hina din de berdî...

- Ji min nayê û ez nikarim her evî Kuflâtê hûr û pir bi nan û cil bikim...

- De ji xwe re lê binêre, ev xaniyê kevn û xir î xirpope! Wî hilwesîne û ji nû ve ava bike. Bi xwedê kî tu ê ji kê re ava bikî, dev ji xwe û vêya berde ha!

- Ji min napırsî ez ê ci bikim? Ez ê vî xaniyî xera bikim û asasa di bin de ez ê xweşik ava bikim ji nû ve. Xelk ê ji dûr ve bênenê û em ê xweş fêde û kival bikin, keçê!

Jinik bi cilê xewê ye, kirasekî tenik lê ye û taziyê wê diwêne. Mêrê jinê lê dinihêre, dilbijokiyê ew girtiye bi sarî... Gava herdu pêşîr dilivin di cîhê xwe de û memik belû dibin...

Pal daye û serî daniye ser destê xwe, bi cixarê re dirame, hundurê wî fireh e bi qirqaf û alav e, bi tejik û kulav e, mirov dikare bibêje tiştekî kêm tune ye. Bav û bapîrê wî ji mêj ve eşqiyatî û keleşî dikirin, li nav van deşt û çiyan, xelk talan dikirin û him dizîn. Narot bi xwe bi vî tiştî xweş dizane û xwe pê paye dike carna û dibêje:

- Ew dema mérän bû, wê demê wiha diviya.

Ev xanî û hin erdê han yên li der û dorê jî, ji talaniyê girtine, bi êrişa li dû hev, êl û eşîr berbat û sirgunî penaberiyê dikirin û gel derxist serê çiyan û cîh li wan teng dikir.

Xelk malbata Narot xweş nas dikin û dibêjin bav û bapîrê wan mala Şerûdan e. Çimkî kes nemaye ku bi wan re şer nekirine, bi sûc û bê sûc, kes nizane ji kû ve hatine û wiha bi çav sorî zorê dikin li vî warî.

Li jinê dinihêre bi tolazî û girêza xwe him dicû jî.

- De werê rakeve, ma qene tu ranakevî?

- Erê, ev tenê li bîra te ye! Hişê te çûye lo! Tu ji vî awayî re jêhatî yî eşed-û-billa binihêre, ez nikarim tu ê bi xwe bikî...

- Erê... her tim tu wilo xwe didî alî.

- Mal û zarok besî min in lo...!

Û her wiha hêdî hêdî bê dengiya şevê ew cûtin wekî her carê...

II- Serê sibehê

1- Kesk

Li gastînê hewşek, ne fireh e û ne jî teng e; berî vê dawiyê odayek mezin avakirî bû.

Li der û dorê dizîvre. Ew xweş dizane bi vî xaniyî, lê nuha wek cara pêşîn, nuh dibîne. Büye kelehek li ber çavê wî, bilind û mezin e.

“Lê lê Êmê... nizanim jî kîjan aliyî bêmê.”

Kes nizane bê çawa ava bûbû. Ev tişt dîrokî ye; belkî dîrok bi xwe jî nizanibe, ji mêj ve û kevn e û pir xelk li mîvan û him hatine talana wê jî diz û keleş, di dawiya şevên reş de; lê, ma di cîhê xwe de ta nuha û bawer in ew ê her bimîne...

(Lê lê Êmê... nizanim ji kîjan alî bê mî).

Li der û dorê dihere û tê, ku nîşana qelsbûnê bibîne...

Serê sibehê ye û roj tîrêja xwe berdide xwarê wekî her car, bi ser tevan de.

Law bi navê Dînor û Maz û keçen wî bi navê Çile û Pano û Atêre têne dora wî, ber bi selemeyê dihere, bi pêlikan hildikişe. Waw çendî bilind e! Li ser banî li dora xwe dînihêre, tu kes elaqaya xwe jê nayne. Law alavan digihinê, bivir, bêr û hin mer û tevir, her tişte xwe baş amade kiriye.

Dest bi kar dike û bivirê pêşîn li seyekê dixîne, du çavê kaniyên xwînê der dibin. Li der û dora xêni dimeşê, qêrîneke hewarî kete guhan; lê got qey ba ye.

Derbe pir bûn bi bivir, bi mer û seyek hilanîn û danîn. Tozek ilor bû mij û moran girt, nema hevdu xweş dîtin. Toz hilm dikir jî dêleva ba û oksijenê.

Hilm dikişand û berdida, hin dikuxiyan û hinan destê xwe datanî ber dev û pozê xwe, bi destekî tenê kar dikir, tu kar ji ber wan nedî çû.

Hildihat û dadihat bi pişkê re, axîn û nalîn bi wan dipijiqî, hinan ax û pûş dikolan û diavêtin, çaviyêن kaniya xwînê û devê axînan binpoş kirin.

Dikolin; lê pê re Narot dibîne, kûçik û hirçê nava wî dizorin ji birçinan. Nan dixwaze, heta ku digihêje ber, law û keçê wî jî dixwin û hîn jî divêن. Her ku hinekî kar dikan, dikan ji birçibûna û him ji tîbûna ziwa bibin. Avê dixwazin, zû bi zû nagihêje wan û ava kaniyê (xwînê) ya nuha der bûye, li der û dora xanî-pîrozi. Dadikevin yeka-yeka û cota-cot, ax û hin qırşan didin aliyekî, ji bo tîna xwe têr bikin.

Di bin axê û pûş de winda bûye... Çavê kanîkê û him jî cihokên wê... Zimanê wan kişiyaye û çav li wan sor bûne. Tozê lê danî, kes kesî nas nake, ji hev re got û şêwra xwe kir. "Divê em vê axê û wî pûşî bidine aliyekî..."

Her şeş-heft, ji ban daketin û rabûn dest bi karê binî kir. Narot li lawan radibû, dibîne ku rêya avê girtine:

- Nalet li we be, hûn li wê derê çi dikan! Bi Xwedê hûn nizanin tu karî bikin kuro! Em ê ji serî de biherifînin û dawiyê em ê axê biavêjin, dolêñ kerê?!

- Bes lo xurifiyo! Tu li wir be û em ê li vir bin, heh! Heta ji ber hev derkeve.

2- Sor

Bi bêran û bi melêvan ketin nav; ji aliyekî didane aliyekî, lê bê sûde bû, ji vir radihêjtinê û li cîhekî din kom dikirin. Dişandin zembilan û erebanan û tûrikan û dawî nedihat. Kar û barê wan her fireh dibû û bêtir asê dibû. Narot şand dû karkerê bi rojane kar dikan, ku alî wan bikin.

Ji wir jî radihêjtin li cîhekî din kom dikirin. Dawî nedihat û ava kaniyê xuyanedibû. Dengê xwişîne dihat... lê av bi kû ve diçû.

Ü her wiha tî diman.

Xelk hatin wan bi gilî û gazinan û bi dijûn û tifan.

- Hûn çi dikin vê sibehê, çi li we qewimiye... We av li me qut kiriye û ew ji me re lazim e?..

- Na... av şolî kirine ji serê kahniyê... hûn ê çi bikin ji me..? Hûn ji Xwedê natirsin?

Hin jin û zarok jî hatin, sixêf û dijûn ji wan re kirin. Narot û law û sîxurên wî, guh nedan kesî.

- Bes ténê piçekî bêhna xwe fireh bikin, ev tişt ji bo we ye.

Ji toz û mijâ ilorbûyî kesî xweşik kes nadidît... lê lawêن Norat ziman li wan kişiyanbû û tîbûnê bi gewriya wan girtibû... Ji ber wilo, baz didan der ve û çi gîha diket ber wan, diçûn û dimêjtin, ku avê jê bidoşin. Lê mexabin tu sûde jê tune bû, tenê tîbûn li wê rastê digeriya, ji aliyekî zor didan kar û çavê kaniyê biparêzin û cihokê paqij bikin...

Dihere û tê, vedigere, roj li wan dere ava, bi xwe rok di bejna asiman deye hîna, belê ji mij û tozê nexuyaye... wenda ye, ji ber kar û finasên van Beşeran;

Cihoka avê piçekî vebû û hin av xuya kir, bang li hev kir bi dengekî ketî: Deng kûr tê. Bêhn û hilma xîzînê diafire.

- Werine avê!.. vaye av, haho vaye av!..

- Ka av?.. Tu bi xwedê kî, ka av?..

Mîna pezê ji ser xwê rabûye... Erê, çîma na, tev toz û qîrş vedixwin, bi ser rû û serê xwe de dikin û xwêdana ji serê vê sibehê dişon.

Hevdu dahf didin bi pî û milan, him-him ji wan tê, kes kesî nas nake... Baz didin ser serê hev, kî ê berî yê din vexwe.

Bi ser piştê de ketin û paldan li wê rastê.

3 - Zer

Narot deng li wan kir:

- De bes e, bû dereng... Rabin; bes e, rabin kurê min.

Bela bûn dîsan li kuçeyên xênî; dest bi hilweşandinê û herifandinê kirin. Merdiyaq û beşt dane aliyekî ku bi firoşin li Ewrûpa wek antîkayan û şopemayin, yan ji xwe re bi wanen xaniyekî din lê kin.

Her ku ji cîhê xwe derdiketin û digihaştin erdê, dibûn mar û ziya û dişemîtin û bi avê re diherikîn û her kîlîkê ji xwe dizan û pir dibûn li wê holê didan lotikan mîna marê Pêxember Musa, li hemberî caddûbazên Firawûnan.

Her weha ku hin kelpîç radikirin, mar û çelemar ji ber beştan û merdiyaqan diketin ji nişka ve, li kelmozek mozên sor rast dihatin û bi wan "Narot" û lawêن wî û sîxuran jî û him mûzqirtik jî hatin wan bi sedan ji her aliyî de êrîş dikir. Çima war û kişwarên wan xera dikirin. Hinekî di ber xwe de dan, lê bê sûde ye, her yek jî bi xwe aliya, bi wan ve dan; ne yek û ne du, car û ducar.

Kulm li ser çavêن wan dixistin, serî li wan diwerimî, hew... ji dest xwe avêtin alav û ci tiştên din û bi destan diqewirandin.

Fêde tune, ji dîwar daketin xwe avêtin û reviyan vi aliyî- wi aliyî lê giş dihatin wan.

Ne ev tenê, heta bi pelçîmokan ji bin beşt û merdiyaqan derdiketin û dihatin wan, yan xwe di avê wer dikirin û baskên xwe yên şil û tev bi mîzê dipijiqandin ser ruyê wan.

Êrîş li wan pir dibûn ji her cîhî û bi pir rengan ji vî aliyî ji wî aliyî. Rev ma bi dest wan. Ne rev jî bi tenê, di wê toz û moranê de heta ax û qırş li serê xwe da dikirin ji dû vedigeriyan. Ew çawa nas dikirin? Ev finas, gava yek ji wan lawan Dînor terpîlî û ket bi ser ruyê xwe de û komek ax hebû li rastê, Narot bankirê ji cîhê xwe...

- Lawo axê bi serê xwe dakin û baştir e ger herî be; avê jî bi ser dakin...

4- Rêş û Sipî

Her weha dûr reviyan û li xêni nihêrîn bi xezeb û diran diqirçandin û serê xwe yê werimî dixwirandin bi naperûşkan.

- Yabo ci ji me re lazim e... te di ca me niyo! Û tu ê dawiyê me wenda bike lo!

- Yewel, nalet li namûsa we bê... Bênamûsino her hûn ê wilo baz bidin û birevin; min nizanîbû hûn ew qasî bizdonek in lo!

Ji dûr lê dinihêrîn. Ev xaniyê kevnar lê bûye li ser vî çavî-kaniya, ku bi navê xaniyê pîrozî ji mêt ve li vê rastê ji hişê xwedê afiriye...

Wek ciyayekî û xelk pê û bi ava wê xwe derman dikin ji nexweşiyê û piř pê sûnd dixwin û têne ziyaretê.

Lê dinihêre û dikuxe, ji pişkan dagirtiye kîn û dixs û lawêن xwe û hîn sîxurên xwe êrîşî kar dike û gûr dike ku vegerin dîsa.

Kes bi pêş de neçû, gavek li pêş, du gav li paş û kelmûza mozê sor û mûzqirtik û hin pilcimok ci mêt û kelmêt... Ezman heta bi aso girtiye.

Narot deng kir û got bi xîzînî:

- Ger ji çar dîwaren dîwarek bikeve, ê dawî bê!

Kes nelebitî û ruyê wan bûbû wek yên berazan... Bû himehima wan û serê xwe veşartin û di nav tiliyan re li hev dinihêrîn, li bavê kal venedigerand.

- Bênamûsno! Bêkêrno! Serpêlno! Dîwarek e hûn nikarin hilweşînin, dîwarek tenê, ew ê gişkî hilweşîne.

Narot baz da binê dîwêr û bivir bi destê xwe girt, piştî serê xwe bi herî kir, got “ya Allah û ya Xwedê” û bi dîwar ket, guh neda kêzikan “lawiren firok” yên li der û dora wî divinînin û pê ve didin.

- Dîwaro, bikeve! Bikeve!

Dîwar hejiya û dengê girî pê ket.

- Dîwaro, bikeve! Bikeve!

Û na welleh, dîwar ket û toz ilor bû, mîna babelîskê zîz bû heta bi ezmanê jorî... Zirav û dirêj û stêr hildihat û dadihat, keriyê ask û pezkoviyan dihatin û difiriyan.

Baran barî... heyy li rokê siwar bû.

Û qêrînek mezin û erd çiriya... Agir pijiqî mîna volqan verşıya... Dawiyê dîwar ket bi ser Narot de û qêrînek wek zirîna keran û orîneke lawiran jê hat û vemirî.

* * *

- Lo lawo... çi bela we ye hûn çiyan dipûşînin.

Yekî din digot:

- Ev xanî pîroz e... “Ocax zaddene”...

Lawek ji wan bi zimanekî dirêj got:

- Na... ev cîhê Cinnan e, ev cîh ne xalî ye.

Bi rastî zaroyên CINNAN tê de dijîn ji mêj ve.

Ji hev re got û serî hejandin.

Ahmet Telli

Di berfê de şop

Şopê dihêlim li ser berfê bila nêçîrvan bi pey min bikevin
Bila min bikujin li qiraxa newalekê ma ne dinya
Newaleke her dike xumexum bû ji xwe.

Şopê dihêlim li ser berfê bila nêçîrvan bi pey min bikevin

Navê xwe dinivîsim li ser berfê û fîkîna xwe mîna qêrînekê
Bilind dike û xwe digihîne min pûka li dû min
Ji daristana spîndaran şaxekî dişikîne û jê dibe navê min

Rabirdûya min bi bêdengiya berfê tê vebirîn êdî
Bîraniyên min qeşa girtine evînên min şewata berfê
Umrê min hebeke berfê ku li serê tiliyên min dihele

Şopê dihêlim li ser berfê bila nêçîrvan bi pey min bikevin

Gava berf dibare bi tometan keser dikeve
EZ dibêjim ku berf û keser lênuška seyrê ya evînekê ye
Tenê bi rêyan û jihevqetînan gengaz e vegotina wê

Şopê dihêlim li ser berfê bila nêçîrvan bi pey min bikevin
bila min bikujin li qiraxa newalekê bila min bikujin
Bi hakehakekê ez ê lêxim û herim ji deştên berflêgirtî

Divê helbestvan bêne kuştin jiyîn li wan nayê...

Ji tirkî: Elîxanê Şido

Bextewariya îdeolojîk

Remezan Alan



Ereb Şemo

Hin nav, li beriya hebûna xwe hene; qey meriv dibê gavek li pêsiya xwe ne. Ev nav, li ser hiş û hişyariyan bûne kût.

Dikarim bi hêsanî bibêjim, ev taybetî, ji eş-qa “gotin” û “guh” tê pê. Destgirtiya gotinê guh, bi vî awayî guhbelî dibe û daîreya bandora xwe dihûne. Hin caran, me li ser kirin, xebat, jiyan û berhemên kesinan tu tişt nexwendibe jî bi xêra vê daîreya razber, em dibin xwediyyê zanînekê. Lê ev zanîn, çi gotinkî û çi bihîstokî be, deriyê mythosê(*) vedike. Hingê ew zaniyârî, bêbingeh bilind dibe û zanebûneka tiral tîne pê.

Hê nû dibînim ku tiştê ez di derbarê Ereb Şemo de dizanim (yarastî, yê ku nizanim), li ser vê teweriyê bûne. Ev nav, naxwe, bi gotin û guh ketibû nav repertuara min. Piştî xwendina du romanên wî, ez fêm dikim ku ji vê repertuara pasîf hê nû xelas dibim.


Di vê nivîsê de, tiştê ku bi metnê, tenê bi metnê, hîn bûme ez ê ji we re pêşkêş bikim.

I

Romana Şivanê Kurd, ku li ser wê “roman” dinivîse, di sala 1935an de, li Tiflisê çap bûye. Salêن beriya şoreşa 17an, salêن şoreşê û salêن komsomol û kolxozan tîne ziman. Ji xwe meriv dikare vê vegotinê bi sê besan çarçove bike.

Ev vegotin heya rûpela 81ê -ku bi temamî 112 rûpel e- wekî oto-biyografiyekê ye. (Ji ber ku Ereb Şemo bi navê xwe dest bi çîrokê di-

ke û pê ve diçe.) Rewşa malbatê, salên zarokatiyê, şivanî, xortanî, şer, tevgerên siyasî û xwenasîn, şopa **bildungromanê** diajo. Lê ev vegotina zimansivik û herikbar, di dawiya romanê de, di beşa "Kurdên Alagoz" de, dev ji serpêhatiya leheng û kîpa vegotina xwe berdide. "Ez û min" dibe "ew û wî". Ew qewimînên ku bi şahidiya Ereb Şemo têne bilêvkirin, dorê dide perspektîfeke din. Vebêjer xwe bi paş ve dikişîne û kirasekî din li xwe dike. Nizanim çima, nivîskar di ser jiyana xwe re gav dide û tê ser tenqîsteke din?



Her ci qas piştî rûpela 81ê êdî yekî din, Misto, derdikeve sahneyê jî, ev pêşanî hem ji aliyê bilêvkirinê, hem ji aliyê şêweyê û hem ji ji aliyê cûreyê ve derbeke xedar dixwe. Belê, ji aliyê cûreyê ve jî dixwe, lewre em nikarin bibêjin ev vegotin otobiyografîk e! Ger wisa bûya, pêwîst bû ku seranser bi "ez û min" êbihata bilêvkirin. Lê nivîskar ji qisetê re sitariyek peyda nekiriye.

Ha, xwendevanê jîr -yên ku Şivanê Kurd û Jiyana Bextewar bi danberhevî xwendine-dikarin bibêjin, "yaw, lehengê beşa dawî Misto jî Ereb Şemo ye!" Rast e. Bi rastî jî wi-

sa ye. Li cîhekî Şivanê Kurd, "Bi rastî ev Misto kî ye? Hûn giş baş dizanin ku bavê wî û ew bi xwe li cem tirk, molokan, ermeniyan û kurdan şivan bûn. Tu cara, ji olçekê bêtir zadê wan û ji kerekî pê ve tu dewarê wan nebûn"(1) tê gotin. Ev taybetî, tev li Ereb Şemo tê. Yeka din, di Jiyana Bextewar de, Misto dîsa şoreşgerek e û bi Akademîk Orbeliyê Kurdolog re dixwaze li ser alfabeylekê bixebite. Ew dê bi wî re li ser çanda Kurdên Qafqasyayê bixebite. Di rûpelên 194 û 195an de ev yek tê gotin. Dema ku em li jiyana Ereb Şemo dinerin, em dibînin ku wî di 1929an de bi Akademîk Hovsêp Orbelî re, ji bo alfabeyleke kurdi pêwendî daniye. Yanê her du Misto yek in û du siyê Ereb Şemo ne.

Lê ji bo ci, ji ber ci Ereb Şemo di vê vegotinê de xwe daniye aliyekî û bi navekî din qedandiye çîroka xwe? Tu bersîva vêya tune ye û bi baweriya min, ev hûnandina keyfi, xisareke mezin daye vegotinê.

Em dikarin bibêjin di Şivanê Kurd de tehlîla psîkolojîk nîn e. Ya Ereb Şemo bi xwe jî nîn e. Ji ber ku gava birayê wî Derwêş terka vê dinyayê dike, li ser vê tu tişt nayê gotin û dîsa dema wextekê mirina

bavê xwe dibilhîse jî di derbarê hestên wî de tu tişt nayê gotin. Ev herdu tecrûbeyên mezin û jandar wekî pelweşînekê tê vegotin. Ji x-we, gava mebest nîşandayina pozberiya çinî ya navbera beg/axa/şêx û gundiyan be, dê “cîhana hundirîn” ne rîgazek be! Bingeh dê şerê serdestan û bindestan be. Belê, ev yek bala Ereb Şemo dikişine. Lewma rastiya kesan a derveyîn bi pêş ve derdixe. Di beşa dawîn de êdî dê çêla jiyaneka serbixwe, wekhev û ji mîjokiyê dûr bike û ji bo vê yekê jî pêvajoya devtûj dê bê vegotin.

Lê divê nivîskar tenê çela tekoşîna çinî neke, rîberên wê jî nîşan bide. Lewma li hember kedxwaran, di dawiya vegotinê de, gundi û xebatkar radibine ser piyan û ji bo jiyaneka hevpar ala sor bilind di-

Roman beriya her tiştî xwedîyê korsa bûyerê ye. Lê korsa bûyera Şivanê Kurd nîn e. Her ci qas nêzîkahî li “romana otobiyografîk” kîrîbe jî, bo hazırlîya romana Jîvana Bextewar taslaqek e ew.

ku vê yekê bi awayekî “hûnerî” dike. Na, ji ber ku tu tehlîla vê guherînê nake. Tenê guherînek diqewime û qewimîna vê guherînê tê vegotin. Bi xêra yên wekî Misto, bi propaganda û ajitasyonê civat di-guhere û bi dû re zîncîra desthilatiya kedxwaran dişkîne...

Ji xwe di pir cîhan de nivîskar dev ji bilîvkirina romanê berdide û şîrove, bawerî û fîkrîn xwe pêşkêşî me dike. Mesela;

“Belê, li çola û li beriyê, di nav tehtan de û di newalan de, ji van kurdên reben re, bi tenê Hikmê Soviyetî bextiyarî, xweşî, azadî û pêş-veçûn anîn...”(2)

Li ser vê xetê vegotin methê dadmendî û xweşîya rejîma nû dide di pir ciyan de û bi vî rengî di quncikekî edebiyata **partînost** de cîh digire. Lê ez ê bêhneka din werime ser vê mijarê.


Ji aliye şêwe û hûnandinê ve du-sê derzê din yê vê vegotinê hene. Pêşî, di navbera beşan de, girêdanekî organîk nîn e. Hebûna beşan, destpêk û dawî, ne bi bala zanebûnekê ne; pariye kî belawela ne. Mesela di beşa “Daweteke Eşîm” de, piştî hin agahiyê folklorîk, daweta Emînê tê vegotin. Lê di eynî beşê de; “Eve salek e ku Emîne mîr kiriye. Li gora hesabê wê ev sêzde heyiv in ku hatiye mala Bro.”(3) tê gotin. Ji xwe di qisekirina serpêhatiyê de lez û bezek heye. Ev yek jî, du xisaran dide vegotinê:

1- Ji lez û bezê, lehengên vegotinê bi awayekî kûr nayêñ danasîn; ku ev yek ji bo her romanê ferz e.

2- Lazimî û nelazimî ji hev nayêñ vegetandin; lê belê roman, pari-yekekî jî vegetandina van her du tiştan e.

Lewma ez dibêjim “vegotin.” Roman beriya her tiştî xwediyê kor-
sa bûyerê ye. Lê korsa bûyera Şivanê Kurd nîn e. Her çi qas nêzika-
hî li “romana otobiyografîk” kiribe jî, bo ha-
ziriya romana Jiyana Bextewar taslaqek e ew.

EREB ŞEMO
JİYANA
BEXTEWAR



II

Jiyana Bextewar bi taswîra gundekî, gun-
dê Dêrikê, dest pê dike. Gundî, bi xebata
xwe ya havînê mijûl in. Li ber pez, bênder,
baxçe û zeviyêñ xwe ne... Di nav vê rewşa
rûtîn de ev xebera ha tê: Silêman Beg, qey-
maqam û milazimê padîşêh hatine gund!

Ev bûyer, bi dû re, çarenûsa wî û bîst gun-
dê din diguherîne. Ji ber ku ev ne xebereke
xêrê ye. Kesê ku hatine, ji bo bac û xeracêñ
salane hatine. Ji xwe piştî bêhnekê diyar dibe, ku ew ê ji gundiyan du
hezar pez û pênsed bar genim bistînin, li ser navê padîşahê Romê. Bi
gazgaz û bertilan, ev yekûn tê hezar pez û du sed bar genim. Lê gun-
dî wek navê xwe dizanin ku hê sal neqediyaye, ew ê careka din bêñ û
wan talan bikin dîsa. Lewma bo jiyanekê nû, li şeveka tarî, berê xwe
didine ûriseta wî zemanî; dawiyê jî li dora Nexçivanê bi cih dibin.

Sedema vê koçberiyê, xwesteka xilasbûna ji zilma kedxwaran e. Ji
ber ku keda wan her sal diçe, dikeve xezîneya padîşêh, bêrîka mila-
zim, karmend û begêñ milêñ wî. Lewma, bi çavê hêviyekê û sitariye-
kê li wî welatê nû dinerin. Bi hin aliyan ve, welatê çarî, ji desthilat-
dariya Romê biwijdantir dixuye. Gundî pir kêfxweş dibin di serî de.
Lê piştî çendekê, dibînin ku sazûmana civakî ya vî welatî jî li ser
kedxwarî û mêjokiyê ye. Belkî bacêñ wî bi qasî yêñ Osmaniyan giran
nîn in, lê rêk û pêka vî welatî jî, kûlak(*)an dike desthilatdar. Gun-
dî, bi “angarya” yêñ wan perişan dibin; di destê wan de tiştek berhev
nabe; bi nan û zik in. Li vir jî di şûna Silêman Beg de, Mîrza Beg, Sa-
lih Beg, Mistefa Beg, Teyo Beg, Meşedî Abbas Xan û Taşnaq hene...
û rêka Ürasetê, ji xwarin û milkkirina kedê re rê dide ziç û kirniyan.

Li aliyekî xizanî, li aliyê din dewlemendiyeke gempersstûr!.. Ji xwe
rêgaza pevçûna vê romanê jî ev e.

Hilberîna civatekê dema li ser pişta çanayî û xwedîkirina heywanan be, elbet dê tekoşîna çînî jî di navbera gundî û began de be. Jiyana Bextewar, xwe li ser vê tezê dilivîne û bi vî rengî panoramayekê nîşan dide. Hema bibêje heya nêvî, lehengekî berbiçav yê romanê nîn e. Mebesta nivîskêr ew e ku ji wê dewrana serobino, ku ji talanan, koçan û kuştinan tê pê, hin zolakan bide. Lewma heya nêvî, korsa bû-yereke zelal a romanê nîn e. Yanê rêzkirina teferuatian heye. Dramên ferdî û civakî, di nav hev de, ji hev cihê û carna jî li rexê hev in. Û rewşa wê dinyayê, bi ser pevçûn, kuştin, talan û kedxwariyê tê pê...

Û dû re “Şoreşa Oktobrê” pêk tê. Salêن şerê hundirîn dest pê dike. Lê bolşevîk roj bi roj tekoşînê ges dîkin û parseng û mêtîna rîdanan diguherînin. Di van beşan de pesindayina Lenîn û bolşevîkan derdikeve pêş. Gundiyênu ku ji vê tevgerê agahdar in, li hember kedxwaran dengê xwe bilind dîkin. Û dû re, piştî qedandina şerê hundirîn, bo jiyanekê azad û wekhev, êdî pêvajoyeke nû dest pê dike. Milk, bi gundiyêñ bêmîlk têne parvekirin. Kolxozi têne saz kirin. Hingê, jiyanekê “bextewar” jî dest pê dike.

Di van beşan de, em dibînin ku gundî, êdî ne bi zorê, bi coş û heycanê dixebeitin; govendê digirin û stranan dibêjin. Êdî xebat ne bo angaryayê ye, bi dil e. Û ev hevokên li jêr jî, ji bo nîşandana wê dewr û dewranê hatine nivîsin:

“Aliyê klûbê dinê, hinda mekteba gund, ringîniya defê bû, cahil ketibûne govendê, ji xwe ra kêf dikirin, dilîstin.

Hine kal jî başqe xwe re rûniştibûn, derheqa otaxê teze de xeber-didan. Hineka digot, gerekê sibê herin kîrana bînin, bana elektrîkê ji gund bibine goma pez û bêderê, wekî şevê di bêderê da ber ronkaya elektrîkê nan bikutin.

Hine qîz, hê ji xebata mala xwe vala nebîbûn, qeynter û cêrê wan li ser mila bûn, lez çûne kaniyê, avê bînin wekî ew jî herin xwe bigihîne def û zurnhe, bilîzin..”(4)

Lê belê eyñi ew sal in ku bi navê “li hember kûlakan şerê çînî” pevçûn dest pê kiribû û rezerven toximan hatibû misaderekirin. Li wan salan, 1930, bi tenê li Ukraynayê nêzikî 4-10 milyon insan ji xelayê serî danîbû. Nêzikî 25 milyon gundî di kolxozi û sovyetan de hatibûn xebitandin û dewlet, keda wan bi buhayekî erzan kirribû.

(Rastiya romanê, çîma ji vê rastiya heyî dûr e, ez ê pişt re werime ser.)

Eve tam di van beşan de, di beşen bextewariyê de, lehengekî romanê çêdibe. Ya rastî roman, li gora teza xwe lehengekî dertîne pêş: Sehîdê Emerîk! Sehîd, ferdekî vê sazûmana nû ye ku li ber çend rê dan hatine raxistin. Ev taybetî ji aliyê Sehîd bi xwe tê eşkerekirin:

“Partiya bolşevîka roniya rêya xebatçîyan e. Roniya gundiyê kesîb û zehmetkêşan e, wekî Lenîn-Partiya bolşevîka nebûya, gelo kê izin bida ewladê kurda yê kesîb, wekî bê bajarê padşê û bê pere, bi kincê rind û xwarina baş bixwe û hîn be.”(5)

Bi rastî, roman, bal û dêla xwe dide vî kesî ku bi nîrxên nû gîhiştiye. Sindanê romanê êdî ev kes e. Sehîd: Şagirdekî herî jîr yê enstîtuyê ye; lê dema xwendina xwe kuta dike, vedigere gundê xwe û ji bo avakiriin û pertkirina kolxozan dest bi xebatê dike. Dibe katibê teşkîlata partiyê. Şev û rojîn wî bi xebatê derbas dibin, û di ber de jî dersdariya zarokên gund dike. Bo adaniya hilberînê li tewl, gom, mal û zeviyan, teftîş dike her tim. Ne qîzên bedew yêni li dorê û ne jî xwesiya biharê xwema wî ye; wî, xwe ji pêwîstiyêni biyolojîk şûştiye û pêwîstiyêni politîk li xwe kirine. Car cara ku diya wî bibêje “Lawo, usa nabe, tu sibê zû diçî mektebê, paşî diçî Hacî-Xelîlê, ji wê derê têyî, qe nayê mal, düz diçî kolxozê, bêje min tu yê kengê nan bixwî? Kengê tu yê wextê da bêyî malê?” jî, ew, xwe ji xebat û lebatê nakişîne.(*)

Eve Jiyana Bextewar û bi awayekî jî Şivanê Kurd, ferxên edebiyateke wisa ne ku ew jî hezar romanan du libên bextewariyêni ideolojîk in. Lê nîvîsandina wan a bi kurdî, dîsa di tûrê kevneşopa me de, reng û serzêdeyek e.

Lê esil, qewîmîna bûyereke din tacekê datîne serê vî şexsiyetê nû. Şerê cihanê yê duyem dema diqewime, fersenda nîşandayina fêris û qehremaniya Sovyetê dikeve dest. Sehîd ji bo vê yekê, kesê herî minasîb e. Nivîskar eşqa wî ya xebatê diqilibîne ser welatperweriyê. Êdî ew ê geh bi fenan leşkerên Nazî qîr bike, geh leşkerên dîl-girtî bide peyivandin û derbênen xedar li dijmin bixe, geh derkeve li ser topê û ji topkaran çêtir gulleyan biavêje. Mesela di cîhekî romanê de ev têne gotin:

“Carna, wekî topçî qeziyek lê biqewimiya, wê çaxê Sehîd bi xwe li ber topê disekinî, topê agir dikir. Wextê Sehîd topê agir dikir qe gulleke wî vala nedîçû. Faşistê wê derê yek xilas nebûn, heçî yê ku nehatibûn kuştin jî, dîl girtin.”(6).

Ez ci bibêjim, ew karê ku hesab û kitab divê, bi destê Sehîd bi hêsanî bi cîh dibe!

Di besên dawîn de, nav û dengê Sehîd li her derê belav dibe. (Û ci ecêb e, ku ji bilî watiniyan tu tiştî nizane vî kesê han; her kes, her leşker jê pir hez dike. Lê belê ne qerfek û ne jî tinazek ji devê wî dipe-ke!) Rojname behsa fêrisiya wî dikan. Elmanên faşist, jî, “çawa ku cin ji hesîn bitirsin” ew qasî ditirsin. Li gora romanê meriv dibêje qey, Nazî, tenê bi destê Sehîd hatine helakê. Ji ber ku di carekê de bi avtomata xwe 47; careka din bi deste şûra xwe 13 leşkerî dikuje. Dîsa di cengekê de 7 tana û 5 bronêtransportêr û ji 250î zêdetir leşkerê dijmin bi tevgera wî têne qirkirin. Her ci qas carekê birîndar bibe jî, Sehîd, ji qada şer dernakeve û dîsa diçe ser topekê, bera dide û tanqêke dijmin; bi avtomata xwe jî nêzikî 100 leşkerê Hîtler ji holê radike. Û di ber de jî, di wî şerê giran de, xebata partiyê geş dike, moral dide leşkeran, cebirxaneyê digihîjîne wan û birîndaran ji nav şer derdixe... Ji we roman, bi du nameyên fermandarên artêşa sovyetê, ku pesindayina Sehîd dikan, bi dawî dibe.

Em ji kîjan aliyî ve lê binerin, binerin, Sehîd du wateyan temsîl dike di romanê de:

- 1- Şoreşgerê jîr yê kolxozan yê li hember kûlakan,
- 2- Şoreşgerê mîrxas yê şer yê li hember faşistan.

Ev îdealîzekirin û erêniyet, Sehîd dike “lehengekî romantîk” û romanê jî dike “partînost”. Çima? An çawa?

Sehîd gava ku derdikeve pêş, ji serî heya dawiyê di romanê de, ji ,aliyê “fazîleta politik” ve, bo xwendevanan dibe mînakeke bêhempa. Divê jî wisa bûya. Çimkî “romantîzma şoreşger” ku Jdanov serok û berdevkiya wê dikir, kesên wisa derdixiste pêş ku gel wan ji xwe re emsal bigire û ji wan perwerde bibe. Bawerî ev bû: Dê di pêşeojê de, bi van kesan, barê sosyalîzmê sivik bibûya. Bi zêdebûna van kesan, civat dê zû bikemiliya û pêş ve biçûya.

Divê em bibînim. Sehîd di vê şemayê de cîh digire. Û ev roman bi xwe jî li ser vê îdeolojiyê hatiye hûnandin.

Belê ev tablo, pariyekî bi van gotinên Lenîn dest pê kiribû: “Edebiyat, gerek e edebiyata partiyê be. Lanet li nivîskarênu ku ne partîzan in! Lanet li kesê sergewreyê edebiyatê! Edebiyat divê parçeyeke çalakiya proletaryayê be.” Elbet ev, di şert û mercen taybet de hatibûne gotin. Lê li gora Jdanov, ev gotin, riyekê nû dabû ber edebiyata sovyetê. Lewma bi destûra Stalîn, wî bo edebiyateka parthînost, yanê edebiyateke ku di bin emir û hikmê partiyê de, zend û benda hilanî. Vê feraseta nû, di navbera salên 1934 û 1953an de pir berhem afi-

randin. Lê weki ku gelek rexnegir jî dibêjin, tiştek jê derneket. Dê desneketa jî. Çawa ku George Lukacs gotiye, ev edebiyat ne “tipik” bû; ji lewre ne dîrokî jî bû; bêtir şematîk bû. Xwe li ser rastiyekê bêbingeh ava dikir. Heyînê na, xwestin û hisreta heyînekê vedibêje.(7) Lewma emrê wê, piştî mirina Stalîn qediya. Lê li dû xwe goristanek hişt.

Ez wisa bawer im, Ereb Şemo, li nav çarçoveyeyeke ku ew jî jê muzdarîb e, ma. Bi emrê Stalîn hate nefîkirin. Lê wî nefitiya 19 salên Sibiryayê, ji vê ferasetê nexiste nav rûpelên romanên xwe. Min hê romana “Hopo” nexwendîye. Lê di pêsgotina Jiyana Bextewar de, ji bo wê, “ew jî behsa jiyana nû ya civata kurdan, guhertin û avakirina kolkozan dike,” tê gotin. Wisa dixuyê, li dijî rastiyen xwe, wî berjewendî û fêrisiya xwe ya hûnerî di riyeke wisa de xerc kir. Ew, li ber tevgereke ruxên dibest bû û wî ji bo zêdekirina mînakêñ edebiyateke şematîk mil da.

Eve Jiyana Bextewar û bi awayekî jî Şivanê Kurd, ferxên edebiyateke wisa ne ku ew ji hezar romanen du libên bextewariyên îdeolojîk in. Lê nivîsandina wan a bi kurdî, dîsa di tûrê kevneşopa me de, reng û serzêdeyek e.

*) Di “Ferhenga mitolojiyê” de Azra Erhat, ji bo mythos’ê, gotina bêbingeh, gotina ku hatiye bihîstin, dibêje. (Binérin r.5).

1) Ereb Şemo: “Şivanê Kurd”, çapa sêyemîn, weşanên Deng, (r. 87).

2) w.n. (r. 106).

3) w.n. (r. 109).

*) Kûlak, di zimanê Rusî de, kesê xwediyê çewlik, arazî, dewar û hespan e; yanê gundiyê milkedar e.

4) Ereb Şemo: “Jiyana Bextewar”, weşanên Deng, çapa Duwemîn (r.218).

5) w.n. (r. 201).

*) Ha! Ev yek jî heye: Di romanê de gelek kes, li gora partînastiye, bi ber bayê xebatê ketine. Heta bi awayekî hîsterîk! Ji ber ku her kes, heta pîrên nexweş jî (mesela Emerîk), dibêje “Îro ne roja nexweşiyê ye, heqê tu kesî tune nexweş keve” û bi dil û can xebatêñ kolkozê dikan. (binerin: r. 208).

6) w.n. (r. 246).

7) Berna Moran: “Edebiyat Kuramları ve Eleştiri”, Cem Yayınevi, (r. 55).

Kemîn

Nema dizanim bê jimar in
ku ruyê min
di kemînên bêbext de sor dibû
û bi celebê mirinê re dibişirîm
şopêng lingê min qeysikên gindoran bûn
birînên dîrokê di qesrên bilind de digerînin
min kiras diguhertin di newala çorî
dem û salan de weke maran
her hîmekî min bûye temenekî nîvqurmiçî
şaristaniya dêra Axtemarê
an jî keleha Heskîfê dialastin
gerdenzirâva Dîjleyê
kenê xwe yê şolî
bi kilama
zirav
zirav
ziravê
ji evîndariya xortêñ dilovan re
bejn û bala xwe dişeridand
hûçikê kirasê xwe yê bişaftî
di nav terafa dilê biraştî de vedişart
ji nerînên berbanga gulêñ sor re...

Pel

Ez li hundirê hêwanê diçûm û dihatim. Tu carî neketibûm girtîge-hê, lê hal û hereketên min wek ên girtiyan bûn. Ev bîst roj bûbû ku min destê xwe nedabû pênûsê; tew yekî wek min evîndarê nivîsê... Min nikarîbû rêzikek jî binivîsanda. Belê! Xwendin û nivîsandin; her dem, rewşa jiyanâ min baş dipeyitandin.

Şev bû. Serma hebû. Ez nema di hundir de hildihatim. Ez derketim hewşê. Ev du-sê roj, serma zivistanê xwe rîdabû. Carekê derî ji sermayê re vebibû. Her sal vî wextî, çend daran pelên xwe diweşandin, hinekan jî guh nedidan zivistanê, li gora kîfa xwe pel diweşandin. Min tu carî bi taybetî bala xwe nedabû pelweşandinê. Lê cara ewil bû, ez bi weşîna pelekê re veciniqîbûm, tırsiyabûm. Ev pel, pelek ji dara hejîrê bû. Emrê darê nezîka deh salan çêbûbû. Ez her roj di ber darê re derbas dibûm, hebûn û nebûna wê zêde ez eleqedar nekiribûm. Bi ketina pelê heşkûzer, ez hem li darê hem li xwe hay bûbûm.

Pelê hişkûzer temenê min anîbû bîra min. Hê min xwe di buhara emir de dihesiband; hê ez nebibûm sîh. "Jiyan dê weha biherike .. Rojekê ez ê binihêrim ku yekî temendirêj ketiye şûna min Evîn xelas bûne, dost nemane". Ez werr li der ve yî demê mabûm: An berî demê, an piştî demê. Bi weşandina pelê, ez hatibûm ser hişê xwe. Li der ve ez ricifibûm, dinya ricifibû, şev ricifibû û jiyanâ emrê min ricifibû. Tew vê tenêtiyê ez kuştibûm. Tenêbûna ji bo çi û ji bo kê? Min serê xwe bi jor de rakiribû, lê ezman xwiya nekiribû. Heyv û stêrk careke din di newala bêserî û bêbinî de wenda bûbûn.

Bi çavvekirina ji xewê, hin ramanên têkel ên şeva çûyî di serê min de derbas dibûn. Ez derengê şevê ketibûm nav livînan. Bişev, heta si-behê bi Xwedê re peyivibûm. Min lava kiribû; derdê xwe gotibû; daxwazên xwe diyar kiribûn. Lê kirtînî jî bi xwedê neketibû. Min ji wî bi tenê peyvek jî nebîhistibû. Qey nedixwest bêdengiya xwe xera bike. Vê taliyê ramiyabûm: Ma çi karê xwedê li van deran hebû? Ta-

liyê ji bo ku çirokekê binivîsînim, mijûl bûbûm. Min kiribû nekiribû çiroka ku min dixwest binivîsînim derneketibû ser kaxezê. Ji xwe mijara wê, kesên wê, cihê wê, bûyera wê giş di serê min de cîh girtibûn; ku dor dihat nivîsandinê, tu tevger ji min çênedibû. Min ji berê de dizanîbû; nivîs û nivîskarî ne karekî hêsan e. Gava ku min dest bi nivîsandina çirokekê dikir, bêje mîna niquteke ava ku di devê kaniyê de diciviya û dixindirî satilê, diherikîn ser kaxeza min. Lê beyana vê sibehê... Serê min pîr diêsiya. Xewa ku min pênc-şes saetan kiribû, têra min nekiribû. Ji xwe ew jî giş bi xewnan derbast bûbû. Heta min çavê xwe vekir jî xewnê min hîn dihatin bîra min.

Bi çend kulm av, min serçavê xwe şuştibû û vege riyabûm hundir. Sê-çar lib zeytûnê Dêrikê û pariyekî nanê hilatî bûbû taştê ji min re. Ji xwe madê min nedîcû xwarinê; armanc ew bû ku min berî cixarê xurîniya xwe bişkênda. “Bê cixarê jiyan jî bê wate ye. Ku li ser ci-xarê tê peyivandin, herkes mîna bijîkan çavê xwe digirin û devê xwe vedikin. Cixare ne baş e! Çi nexweşî hebin, giş ji cixarê çedibin! Felan keso lingê wî jê kirin, bêvan keso destêne wî jê kirin! Taliya van peyvan nayê. Ji xwe mirov bextreş in, her tiştî li gora berjewendiyê xwe dinirxînin. Tiştêne baş nabe mijara gotinan; tiştêne xerab, her celeb peyv li ser tê gotin.” Bi şikenandina xurîniyê, min cixareyek pê-xistibû. Ku dixanê xwe bera ser kezeba min dabû, ez çi qasî bextewar bûbûm.

“EZ dixwazim vê sibehê berê xwe bidim derekê”. Do ez derneketi-bûm. “Doh çi ye? İro çi ye? Çi cudayetî di nav wan de heye? Sibê, pênc rojêñ din, şes salêñ din, wê çi ferqa wan ji iro hebe?” Min hew di hundir de diqedand, diviyabû ez derketama der ve. Li malê ku ez dimam, an li tenetiyê an jî li xwekuştinê difikirîm. Ji ber ku armanca jiyana min, nivîs, her car ne bi min re bû. Li gora kêfa xwe carina di-hat, carina hubra pênuşa min zuha dikir. Ew hubra ku min bi xwîna xwe diafirand. Ew hubra ku ji damarêñ min dilop bi dilop diherikî re-hê pênuşê. Min digot qey xwîn jî di canê min de nemaye. Van fikran, wexta ku ez di kuçeya taxa me re derbas dibûm, ez mijûl dikirim.

Wek her roj, min berê xwe dabû cihê ku em lê diciviyan. Dilê min tune bû ku ez herim wir, lê tu alternatifêñ din, tu rîyêñ din tune bûn ji bo çûyinê. Ez ji mirovan gişan aciz bûbûm. Çiqas mirov li dora min rûdiniştin jî, min digot qey kes ji min hez nake. Ji roja ku ez hatibûm vî bajarî, çavêñ li ser min, ne çavêñ dostaniyê bûn. Tu tahdeya min li kesî nehatibû, bi tu mirovan re pirsgirêken min çenebibûn; lê, çima

ku min ji wan cuda li jiyane diniherî, çima ku ez ne wek wan bûm, ji min hez nedikirin.

Ez ketim hundir, çend mirovên xerîb ku min ew nas nedikirin, bala min kişandibû. Li quncika çepê sê kesen ku werr dihatin vê derê, rûniştibûn. Li quncika din, Nalîn û du keçik, li hember wan jî Zîr û Zeyat rûniştibûn. Min berê xwe da quncika ku Nalîn û hevalên wê lê rûniştî ne. Ez li kêleka Nalîn rûniştibûm. Nalîn, min bi herdu hevalên xwe re dabû naskirin. Lê her du camêrên din, bi hatina min kêfxweş nebûbûn, bi bisirandineke nejidil, tenê silav li min kiribûn.

Hevala Nalîn, Gulbîn, nas derketibû. Lê ew nehatibû bîra min. Piştî ez rûniştim galegala wan qut bibû. Piştî bîskekê axaftina xwe domandibûn. Vê carê ez jî tev li axaftinê bûbûm. Em li ser bûyerên vê taliyê qewimîbûn, peyivîbûn. Kes li dijî peyva kesî derneketibû. Herkesî peyvên hevdu tesdiq kiribûn. Sedema vêya, hem kesî nedixwest bi ê din re têkeve nîqaşê, hem jî bûyer tiştekî pir eşkere bû. Li çiyayêñ herêmê şer derketibû. Şerê Fil û Gêrikan. Wek her tim Filan û hevkariyêñ wan, bi xedarî cerd avêtibûn ser gêrikan. Ji ber ku mersèle pir eşkere bû, tu nîqaş di nav me de derneketibûn.

Galegala min û Gulbîn, Zîr û Zeyat aciz kiribûn. Ji xwe, pir rûne-niştibûn. Nalîn û Rêzan jî em tenê hiştibûn. Vê carê em li ser tiştên taybetî peyivîbûn. Peyva me hatibû li wêjeyê sekinibû. Min ji wê re behsa xweşbûna hunerê kiribû. Wê jî pêwendiya xwe yî bi helbestê re nişanî min dabû. Mîmakek ji helbesta Elluard dabû: “Ezman sayî be jî, reştarî be jî, ku mirov hez neke, nabîne.”

Sohbetê em mest kiribûn. Bi hatina Nalîn û Rêzan em hatibûn ser hişen xwe, sêhra di nav me de betal bûbû. Bi xatirxwestinê em ji hev veqetiyabûn.

Îro jî weha derbas bûbû. Rewşa min î bi şev çawa bû, ya nuha çawa bû? Hê nû rih bi min hatibû. Xwîna damarên min dest bi herikan-dinê kiribû. Rêzikên çiroka ku ez do li ser fikiribûm, li dû hev kaxeza sipî neqişandibû. Bêje, dîsa ji devê kaniyê li ser hev xindirîbûn satilê. Min bûyera çirokê bi dest xistibû. “Çima ez ji pelê hişkûzer dest pê nekim? Ma çirok ne hin perçeyên piçûcik ên ji jiyanâ mirovan in?”

Apê Reşo

1.

Apê Reşo ji cot tê malê. Westiyaye û birçî ye. Diya wî tasek tije şîr li ber datîne. Apê Reşo ji aliyê diya xwe ve gelekî bê şens e. Li tasa tije şîr ku hema bileqe dê birije, dinere. Ji ber wê dikeve gumanê.

Li diya xwe difitile û dibêje:

- Rake, rake, ne lazim! Hewalekî vî şîrî heye!
- Wey lawo! Ma qey tu venaxwî?
- Ez vanaxwim, Siltanê! Umrê min ev bû çil sal ku te hê rojekê ji bo Xwedê taseke şîr li ber min daneniyî! Ez venaxwim. Hewalekî vî şîrî heye!

Diya wî rabû, tasa şîr ji ber rahiştê. Di ber xwe de keniya û got:

- Welle mişk ketibûyê!...

2.

Apê Reşo ji eskeran pir ditirse. Rîtolekî kincên eskeran li ser ser goyekî bibîne, riya xwe ji ser diguherîne. Qet nedixwest ku ew û esker li rastî hevdu bêñ.

Pîr bû, lê belê wî baş dizanîbû ku bêwicdaniya eskeran li umrê wî napisse. Ji ber vê yekê, gava eskeran digirt ser gund, heke firseta revê bidîta, radihişt quṭî û hesteyê xwe û derdiket. Lê belê hergav firseta revê bi dest nediket.

Rojekê dîsa eskeran girtiye ser gund. Lê hayê Apê Reşo jê çênebûye. Hema dibîne ku esker li hewşê ne. Tu riya revê nemaye. Hema bi lez cillimêjê radixe û berê xwe dide qibleyê. Wê gavê esker bi hêrs xwe li bin guhê derî dixe û dikevin hundir.

Yek ji wan bi hemd û hêla xwe pehînekê li qûna Apê Reşo dixe û wî çeng dike wî aliyî. Bi dijûn, bi hêrs bi ser ve hiltê.


- Kuro, ev ne nîvro ye, ne esir e û ne êvar e. Ka bibêje, ev limêja ku tu dikî, ya ci ye?!

Apê Reşo bi destekî kulêmeka xwe, şûna potîna eskér difirkîne û bi destê din jî li ber xwe dide, hêdî hêdî radibe ser piyan, li çawîş dinere û dibêje:

- Ev limêja eskerî ye, qumandarê min.

Berhevkar: Selahattin Bulut

Pirtûkxaneya Pelînê



Koç: (Roman, 188 rûpel, Silêman Demir, Weşanên Roja Nû, 1999, Stockholm.)

Silêman Demir di romana xwe de realîteya kurdên belengaz tîne zimên. Çend gundiyên kurd ku ji ber rewşa welêt hew dikarin li gundê xwe bîmînin, berê xwe didin biyanistanê û diçin. Serboria wan û kul û kederên wan, dibe wêneyekî piçûk yê kurdan. Koç ji bo romana kurdî hewleke hêja ye.


Digel ku piraniya weşanxaneyên kurdan elfabeya bi "i-î" bi kar tîne, Roja Nû "i-i" bi kar anîne. Ev yek di xwendinê de hin astengiyan derdixe pêşıya mirov.

Mirina Kalekî Rind: (Roman, 119 rûpel, Mehmed Uzun, Weşanên Avesta, 1999, Stembol.)

Ev berhema Mehmed Uzun, ku berê jî li Ewrûpayê hatibû weşandin, bi çapa xwe ya nû digihije xwendevanên kurdî. Roman ji devê kesê yekem tê vegotin. Kurdekkî rewşenbîr ku li Swêdê dijî, gava ji bo demekê vedigere welêt, li kalekî kor rast tê û bi dû re li rindiya kalo hay dibe û dikeve bin bandora wî. Kalo û vebêjer, xwendevanan jî dikin hevalên xwe û liber dengê bilûrê rûdinin.

Di romanê de hebûna hin xeletiyên gramerê û tashîhê, di xwendinê de zehmetê jî bi xwe re tîne.






Ahmedê Xanî: (Lêkolîn, 336 rûpel, Murad Ciwan, Weşanên Dozê, 1998, Stembol.)

Berê jî li ser jiyan Ahmedê Xanî û bîr û baweriyên wî, hem bi zimanê kurdî hem bi zimanê din, gelek carî lêkolîn hatibûn kirin; lê vê carê Mûrad Ciwan, bi lêkolîneke zanistî, dike ku mirov bikaribe bi rehetî bibêje “li ser Ahmedê Xanî pirtûka herî biserketî.”

Di pirtûkê de Mûrad Ciwan bi mînakan li ser jiyan, bîr û bawerî û berhemên Ahmedê Xanî diseleine.

Li ba me Li wan deran: (Çîrok, 96 rûpel, Migirdîç Margosyan, wergêr: Rûken Baxdû Keskîn, Weşanên Avesta, 1999, Stembol.)

Migirdîç Margosyanê ku bi xwe ermenî ye û di nav kurdan de mezîn bûye, di çîrokên xwe de behsa “ba me, wan deran” dike û ermenî û kurd, xiristiyan û misilman û dêr û camî tev li hev dibin û di nav çîrokên wî de bi wergera Rûken Baxdû Keskîn digihije xwendevanê kurdî.



Qutîka Posteyê

Berpîrsiyarên Kovara Pelînê yên hêja,

Di vê dema dijwar û giran de, derxistina kovareke çandî, toreyî û bi zimanê me yê şêrîn, gaveke girîng û hêja ye û cîhê pesindayinû dilxweşiyê ye.

Bi dilekî germ ez vî karê we pîroz dikim, hêviya min ew e ku ev kar bi asteke bilind berdewam bibe.

Bi rastî dilê mirov pirr xweş dibe dema ku li hember bahozên van kuştin û talanênu ku dixwazin zimanê me ji holê rakin û me lal bihêlin, hûn bi mîranî serî hil didin û xwe dispêrin vî karê pîroz.

Bi hemû hêz û îmkanênu xwe em bi we re ne.

Helîm Yûsiv

Ji xebatkarênu Pelînê re,

Berî ku ez bi çend gotinan dîtina xwe ya di derheqê vê gava we ya hêja û birûmet de bibêjim, ez redaksiyona Pelînê ji bo zimanê wê yê xweş û şêrîn ji dil û can pîroz dikim û temenekî dûr û dirêj ji bo wê dixwazim.

Belê, bê guman berî Pelînê ji hem li welêt û hem ji li Tirkîyeyê bi zimanê kurdî hatiye nivîsin û kêm zêde hê ji tê nivîsin. Ji xwe, tiştê ku em şad hiştine û em ji wendabûna zimanê me bê hêvî nekirine ji ev e, lê bi ya min di vê demê de, ku piraniya nivîsîna zaravayê kurmancî ketiye derveyî w-elêt, nemaze welatên Ewrûpayê û ji nav wan ji Swêdê, lêzêde-kirina kovareke edebî ya nêzî welêt bi zimanekî hemtayê kovarênu ku li Ewrûpayê derdi Kevin, hem cihê şanazî û dilxweşiyê ye û hem ji hêviya zêdebûna nivîsîna bi kurmancî li deverên cihê dide mirov...

Bi hêviya serbilindî û berdewamiyeke ber bi pêş ve, bê pesindayinneke zêde ku ez bi xwe ji qet jê hez nakim, ez dixwazim ku dilxweşiya xwe ya ji bo derketina vê kovarê pêşkêş bikim.

Emîn Narozi

Ji Pelînê re

... Xebata çandî, xebata hunerî, xebateke dîrokî û pîroz e. Ji ber vê yekê ji derketina Pelînê ez pir dilgeş kirime. Hemû xebatkarênu Pelînê pîroz dikim û ji teva re serkevtinê dixwazim.

Dost Ciayî

Kedkarên Pelînê yên hêja,

Di serî de ez dixwazim we ji bo karê we pîroz bikim.

Wê êvara çûyî, em çend mamoste li malekê vexwendiyê şîvê bûn.
Dema em li benda şîvê dipan, hevalekî min hema ji nişka ve got
“kovareke nû bi kurmancî dest bi weşanê kiriye...”

Çend roj şûn ve kovara rengîn “PELİN” li sûka Amedê li ber çavêن
min, wek stérkeke asîmanê welatê min diçirisi...

Dixwazim bibêjim heke kursiyeke edebiyata gel were danîn di temelê
Unîversiteya Pelînê de, dê xwendekar jîrtir bigihêjin.

Bi min nivîsên xweştir, ên Mustafa Aydogan û Silêman Demîr bûn.
Hevpeyvîna bi Mehmed Uzunî re jî hêjayî pesindayinê ye.

Dise wa pîroz dikim, hûn bijîn.

**Ayhan Bermereto
Mamostayê zimêن**

Ji yên ku mil û cil û kil dane Pelînê re

Ji we re,

Xebata we pîroz e, helwesta we pîroz e...

Pelîn hewcedariyeke pîroz e!

Di vî kar û barê giranbuha û berz î berz de, ez we dilînêن xwe yên
herî kûr pîroz dikim.

Heta ku li Bakûr kovareke ji Pelînê ‘spehîtir’, ‘lawtir’ û ‘delaltir’
dernekeve, ez Pelînê bi tu kovaran nadim.

Mîna xwendevanekî kêfxweş im, mîna helbestvanekî dilşad im.

Silavêن min ji hemû xwendevan, nivîskar û helbestkarêن Pelînê re...

Arjen Arî

Berpîrsiyarêن Kovara Pelînê,

Vê dema dawiyê, şoreşeke rewşenbîrî û wêjeya kurdî derketiye
holê... Dema ku Pelîn gihişt destê min, ez pir bi xwendina gotarêن ku
di nav rûpelêن xwe de himbêz kiribû mijûl bûm. Bê guman, weşandina
kovarêن weha û di nav astengên tevlihev û bi taybetî li bajarê
Stenbûlê, cihê paybilindbûna rewşa zimanê kurdî ye, ev zimanê ku
pêwîst e em ji bo wî çalakiyêن girîng û bizavêن xurt û berxwedaneke
berfireh bikin, da ku em bikaribin vî zimanê şêrîn ji wendabûnê
biparêzin...

Hevalêن hêja, Mîr Bedirxan şevekê jî ranewestiyaye, her êvar dibe
mêvanê kurdekî xêrxwaz û dilsozê zimanê kurdî. Vêca, bila birêz
Silêman Demir li ser vî zimanî qet netirse...!

Careke din ez weşandina kovara Pelînê pîroz dikim.


**Bêwar İbrahîm
22/04/1999. Qamişlo**

Hejmara 4. derket...



ÖCALAN VAKASI

• Ahmet Zeki Okçuoğlu • Mehmet Erbaş
• Kendal Nezon • Daniella Mitterand • Matthew Hand
• Michael Howard • Josef Joffe • Osman Aydin • Al-Majalla



Kürtlerin Demografik Devrimi ve Sosyo-Politik Etkileri Mehrdad R. Izady
Kurt Nüfusu, "Saatli Bomba" I. Şerif Vanlı

Silahların Gölgesinde: Türk Dış Politikası ve Kürt Sorunu Henri J. Barkey
Kürdistan Yahudileri Shifra Epstein
• Rebwar Fatah • Dilşad Barzani • Ö. Özmen • Süleyman Nazif
• Harputlu H.B. • Helmuth von Moltke • Patrick Cockburn

Bir Cinayetin Anatomisi